

**K.T.**

**ZANÎNGEHA VAN YÛZÛNCÛ YILÊ**

**ENSTÎTUYA ZIMANÊN ZINDÎ**

**ŞAXA MAKEZANISTA ZIMAN Û ÇANDA KURDÎ**



**BERAWIRDKIRINA KURMANCÎ Û SORANÎ**

**JI HÊLA RÊKKEFTINÊN HÊMANÊN HEVOKÊ VE**

**TEZA LÎSANS A BILIND**



**AMEDEKAR**

**MEHMET PASO**

**ŞÊWIRMEND**

**DOÇ. DR. NESİM SÖNMEZ**

**VAN -2024**

T.C.

VAN YÜZÜNCÜ YIL ÜNİVERSİTESİ

YAŞAYAN DİLLER ENSTİTÜSÜ

KÜRT DİLİ VE KÜLTÜRÜ ANABİLİM DALI



KURMANCİ VE SORANİ LEHÇELERİNİN CÜMLENİN  
ÖĞELERİNİN UYUMLARI ÇERÇEVESİNDE KARŞILAŞTIRILMASI

YÜKSEK LİSANS TEZİ



HAZIRLAYAN

MEHMET PASO

DANIŞMAN

DOÇ. DR. NESİM SÖNMEZ

VAN- 2024

(Teza Lîsansa Bilind)

Amedekar: Mehmet PASO

Zanîngeha Van Yüzüncü Yilê Enstîtuya Zimanên Zindî

Îlon, 2024

**Berawirdkirina Kurmancî û Soranî ji Hêla Rêkkeftinên Hêmanên Hevokê ve**

## **KURTE**

Hevokê ji bo ku bibe watedar, hêmanên wê divê li gor hin qayîdeyan rêkbikevin. Ev rêkkeftina hanê di her zimanekî da dibe ku bi awayekî cuda xwe nîşan bide. Ziman heye rêkkeftina wî akûzatîf e, rêkkeftina wî di navbera biker û pêveberê da ye; ziman heye rêkkeftina wî ergatîv e, rêkkeftina wî di navbera bireser û pêveberê da ye. Bêguman rêkkeftina hinek zimanan dişibin hevdu, ya hinek zimanan jî naşibin hevdu. Cudahîyên rêkkeftinê dibe ku di nav zaravayên zimanekî da jî bikevin li ber çavan. Dîyarkirina hevparî û cudahîyên rêkkeftinê yên zaravayên kurdî yên kurmancî û soranî ji bo destnîşankirina hevparî û cudahîyên van zaravayên kurdî pêwîst e. Di vê xebatê da du zaravayên kurdî yên soranî û kurmancî, ji hêla rêkkeftinên hêmanên hevokê yên weke biker, bireser û pêveber hatine berawirdkirin û alîyên wan yên dişibin hevdu û naşibin hevdu hatine destnîşankirin. Ev lêkolîn li gor wan pirtûkên rêzimanî, tez û gotaran hatîye kirin ku heta niha li ser van herdu zaravayan hatine nivîsandin. Ev xebat ji sê beşan pêk tê. Di beşa yekem da behsa ziman, zimanzanî û rêkkeftinê hatîye kirin, di beşa duyem da behsa cînavkên kesane û kesandinê di zaravayên kurmancî û soranî da hatîye kirin û di beşa sêyem da jî behsa cureyên rêkkeftinên kurmancî û soranî hatîye kirin. Di dema niha û bê da rêkkeftina soranî û kurmancî dişibin hevdu û rêkkeftina wan di navbera biker û pêveberê da ye, lê di demên borî da ji hin hêlan ve dişibin hevdu, ji hin hêlan ve jî naşibin hevdu. Di demên borî da lêkera pêveber teneper be, dişibin hevdu; lê dema ku lêkera pêveber têper be, rêkkeftinên ji hev cuda derdikevin. Me analîza xwe li gor deman (dema niha, dema bê û demên borî) û li gor têperî û teneperîya lêkerên pêveber kirîye, ji ber ku di her du zaravayan da jî li gor deman û têperî û teneperîya lêkerên pêveber cûreyên rêkkeftinê diguhêrin. Herwiha me hin rewşên îstîsna yên rêkkeftinên herdu zaravan jî raxistine ber çavan.

**Peyvên Sereke:** Rêkkeftin, Soranî, Kurmancî, Berawird, Dem

**Hejmara Peran:** X + 135

**Şêwirmend:** Doç. Dr. Nesim Sönmez

(Yüksek Lisans Tezi)

Hazırlayan: Mehmet PASO

Van Yüzün Yıl Üniversitesi Yaşayan Diller Enstitüsü

Eylül, 2024

## **Kurmanci ve Sorani Lehçelerinin Cümlelerin Öğelerinin Uyumları Çerçevesinde Karşılaştırılması**

### **ÖZET**

Bir cümlelerin anlamlı olabilmesi için o cümlelerin öğelerinin bazı kurallara göre uyum içinde olması gerekmektedir. Bahsettiğimiz bu uyum olgusu her dilde farklı bir şekilde kendini gösterebilir. Bazı diller vardır ki uyumları akuzatiftir, uyumları özne ile yüklem arasındadır; bazı diller vardır ki uyumları ergatiftir, uyumları nesne ile yüklem arasındadır. Kuşkusuz bazı dillerin uyumları bir birlerine benzer, bazıları de benzemez. Uyum farklılıkları bir dilin içindeki farklı lehçelerde de görülebilir. Kürtçe'nin Kurmanci ve Sorani lehçelerinin uyum benzerliklerini ve farklılıklarını belirlemek bu iki lehçenin ortak yönlerini ve farklı yönlerini belirleme açısından gereklidir. Bu çalışmada Kürtçe'nin Sorani ve Kurmanci lehçelerini özne, nesne ve yüklem uyumu çerçevesinde karşılaştırılıp benzeşen yönleri ve ayrışan yönleri tespit edildi. Bu çalışma bu iki lehçe hakkında bugüne kadar yazılmış gramer kitapları, tezler ve makaleler baz alınarak yapıldı. Bu çalışma üç bölümden oluşmuştur. Birinci bölümde dil, dilbilim ve uyumdan bahsedildi, ikinci bölümde Kurmanci ve Sorani lehçelerinde zamir ve kişi eklerinden bahsedildi ve üçüncü bölümde Kurmanci ve Sorani lehçelerinin uyum çeşitlerinden bahsedildi. Şimdiki zamanda ve gelecek zamanda Sorani ve Kurmanci lehçelerinin uyumları bir birine benziyor ve uyumları özne ile yüklem arasındadır. Geçmiş zamanlarda ise bazı yönleriyle benzeşiyorlar, bazı yönleriyle de ayrışıyorlar. Geçmiş zamanlarda eğer yüklem olan fiil geçişsiz ise, uyumları bir birlerine benzemekte ama geçmiş zamanlarda yüklem olan fiil geçişli ise farklı uyum türleri ortaya çıkıyor. Biz analizimizi zamanlara göre (şimdiki zaman, gelecek zaman ve geçmiş zamanlar) ve yüklem olan fiilin geçişli veya geçişsiz olma durumuna göre yaptık. Çünkü her iki lehçede de zamanlara ve fiilin geçişli ve geçişsiz olma durumuna göre uyum çeşitleri değişmektedir. Araştırmamızda ayrıca her iki lehçenin uyumlarının istisna durumlarından da bahsettik.

**Anahtar Kelimeler:** Uyum, Sorani, Kurmanci, Karşılaştırma, Zaman

**Saysa Sayısı:** X + 135

**Danışman:** Doç. Dr. Nesim Sönmez

(Master's Thesis)

Preparer: Mehmet PASO

Van Yüzüncü Yıl University Living Languages Institute

September, 2024

**Comparison of Kurmanji and Sorani in Terms of the Agreements of the Elements of Sentences.**

**ABSTRACT**

In order for a sentence to be meaningful, the elements of that sentence must be in agreement according to some rules. This phenomenon of harmony that we are talking about can manifest itself in a different way in each language. There are some languages that their harmony is akuzatif, their agreement is between subject and predicate; there are some languages that their agreement is ergative, their harmony is between object and predicate. Undoubtedly, the agreements of some languages are similar to each other, and some of them are not similar. Differences in agreement can also be observed in different dialects within a language. Determining the similarities and differences in agreement between the Kurmanji and Sorani dialects of Kurdish is necessary in order to determine the common aspects and differences of these two dialects. In this study, the Sorani and Kurmanji dialects of Kurdish were compared within the framework of the agreement of subject, object and predicate, and their similarities and differences were determined. This study was conducted based on grammar books, theses and articles written so far about these two dialects. This study consists of three parts. In the first part, language, linguistics and agreement were discussed, in the second part, pronoun and personal suffixes in Kurmanji and Sorani dialects were mentioned and in the third part, agreement types of Kurmanji and Sorani dialect were mentioned. The agreements of Sorani and Kurmanji dialects in present and future tenses is similar to each other and their agreement is between the subject and the predicate. In the past tense, they are similar in some ways and different in some ways. If the predicate verb is intransitive in the past tense, their agreements is similar to each other, but if the predicate verb is transitive in the past tense, different types of agreements emerge. We made our analysis according to the tenses (present tense, future tense and past tense) and the transitive or intransitive status of the predicate verb. Because in both dialects, the types of agreements change according to the tenses and the transitive or intransitive status of the verb. In our research, we also mentioned the exceptions to the agreements of both dialects.

**Keywords:** Agreement, Sorani, Kurmanji, Comparison, Tense

**Quantity of Page:** X + 135

**Supervisor:** Doç. Dr. Nesim Sönmez

## NAVEROK

KURTE.....	I
ÖZET.....	II
ABSTRACT.....	III
KURTEBÊJE.....	IX
PÊŞGOTIN.....	X
DESTPÊK.....	1
1. ZIMAN, ZIMANZANÎ Û RÊKKEFTIN.....	8
1.1. Ziman.....	8
1.2. Zimanzanî.....	11
1.2.1. Binebeşên Zimanzanîyê.....	14
1.2.1.1. Fonetîk (Dengsazî).....	14
1.2.1.2. Fonolojî (Dengzanî).....	15
1.2.1.3. Morfolojî (Peyvsazî).....	15
1.2.1.4. Semantîk (Watesazî).....	15
1.2.1.5. Leksîkolojî û Leksîkografî.....	16
1.2.1.6. Dîyalektolojî (Zaravazanî).....	16

1.2.1.7. Sentaks (Hevoksazî) .....	16
1.3. Rêkkeftin .....	17
1.3.1. Rêkkeftina Wateyî .....	18
1.3.2. Rêkkeftina Rêzimanî .....	19
1.3.2.1. Kategorîyên Rêkkeftinê .....	19
1.3.2.1.1. Kes .....	19
1.3.2.1.2. Mêjer .....	20
1.3.2.1.3. Zayend .....	25
1.3.2.1.4. Rewş .....	27
1.3.3. Ergatîvî û Akûzatîfî .....	31
2. CÎNAVKÊN KESANE Ê KESANDINÊ DI ZARAVAYÊN KURMANCÎ Ê SORANÎ DA .....	33
2.1. Kurmancî .....	33
2.1.1. Cînavkên Kesane yên Kurmancî .....	33
2.1.1.1. Cînavkên Kesane yên Xwerû .....	33
2.1.1.1.1. Peywirên Cînavkên Kesane yên Xwerû .....	33
2.1.1.2. Cînavkên Kesane yên Tewardî .....	35
2.1.1.2.1. Peywirên Cînavkên Kesane yên Tewardî .....	35
2.1.2. Cînavkên Kesandinê yên Kurmancî .....	37
2.1.2.1. Peywirên Cînavkên Kesandinê yên Zaravayê Kurmancî .....	39
2.2. Soranî .....	41

2.2.1. Cînavkên Kesane di Zaravayê Soranî da.....	41
2.2.1.1. Peywirên Cînavkên Kesane yên Soranî .....	41
2.2.2. Cînavkên Kesandinê yên Soranî.....	43
2.2.2.1. Cînavkên Kesandinê yên Bihêz.....	43
2.2.2.1.1. Peywirên Cînavkên Kesandinê yên Koma Bihêz .....	44
2.2.2.2. Cînavkên Kesandinê yên Koma Bêhêz.....	49
2.2.2.2.1. Peywirên Cînavkên Kesandinê yên Koma Bêhêz.....	52
<b>3. CUREYÊN RÊKKEFTINÊN KURMANCÎ Û SORANÎ.....</b>	<b>57</b>
3.1. Cureyên Rêkkeftinên Kurmancî.....	57
3.1.1. Rêkkeftina Kurmancî di Dema Niha da .....	57
3.1.1.2. Çend Îstîsna di Dema Niha ya Kurmancî da .....	58
3.1.1.2.1. Lêkera Vîyan .....	59
3.1.1.2.2. Bikaranîna Lêkera Hebûnê di Wateya Xwedîtîyê da .....	60
3.1.1.2.3. Bi Pêveberên Tecrûbekar .....	60
3.1.1.2.4. Bikaranîna Cînavkan weke Temamkerê Bikerê di Pêveberên Kopulayî da.....	61
3.1.2. Rêkkeftina Kurmancî di Dema Bê da .....	62
3.1.3. Rêkkeftina Kurmancî di Demên Borî da .....	64
3.1.3.1. Dema Borî ya Têdayî (Sade).....	66
3.1.3.2. Çîrokîya Dema Borî ya Têdayî .....	67
3.1.3.3. Dema Borî ya Dûdar .....	69

3.1.3.4. Dema Borî ya Berdewam.....	70
3.1.3.5. Çend Îstîsna di Demên Borî yên Kurmancî.....	72
3.1.3.5.1. Cînavka Vegerok “Xwe” .....	72
3.1.3.5.2. Cînavka Berbihevîn “Hevdu” .....	73
3.1.3.5.3. Lêkêrên ku bi Cînavkeke Lihevxiştî Pêkhatine .....	74
3.1.3.5.4. Veşartîbûn û Dûrketina Kesê Sêyem yê Pirjimar .....	75
3.1.3.5.5. Dema ku di Hevokê da Lêkerên Têneper û Têper Bibin Pêveberên Heman Bikerê .....	76
3.1.3.5.6. Bikaranîna Lêkera Hebûnê di Wateya Xwedîtîyê da .....	78
3.1.3.5.7. Bi Pêveberên Tecrûbekar .....	78
3.1.3.5.8. Bikaranîna Cînavkan weke Temamkerê Bikerê di Pêveberên Kopulayî da.....	79
3.1.4. Rêkkeftina Kurmancî di Tebatîyê da .....	80
3.2. Cureyên Rêkkeftinên Soranî.....	81
3.2.1. Rêkkeftina Soranî di Dema Niha da.....	81
3.2.1.1. Çend Îstîsna di Dema Niha ya Soranî da .....	84
3.2.1.1.1. Dema ku Hevok Tenê ji Pêveberekê Pêk Were.....	84
3.2.1.1.2. Dema ku Lêkera Wîstinê Bê Bikaranîn .....	85
3.2.1.1.3. Bikaranîna Lêkera Hebûnê di Wateya Xwedîtîyê da .....	88
3.2.1.1.4. Ku di lêkerên Têper yên Hevedudanî da Bireser Veşartî Be.....	91
3.2.2. Rêkkeftina Soranî di Dema Bê da .....	91

<b>3.2.3. Rêkkeftina Soranî di Demên Borî da .....</b>	<b>93</b>
<b>3.2.3.1. Dema Borî ya Têdayî .....</b>	<b>95</b>
<b>3.2.3.2. Çîrokîya Dema Borî ya Têdayî .....</b>	<b>98</b>
<b>3.2.3.3. Dema Borî ya Dûdar .....</b>	<b>102</b>
<b>3.2.3.4. Dema Borî ya Berdewam.....</b>	<b>105</b>
<b>3.2.3.5. Çend Îstîsna di Demên Borî yên Soranî da.....</b>	<b>108</b>
<b>3.2.3.5.1. Dema ku Hevok Tenê ji Pêveberekê Pêk Were.....</b>	<b>108</b>
<b>3.2.3.5.2. Dema ku Lêkereke Hevedudanî an jî Pêkhatî Bê Bikaranîn .....</b>	<b>113</b>
<b>3.2.3.5.3. Dema ku Lêkereke Têper bi Cînavkeke Lihevxiştî Were Bikaranîn .....</b>	<b>117</b>
<b>3.2.3.5.4. Bikaranîna Lêkera Hebûnê di Wateya Xwedîtiyê da .....</b>	<b>119</b>
<b>3.2.4. Rêkkeftina Soranî di Tebatîyê da .....</b>	<b>121</b>
<b>ENCAM.....</b>	<b>124</b>
<b>ÇAVKANÎ.....</b>	<b>129</b>

## KURTEBÊJE

Hwd.	Herwekî din.
Lad.	Language Acquistion Device Lad.
Bz.	Berîya Zayînê.
Pz.	Piştî Zayînê.
Abz.	Amûra Bidestxistina Ziman.
Ø	Morfema Sifir
C.Bihêz	Cînavkên Kesandinê yên Bihêz
C.Bêhêz	Cînavkên Kesandinê yên Bêhêz

## PÊŞGOTIN

Rêkkeftina hêmanên hevokê di famkirina taybetmendiyên zimanan da girîng e. Mirov bi xêra zanîna çawanîya rêkkeftina hêmanên hevokê ve dizane ku rûdana di hevokekê da derbas dibe ji hêla kê ve tê kirin, dê bê kirin û hatîye kirin. Herwiha mirov saya zanîna pergela rêkkeftinên hêmanên hevokê ve yekjimarî û pirjimarîya bireser (object) an jî bikerê (subject) ji hev derdixe.

Zanîna cureyên rêkkeftinên soranî û kurmançî ji bo dîyarkirina taybetmendî û cudahî û hevparîyên van zaravayan girîng e. Qasî me lêkolîn kirîye heta niha tu kesî li Tirkîyayê di vî warî da xebatek nekirîye. Lewma jî me xwest, valahîya di vî warî da tije bikin û kevirekî daynin li ser dîwarê teze ya kurdolojîya Tirkîyayê.

Di dema lêkolîna xebata xwe da me ji bo kurmançî sûd ji pirtûkên rêzimanî yên ku li Tirkîyayê û Herêma Kurdistana Iraqê çap bûne wergirtîye, ji bo soranî jî me piranî sûd ji pirtûkên ku li Herêma Kurdistana Iraqê çap bûne wergirtîye (*Asoyekî Tiri Zimanewanî; Êrgetîf le Zimanî Kurdî da Kirmancî (Badînî), Soranî, Hewramî; Rêzimanî Kurdî Bergî Yekem (Wişesazî) Beşî Pêncem (Kirdar); Rêzimanî Kurdî Bergî Yekem (Wişesazî) Beşî Duyem (Cênaw); Wişesazî Zimanî Kurdî; Rêzimanî Kurdî; Ziman û Edebî Kurdî Polî Diwazdehî Amedeyî û hwd*). Lê wekî din me sûd ji çend pirtûkên ku li Îran û Tirkîyayê çap bûne jî wergirtîye. Ji bilî van me sûd ji hejmarek tez û gotaran jî wergirtîye ku derbarê soranî û kurmançî da hatine nivîsandin.

Rênîşandana akademîk di xebatên akademîk da girîng e. Ez di vî warî da spasîya xwe pêşkêşî Doç. Dr. Mamoste Nesim Sönmez dikim ku di pêvajoya nivîsandina teza min da her dem alîkarîya min kir. Spasîyek jî dixwazim ji Dr. Mehmet Yonat û Doç. Dr. Yakup Aykaç ra bikim ku wan bi pêşniyarên xwe alîkarîya min kir.

Her wiha ji hevalên xwe yên başûrî yên Heval Kemal Mohamedamen, Araz Khalaf Amo û Qeyis Îsmâil Şerîf ra spas dikim ku kengî min ji wan çavkanî ji başûr xwestin, wan ew ji başûr ji min ra anîn û şandin, mala wan hezar carî ava. Dîsa ji başûr Spasîyek jî dixwazim ji Dr. Perwer Ebdulrehman Salih ra bikim ku di warê soranî da kengî min jê pirsê kir, bi dilxweşî pirsên min bersîvandin.

**WAN-2024**

## DESTPÊK

Gelek tişt hene ku mirovan ji heywanan cuda dikin ku ziman jî yek ji wan e û belkî mirov dikare bibêje ya herî girîng e jî. Zimanê mirovan bi xêra peyv û hevokan çêdibe û ji bo wê jî deng pêwîst e. Ji bo ku deng çêbe, tevgera lerizînê pêwîst e, wexta ku em hilmê xwe didin hewayê ku ji pişikên me derdikeve têlên me yên dengî dilerizîne û dengê xav çêdike. Ev deng di nav qirik û valahiyên dev û pozê mirovan da dirûvekê digire û ew kirpandîna dengî ku ji mirovan ra taybet e çêdibe. Piştî vê em bi xêra organên xwe yên din; didan, ziman, lêv, demaq û demaqê nerm dengê axaftinê çêdikin (Yelken, 2024).

Ya rast dema ku mirov li bûnwerên din mêze dike, dibîne ku ji bilî mirovan hin heywanên din jî hene ku ew jî ji devê xwe dengan derdixin û bi van dengan peywendî bi heywanên din û bûnwerên din ra datînin. Weke mînak kûçik diren (ewte ewt kirin), pîsik dikin mîyaw, hesp dikin hirîn, ker dizirin, gur dizûrin û hwd. Baş e, heke hin bûnwerên din jî hebin ku weke mirovan ji devê wan deng derdikevin û bi derdora xwe ra peywendî datînin wê demê çi ferqa dengê mirovan û dengê heywanan heye?

Fîlozofê Yewnanan Arîstoteles (Bz. 384- Bz. 322) berî vê 2400 salan di pirtûka xwe ya bi navê *Li ser Şîrovekirinê* da wiha gotîye: “Dengê heywanan jî hin tişt dîyar dikin bes tu ji wan ne nav in”. (Arîstoteles, 2018: 9) Wate dengê heywanan ne xwedan herf û kîte û peyv û kirpandinê ne, taybetmendiyên navlêkirinê tune ye û jê girîntir jî tu hevokekê çênakin. Herwiha dengê heywanan remza tiştên dinyayê û gerdûnê di mêjîye wan da nahewîne. Ji ber ku nav, ew peyv in ku em xêra wan mirovekî, heywanekî, gîyayekî, cîhekî û fikrekî ji yên din cuda dikin. Dîsa Arîstoteles di pirtûka xwe ya bi navê *Poetîka* de behsa lêkerê dike û dibêje ku lêker dengê biwater e (Arîstoteles, 2022: 58). Belê, wate, dengê ku ji devê mirovan derdikeve xwedan tîp û kîte û kirpandin û xwedan wate ye.

Dîsa di vî warî da mamosteyê Arîstoteles, fîlozofekî din yê Yewnana kevnare Platon jî di berhama xwe ya bi navê *Kratylos* da wiha dibêje: “Wê gavê wiha xuya dike ku nav ew taqlîdên bideng yên her tiştî ne ku hatine taqlîtkirin.” (Platon, 2020:161). Wisa xuya dike Platon dengê mirovan wiha dîtîye: forma bideng ya remzên

tiştên ku mirov li derveyî mêjîyê xwe li dinyayê û li gerdûnê dibîne û di mêjîyê xwe da dihewîne.

Xwendekarê Platonî Arîstoteles watedarbûna dengên mirovan bi lihevkirîbûna wan ve girê dide. Li gor wî dengên mirovan ku ji devê mirovan derdikevin ji ber ku ji hêla mirovan ve di mêjîyê wan da ji bo tiştên dinyayê weke remzek hatine destnîşankirin, mirovan li ser wan remzan ji hêla fikrî ve li hev kirîye û ji wan ra deng dîyar kirine, êdî dengên biwatedar in û ji deng ango ji teqereke heywanan cudatir in.

Li gorî Arîstoteles her çiqas peyvên ku ji devê mirovan derdikevin xwedan wate jî bin û hin tişt di mêjîyê me da weke remz çêbikin jî ji bo ku peyamekê bigîhinin divê di nav hevokekê da bi pergêl werin ba hev (Arîstoteles, 2018: 11). Wate nav û lêker û rengdêr û daçek û hoker û biker û hwd. divê li gor pergelekê rêz bibin û di navbera xwe da ahengek û rêkkeftinekê çêkin.

Fîlozof û zimanzan Noam Chomsky jî weke Arîstoteles di teorîya xwe ya Rêzimana Berhemhîner (Generative Gramer) da zimanê heywanan û mirovan ji hev cuda dike û dibêje, di mêjîyê mirovan da taybetmendîyek heye ku mirov bi xêra wê bi hêsanî fêrî zimanan dibe, bi peyvên nû bi hêsanî hevokan çêdike. Ev taybetmendîya hanê hîn di zikê dayikê da di mêjîyê her mirovekî da çêdibe. Li gor vê teorîyê mêjîyê mirovan bi rêzikên rêzimanî yê dîyarkirî, dikare hevokên bêdawî çêke. Chomskî jî vê taybetmendîya mêjîyê mirovan ra dibêje “innate” yanî tiştê ku ji hêla Xwedê ve hatîye dayîn, tiştê ku xwezayî di mêjîyê mirovan da heye. Ev tiştê hanê zimanê mirovan ji yê heywanan cuda dike. Chomsky jî vî tiştê hanê ra dibêje “qotîya reş” ya mirovan û weke “Language Acquisition Device Lad” (Lad.) wate “Amûra Bidestxistina Ziman” (Abz.) pênase dike û dibêje ev taybetmendî tenê di mêjîyê mirovan da heye ku kêrî fêrbûn û xebitandin û berhemanîna zimên tê. Teorî dibêje, mêjîyê hemû mirovan wexta ku zimanan bi kar tîne bi qayîdeyên rêzimanî dixebite û bi van qayîdeyan hevokên bêdawî pêkan e. Zimanzanîya modern ji vî tiştî ra “rêzimana gerdûnî” dibêje (Demirci, 2015: 185-188; Yücel, 2016: 169).

Chomsky di berdewamîya van teorîyên xwe da behsa teorîyeke din dike ku li gor vê teorîyê mêjîyê mirovan yê ku xwedan “Lad.”ê (Abz.) ye dema ku hevokan çêdike û bi kar tîne, peyvên wî (mêjîyê mirovan) li gor sîstemekê di rêkkeftinê da ne.

Chomsky ji vê teorîyê ra dibêje “Teorîya Rêvebirin û Girêdan” (Government and Binding Theory). Li gor vê teorîyê peyvên hevokên mirovan li gor hin qayîdeyan bi hev ra têne girêdan û têne rêvebirin. Chomsky li vir behsa rêzbûna hêmanên hevokê û rêkkeftina wan di nav hevokê da dîke (Demirci, 2015: 188-189).

Wexta ku hêmanên hevokê rêkdikevin, qertafên hev ji hêla hejmarî û kesî ve werdigirin û alîyê barhilgir kes û hejmara ji hemana ku qertaf (an) jê standîye nîşan dide. Bêguman hinek hoker hene ku li ser rêkkeftinan xwedan bandor in. Hinek ji wan dem, hebûn yan jî nebûna bireserê, têperî û teneperîya lêkera pêveber (predicate), erênî û neyînîbûna hevokê û hwd. Bêguman tenê ne ev in, hin binbeşên wan jî hene, li jêrê wexta ku em rêkkeftinên kurmancî û soranî şîrove dikin ev xalane dê derkevin û em ê jî behs bikin.

Zanîna van rêkkeftinên hanê ku Chomsky behs dîke ji bo famkirina xebitîna sîstema zimanan girîng e. Lewra li ser dinyayê li gor texmînan di navbera 5000 hezarî heta 6700 hezarî da ziman hene (Breton, 2007: 15). Hinek ji wan ji hin hêlan ve dişibin hevdu, hinek ji wan jî ji hin alîyan ve ji hev cuda ne. Yek ji wan cudahîyan jî dibe ku hevoksazîya (sentaks) wan be. Li vir mebesta me ji çêbûna hevokan tenê ne ew e ku rêza wan ya rêzbûnê ye, jê wêdetir û jê girîngtir pergela wan ya rêkkeftinê ye.

Weke rêzimanî rêkkeftin ew tişt e ku hêmanên hevokê di navbera xwe da li gor hin qayîdeyan rêkbikevin û bi rêya cînavkên kesandinê ra hevdu binimînin. (Hengirmen, 1999: 373). Ev rêkkeftin dibe ku di navbera biker û pêveberê da be, dibe ku di navbera bireser û pêveberê da be û herwekî em ê di vê xebata xwe da di rêkkeftinên soranî da bibînin dibe ku di navbera biker û bireserê da be. Li vir em dixwazin ji bo beşa destpêkê çend mînakên ji kurmancî û soranî û îngîlîzî bidin.

### **Kurmancî**

Ez we dihînim.

Min hûn birin.

Weke di mînakên kurmancî tê dîtin, di dema niha da pêveber (dihînim) li gel bikerê (ez) rêkkeftîye û cînavka wê ya kesandinê (-im) wergirtîye, di dema borî da jî

pêveberê (birin) li gel bireserê (hûn) rêkkeftîye û cînavka wê ya kesandinê (-in) wergirtîye.

Kurmancî	سۆرانى
Ez we dihînim.	من ئیوه دههینم. <sup>1</sup>
Min hûn birin.	من ئیوهم هینا. <sup>2</sup>

Di mînakên soranî da jî em dibînin di dema niha da pêveber (dehênim) li gel bikerê (min) rêkkeftîye û cînavka wê ya kesandinê (-im) wergirtîye, lê di dema borî da bireser (êwe) li gel bikerê (min) rêkkeftîye û cînavka wê ya kesandinê (-m) wergirtîye.

### Îngîlîzî

I am taking you. (Ez we dihînim)

I took you. (Min hûn birin)

Îngîlîzî di vî warî da ji kurmancî û soranî cuda ye, pêvebarên wê tu cînavkên kesandinê wernegirtîye, tenê di dema niha da li gor bikerê lêkera alîkar “am” hatîye û pêvever jî ji bo nîşandana dema niha qertafa “-ing” wergirtîye, yekjimarî û pirjimarîya bireserê, kesandina bikerê em ji biker û bireser û lêkera alîkar fam dikin. (Babayiğit, 2016: 62- 63) Heçî mînaka dema borî ye ji ber ku dem dema borî ye, tu lêkera alîkar nehatîye hevokê û tu qertafa demê jî nehatîye dawîya pêveberê, tenê li gor rêzimana îngîlîzî forma duyem ya lêkerê hatîye bikaranîn, ev jî ji ber vê ye ku di demên borî da li gor cureyên dema borî, forma lêkeran diguhêre (Kurt, 2020: 166).

Bêşik mijar tenê bi van mînakan ve safî nabe, gelek pêkar hene ku li ser rêkkeftinê bandorê dikin. Di beşa pratîkê ya xebata xwe da em ê behsa wan bikin.

### Armanca Tezê

<sup>1</sup> Bi alfabeya latînî: Min êwe dehênim.

<sup>2</sup> Bi alfabeya latînî: Min êwem hêna.

Zimanê kurdî tevî çend zaravayên xwe zimanekî xurt ê rojhilata navîn e. Zaravayên wî yên ku herî berbelav in û herî zêde têne bikaranîn, soranî û kurmançî ne. Armanca me di vê xebatê da ew bû ku em pergela xebitîna rêkkeftinên kurmançî û soranî derxin holê û şîrove bikin, hevparî û cudahîyên pergela rêkkeftinên wan dîyar bikin.

### **Rêbaza Tezê**

Ji bo ku mirov xwe bigihîne zanîne gelek bijarte li ber mirovan hene. Hinek ji wan: Pêhesîn, otorîte, aqilmendî (Rasyonelîzm), ceribandin, zanist. Rêbaza zanistî bi alîyên xwe yên bipergelîbûn û bikontrolîbûn û biceribandinîbûn û redkirin ango pesendkirina wê ve ji yên din cuda dibe.

Xebatên berawirdî yên zaravayên kurdî hindik in. Kurmançî û soranî jî yek ji wan zaravayan e ku heta niha kêma xebatên berawirdî li ser hatine kirin. Ev herdu zaravayên kurdî, alîyên wan yên hevpar jî hene, alîyên wan yên cuda jî hene. Ji bo ku em hevparî û cudahîyên herdu zaravayan ji hêla rêkkeftinên hêmanên hevokê ve dîyar bikin me di xebata xwe da cureyên rêkkeftinên herdu zaravayan berawird kirine.

Weke çawkanî me sûd ji pirtûkên rêzimanî yên herdu zaravayên kurmançî û soranî wergirtîye. Di wan pirtûkên hanê da me li mijarên cînavkên kesane, cînavkên kesandinê û lêkeran mêze kirîye û li gor wan agahîyan me pergela rêkkeftinên ya herdu zaravan şîrove kirîye. Ji bilî pirtûkên rêzimanî yên herdu zaravayan me sûd ji gotarên akademîk, ji tezên lîsansa bilind û doktorayê jî wergirtîye.

Dema ku me xebata xwe kir, me cureyên rêkkeftinan li gor deman, li gor gerguhêzî û negerguhêzî, li gor standin û nestandina bireserê, li gor xuyabûn û nexuyabûna biresera rasterast, li gor erênî û neyînîya hevokê, li gor hebûn û nebûna bikerê şîrove kirin. Me hem alîyên wan yên hevpar hem jî alîyên wan yên cuda raxistin ber çavan.

Xebata me ji destpêkek, ji sê beşan û ji encamekê pêk tê. Di beşa yekem da me behsa ziman û zimanzanî û rêkkeftinê kir. Di beşa duyem da me behsa cînavkên kesane, cînavkên kesandinê yên herdû zaravayan û behsa peywirên wan di nav hevokê da kir. Beşa sêyem, beşa me ya pratîkê ye, me di vê beşê da cureyên rêkkeftinên

hêmanên hevokê yên kurmancî û soranî raxistin ber çavan. Weke dawî jî di bin serenava encamê da jî me derencamên ku di vê xebatê da bi dest xistine, nivîsandine.

### **Girîngîya Tezê**

Ev xebat ji bo dîyarkirin û şîrovekirina sîstema cureyên rêkkeftinên kurmancî û soranî gelek girîng e. Piştî vê xebatê kesên ku dixwazin li ser cudahîyên kurmancî û soranî bixebitin, kesên ku dixwazin van herdu zaravayan fêr bibin yan jî pêşda bibin dikarin sûd jê werbigirin. Ji ber ku zanîna sîstema rêkkeftinên hemanên hevokan di nav zimanekî da yan jî di navbera zaravayên cuda da pir girîng e û weke em ê di vê xebatê da raxin ber çavan sîstema rêkkeftinên kurmancî û soranî ji hin alîyan ve ji hev cuda ne ku ev cudahî herî zêde di demên borî da wexta ku lêkerên pêveber gerguhêz bin, dikevin ber çavan.

### **Arîşeya Mijara Tezê**

Kurd û axa wan dabeşî çar dewletên cuda hatine kirin. Vê parçebûnê bandora xwe li ser pergala nivîsê jî kirîye. Kurdên Îran û Îraqê kurdî bi alfabeya erebî dinivîsin, kurdên Tirkiya û Sûrî jî bi alfabeya latînî dinivîsin. Pirtûkên kurdî yên ku li Tirkîyayê çap bûne bi alfabeya latînî çap bûne, yên ku li Îran û Îraqê çap bûne jî bi alfabeya erebî çap bûne. Vê yekê di lêkolînkirina pirtûkên kurdî yên ku bi alfabeya erebî hatine nivîsandin da hinekî zehmetî ji me ra çêkirîye. Xwendin û analîza alfabeya erebî ji mirovên ku hînî alfabeya latînî bûne, zehmet e û hîn zêde demê dixwaze. Ji bilî alfabeyê xebatên rêzimanî yên kurdên rojhilat û başûr di bin bandora akademîya Îran û Îraqê da, yên bakur jî di bin bandora akademîya Tirkîyayê da dimînin. Vê yekê bandora xwe li navlêkirina têgehên rêzimanî da jî kirîye. Ji ber vê yekê hinek têgehên rêzimanî jî di navbera kurdên bakur û başûr û rojhilat da cuda ne. Vê yekê jî di hêlsangandinê da ji me ra zehmetî anîye der. Em dikarin hinek ji wan cudahîyan wisa rêz bikin:

<b><u>Kurdên Bakur</u></b>	<b><u>Kurdên Başûr</u></b>
Kirde	Biker
Bireser	Berkar

Hevok	Riste
Lêker	Kar
Lihevkirin	Rêkkeftin
Cînavk	Cênaw
Hoker	Awelkar
Rengdêr	Awelnaw
Vegetandek	Amrazên Danapa
Rayek	Reg

### **Sînorên Tezê**

Weke tê zanîn cudahîyên di navbera zaravayan da dibe ku pir bin û gelek binbeşên wan yên cur bi cur hene. Herwiha di navbera kurmancî û soranî da jî çawa alîyên wan yên hevpar hebin, alîyên wan yên cuda jî gelek in û ne pêkan e di xebateke wiha de mirov bikare hemû alîyên wan yên hevpar û cuda nîşan bide. Belkî ji bo wê yekê çend xebatên wiha divên. Loma jî sînorên vê tezê tenê bi cureyên wan yên rêkkeftina hemanên hevokê yên weke biker, bireser û pêveberê ve sînardarkirî ye.

# 1. ZIMAN, ZIMANZANÎ Û RÊKKEFTIN

## 1.1. Ziman

Mirovê ku tiştên maddî û manewî di hişê xwe da fam dike, dihewîne, hildiberîne û peywendî bi tiştên din ra çêdike, wexta ku xwest bi van tiştan ra fikirandinekê bike û peyamekê bide ji wan mirovên ku di hişê xwe da ew tiştên dinyayê yên maddî û manewî weke wî dihewînin, fam dikin, hildiberînin, têkilî bi tiştên din ra çêdikin, zimanê xwe yan bi dengî yan jî temsîla wî ya remzî nivîsê bikar tîne û peywendî bi wan ra çêdike. (Kocaman û yd., 2006: 101). Wate fikirandin û ziman bi hev ra di nav peywendîyê da ne û mirov bi mêjîyê xwe dikare tiştên şênber yên dinyayê weke tiştên razber di hişê xwe da bihewîne û bi van tiştên şênber weke razber bifikire. Piştî fikirandinê, mirov wexta ku xwest hest û ramanên xwe bigihîne, bi peyvên ku ji denga pêk hatine hevokan çêdike û hest û ramanên xwe radigihîne mirovên din.

Ziman navgîna ragihandina hest û ramanên mirovan e û amûreke civakî ye. Civakîbûna xwe tenê ji ber alîyê wî yê civakîkirina mirovan nayê. Belê, ew jî heye, lê weke din jî yek ji taybetmendîya zimên ew e ku hemû endamên wî li ser peyv, çêkirina hevokê, kirpandinê û hwd. rêkkeftine. Ev rêkkeftina hanê ne rêkkeftineke derxwezayî ye, berovajî wê, xwezayî ye. Wate endamên her zimanekî nehatine ba hev û negotine em ji fêlan tiştî ra fêlan navî dîyar bikin û hevokan bi fêlan rêzêkirinê û rêkkeftina hêmanên hevokê çêkin. Ji bo navlêkirinê weke mînak em kurd hemû ji “avê” ra dibêjin “av”, ji “dest” ra dibêjin “dest”, ji “serî” ra dibêjin “serî”, ji “ezmên” ra dibêjin “ezman”, ji “pirtûk” ra dibêjin “pirtûk” û hwd. Lê bav û kalên me li hev necivîne û negotine em ji avê ra bibêjin av û ji dest ra bêjin dest, ji serî bêjin serî... ev navlêkirin bixwe, weke xwezayî çêbûne. Ev tişt ne tenê di zimanê kurdî da di hemû zimanan da wisa bûye û îro jî wisa ye. Weke mînak tirkan li hev necivîne û negotine em ji “su” ra bêjin “su”, ji “el” ra bêjin “el”, ji “kafa” ra bêjin “kafa”, ji “kitab” ra bêjin “kitab”...

Vê çêbûna zimanan ya xwezayî ne tenê di navlêkirinê da, di rêzbûna hêmanan hevokê da jî xwe nîşan daye. Her zimanek rêzbûneke wî heye û ev ji xwezayê xwe ve çêbûye tu milletek negotîye em bi û bireser û pêveber û hwd. wisa rêzê bikin. Weke mînak di kurdî da wexta ku em hevokê çêdikin bireserên me piranî di nav hevokê da dibe. Weke mînak: Ez wî dişînim (I am taking him), ez ê wî bişînim (I will take him), min ew şand (I took him). Lê ev rêzbûn dibe ku di zimanên din da cuda be, weke

mînak, di îngîlîzî da bireser piranî di dawîya hevokan da ye: I am taking him, I will take him, I took him. Ev pêvajoya navlêkirin û rêzkirina hevokan ji xwezayê xwe ve çêbûye. Ji van zimanan ra ku ji xwezayê xwe ve derketine û dirûv girtine zimanên xwezayî tê gotin: Wek; îngîlîzî, rûsî, tirkî, farsî, îspanyolî, çînî, kurdî, fransî, japonî....

Digel zimanên xwezayî çend ziman hene ku bi destê mirovan hatine çêkirin û qayîdeyên wan ji hêla wan mirovên ku ew çêkirine hatine dîyarkirin. Ji van zimanan ra zimanên plankirî-çêkirî tê gotin. Kevintirîn zimanên çêkirî yê dinyayê *Lingua Ignotayê* ku ji hêla Hildegarda Bilgenî û zimanê *Balaybelena* ku ji hêla Muhyî-i Gulşenî ve hatine çêkirin. Zimanê herî berbelav yê çêkirî *Esperanto* ye. Zimanên din yê çêkirî ev in: Idiom Neutral, Înterlingua, Interlingue, Ithkuil, Lincos, Lingua Franca Nova, Mari-Dari, Novial, Toki Pona, Volapük, Çataldili. Ev zimanane bêguman qasî zimanên xwezayî ne berbelav in. Hinek ji van zimanan axêverên van qasî tilîyên destekê ne. Ji nav van zimmên çêkirî yê herî berbelav û yê ku xwedîyê herî zêde axêveran e Esperanto ye. Esperanto li gor texmînan nêzîkî 8000000 mîlyon kes pê ra eleqedar e û ji nav van 8000000 mîlyon kesan 500000 hezar kesî dikarin bi esperantoyî biaxivin û binivîsin (Breton, 2007: 21).

Di derbarê kana zimanên xwezayî da -di awayê çêbûna wan da- nêrînen cuda hene. Yek ji wan nêrîna teorîya bow-wowê ye ku xwe dispêre taqlîtkirina xwezayê. Yeke din jî teorîya pooh poohê ye ku ev jî xwe dispêre kelecana mirovan. Li gor vê teorîyê peyv ji encama kelecana û hestên mirovan derketine. Yek ji yê din jî teorîya dîng-dungê ye, li gor vê teorîyê jî mirovên zemanên berê her dîmen û wêneyên ku li derveyî xwe dîtine, wateyeke hizrî di mêjîyê xwe da dayîne. Li gor Chomskyê têgeh di mêjîyê heywanan da jî hene, bes tenê di mêjîyê mirovan da digihêjin hev û di qonaxên din da jî bi hev ra hevokan çêdikin û zimanan pê çêdikin û bi kar tînin (Yaylagil, 2015: 64-65) Çend angaşten din jî ev in; angaşta haw haw û guguk ku xwe dispêre dengê heywanan û dibêje mirovan dengê heywanên din taqlît kirin û bi vî awayî ziman çêbûn, angaşta tûh tûh dibêje, ziman ji gazîyên mirovan peyda bûn, angaşta dîng-dong dibêje ziman bi awayekî alandaneke xwezayî çêbûye, angaşta ye-he-ho jî dibêje ziman ji ahenga xebitîna qasên mirovan peyda bûye (Yaylagil, 2015: 64-65; Barnard, 2016: 31).

Her çiqas ziman peymaneke li ser xwezayî rêkkeftî jî be, ev nayê wê wateyê ku qayîdeyên zimanan her dem weke xwe dimînin. Ziman bi demê ra diguhêrin û xwedan rê û rêbaz û peyv dibin. Carnan ev guhêrînên hanê zimanên nû çêdikin, carnan jî ji nav heman zimanî zaravayên nû têne der (der dikevin). Bêguman gelek sedem hene ku ziman biguhêrin û zimanên nû û zaravayên nû çêbin. Weke sedemên sîyasî, cografî, îklîmî û tîcarî û hwd. Necip Üçok di pirtûka *Dilde Değişiklik ve Değişme* da ew sedemane bi vî awayî rêzkirine (Üçok, 2004: 76):

#### A. Şert û Mercên ku Dibin Sedama Guherîna Zimên

1. Taybetmendîyên zimên yên fonetîk, yanî rêbaz û kesayeta axaftinê.
2. Şert û mercên taybet bo zimanekî dîyarkirî di demeke dîyarkirî da.
3. Şert û mercên psîko- fîzîkî ku ew ziman tê da ye.

#### B. Hinek Hêzên ku Han Didin Ziman Bê Guherandin

1. Hewildana zimên ya di carekê danfamkirin û danxuyakirinê.
2. Hewildana kêmkirina bargiranîyan.
3. Hewildana ber bi rêxistin û dabeşkirinê
4. Temayûlên civakî yên di nav zimanekî da
5. Hewildana zimên ya xweş dengderxistinê.
6. Hewildana aramkirina rewşa aloz û tund.

Bi demê ra ji ber sedemên jorê ziman ji hev cuda bûne û heta îro hatine, di dîrokê da û di roja îro da jî mirov li ser xebitîn û bandor û cudahîyên zimanan fikirîne û kar li ser kirine.

Zanista ku ziman bi awayekî zanistî lêkolîn dike jê ra zimanzanî tê gotin. Niha em ê hinekî li ser zanista zimanzanî bisekinin. Em ê hinekî behsa wê, dîroka wê û binbeşên wê bikin.

## 1.2. Zimanzanî

Zanist hewildana rêbaza xwegihandina rastîyê ye derbarê her parçeyekî gerdûn û heyberên gerdûnê û bûyerên wê da bi rêbaza ceribandin û li gor hin qayîdeyan. Mirovatî di dirêjahîya umrê xwe da her dem xwestîye derdora xwe û xwe û her tiştê ku dîtîye û bihîstîye, pê hesîyaye fam bike. Her û her ketîye dû pîrsa em kî ne, ji ku hatine, tiştên derdora me û bi me ra têkildar çi ne? Geh ketine pey tiştên maddî, geh ketine manewî, ji bo wê dîn, zanist, binbeşên zanistan afirandine (Derry, 2021: 193-433).

Zimanzanî jî yek ji wan beşên qada lêkolîna zanistê bûye di dîrokê da jî di roja me ya îro da jî. “Armanca zimanzanîyê ew e ku şayesendina pergelen zimane xwezayî, destnîşankirina qayîdeyên wan û çawanî û karîgerîyên wan li ser mirov û derdora wan û pêşkêşkirina derbarê fêrbûn û fêrkirina zimane bîyanî da.” (Yaylagil, 2015: 73). Zimanzanî bi kurdî beramberî peyva lingustîkê tê. Ziman, mijara sereke ya lêkolîna qada zimanzanîyê ye. Her zanistek xwedîyê pergela komkirina amaran e. Zimanzanî jî weke zanistên dîn ji bo ku xwe bigihîne dane û armanca bi awayekî bêalî û bipergel amaran kom dike, hewil dide hîpotezên xwe piştrast bike, hewil dide ji xwe ra model û teorîyan çêke û pêşda bibe. Zimanzanîyê; bi dîsîplînen dîn yê weke felsefe, etnolojî, sosyolojî erdzanî, fîzîk, fîzyolojî, înfomatîk, norolojî, ragihandin û hwd. ra têkilîyeke wê heye û bi vî awayî geşe girtîye, her ku diçî pêşda diçe.

Divê em li vir hinekî behsa cudahiya rêziman û zimanzanî bikin ku carnan ev herdu têgehên nêzîkî hev tene tevlihevkin. Peyva rêzimanê ya kurdî wateya gramere pêşwazî dike. Gramer peyveka Yewnanî ye û tê wateya hunera rastnivîsandinê û zanista tîpan (Nişanyan, 2022: 323-324) “Gramer ew beşa zanistê ye ku zimaneke ji dengnasîyê heta rêzbûna peyvên wî û hemû perçeyên wî lêkolîn dike.” (Karağaç, 2019: 80). Wate ji bo paknisîvandin û pakaxaftina zimaneke hemû qayîdeyên ku divê bêne zanîn gramere (rêziman) ji me ra diyar dike. Rêziman bi giştî bi alîyê zimên yê avanîyê ve têkildar dibe. Herçî zimanzanî ye wateyeke hîn berfireh pêşwazî dike û rêzimanê jî di nav xwe da dihewîne. Zimanzanî zimane mirovan bi hemû alîyên wan ve lêkolîn dike û vegotin û tesfîr û têkilîyên wan yê hundirîn û cîhê wan yê di nav civakê da ji xwe ra qadên xebatê qebûl dike. Bi van taybetmendîyên xwe zimanzanî

xebata li ser zimên ji hêla avanî, wateyî û erkî ve çarçove dike û beşên rêzimanê jî di nav xwe da dihevine (Demir û Yılmaz, 2003: 33; Kocaman û yd., 2006: 10).

Her çiqas zimanzanî di roja me ya îro da geşe girtibe jî dema ku mirov li dîrokê mêze dike, dibîne ku ne tenê di di roja me ya îro, di dîroka nêzîk da jî herwiha di serdemên kevin da jî mirovan serê xwe bi zimên û tiştên pê ra êşandîye. Her çiqas ew xebatên destpêkê ne xwedîyê dîsîplîna zimanzanîyê jî bin, dîsa jî wan xebatan bi hewildan û xebatên xwe yên destpêkê ve bingeha rêzimanê û pê ra girêdayî bingeha zimanzanîyê jî danîne.

Li gor amarên di destê me da yekem şaristanîyên ku li ser zimên lêkolîn kirîye ev in:

Mezopotamya: Sumerîya ku li mezapotamyayê hatîye bikaranîn milletê akadîyan weke zimanê dîn û edebîyatê jê sûd wergirtîye û akadî ji bo ku ew zimanê dîn û edebîyatê fêrî xelkê bikin, li ser rêzimana sumerî frakman nivîsandine (Yaylagil, 2015: 73).

Hîndistan: Li Hîndistanê demek tê û rahîbên Hîndû pê dihesin ku zimanê wê demê ku pê diaxivin û zimanê ku pê Vedayan hatîye nivîsandin ji hev cuda bûne û hîn jî dibin. Piştî wê, wan xwestîye resenîya wan Vedayan biparêzin. Ji bo wê jî wan ji hêla dengnasî û rêzimanî û kêş (wezî) ve kar li ser nivîsên Vedayê kirîye (Demir û Yılmaz, 2003: 28).

Misira Kevn: Li Misira Kevin di sedsala Bzê. 7an da împaratorê wê demê yê Misira Kevin lêkolînek dayîye kirin û xwestîye fêr bibe kana zimanan çî ye û dibe ku ew hemû zimanên li ser erdê ji kîjan zimanî belavî dinyayê bûbin. Ji bo vê yekê, wî du pitik dîyar kirine û ew pitik heta ku hatine wexta axaftinê li gel wî mirov bi tu awayî neaxivîne. Armanca wan ew bûye ku ew pitik heta ku gîhane dema axaftinê, ji zimanên mirovên derdora xwe bandor negirin û zimanê ku ji hebûna wan çî be, wî bi kar bînin. Piştî ku zarok hatine wexta axaftinê yek ji wan zarokan axivîye û yekem peyva ku ji devê wî derketîye “bekos” bûye û ew jî peyveke ji zimanê frîgyayê bûye ku tê wateya nê (Herodotos, 2007: 117-118).

Yewnana Kevn: Li Yewnana berê di sedsalên Bz. 4 û 5an da Platon (Bz. 427?-347) û Arîstoteles (Bz. 384-322) derbarê peyv û alîyê wê yê rêkkeftina hişmendî û lêker û

cudahîya zimanê mirovan û heywanan da xebat kirine. Em dikarin destpêka xebatên Yewnana berê bi Platonî bidin destpêkirin. Wî piranî li ser peyv û lêkerê sekinîye. Piştî wî xwendekarê wî Arîstoteles tê û ew jî piranî li ser lêker û nav û alîyê wan yê rêkkeftinê da sekinîye (Fischer, 2010: 142).

Roma: Romayîyan ji xwe ra Yewnan weke mînak girtine. Li vir tenê berhema Marcus Terentius Varro (Bz. 116-27) ya bi navê *De lingua latine* û ya bi 23 cildî weke îstîsnayek dikare bê nîşandan ku tê da rêzimana latînî ji hêla etîmolojî, hevoksazî û dirûvsazîyê ve tespît kirîye. Xêra serdema Romayê ya herî sûdmentir ji bo xebatên zimanzanîyê ew e ku modeleke pênasekirina rêzimanî danîye ku ew ê demeke dirêj bingeha waneyên zimên bibûya (Demir û Yılmaz, 2003: 28).

Cîhana Ereban: Piştî sedsala Pz. 7an ku Hz. Muhammed Îslam ragihand û Îslam belavî dinyayê bû, qîmeta zimanê erebî jî li nav ereb û milletên din da zêde bû. Ji bilî berhema Îbn Barunê (bi xwe cihûyekî Îspanyayê ye) ya ku erebî û îbranî dabû ber hev xebatên din piranî yên erebî li ser Quranê ne. Sibeveyhîyê ku bi eslê xwe farisek bû di sedsala Pz. 8an da berhemek bi navê *el-Kîtab* dinivîse û ew berhem dibe kana sereke ya perwedeya zimanê erebî (Fischer, 2010: 148-149).

Ji Serdema Navîn heta Roja Me ya Îro: Di dirêjahîya serdama navîn da (Pz. 600- 1500) Ewropa di bin bandora dêr û dînan da maye û xebatên wan yên rêzimanî piranî li ser latînî ne. Ji ber vê yekê ku zimanê latînî li Ewropayê zimanê dêrê û perwedehîyê bû. Pirtûka Dante ya ku di vê serdemê da hatîye nivîsandin ya bi navê *De Vulgari Eloquentia* girîng e. Di dawîya vê serdemê da hinekî bandora dêrê kêmbûye û xebat li ser îbranî û erebî jî hatine kirin.

Piştî ku serdema ronesans û reformê dest pê dibe rexne li dêrê tê girtin û pê ve girêdayî her milletek berê xwe dide zimanê xwe yê netewî û milletên weke fransî, lehî, silavî, îspanî, portekîzî, flemenkî, îşveçî û hwd. ji bo zimanên xwe pirtûkên rêzimanî çap kirin. Ji bilî pirtûkên rêzimanî klasîkên yewnanî û încîl wergerandin bi ser zimanê xwe.

Di sedsalên 18. û 19.an da em dikarin bêjin serdema zimanzanîyê ya modern dest pê kirîye. Bi taybetî xebatên Dibistana Port Royal ku ketibû pey mantiqa di

zimanan da gelek girîng bû. Dîsa xebatên berawirdî yê vê demê yê Panini, William Jones, Rasmus Rask, Jacob Grimm û Franz Bopp ji bo zimanzanîya berawirdî girîng bûn.

Ya rast di zimanzanîyê da pêşketina berçav di sedsala 20an da hate pêş. Zimanzanê Îsveçî Ferdinand de Saussure (1857-1913) di vê pêşketinê da roleke wî ya mezin heye. Wî gelek têgehên rêzimanî ji zimanzanîyê ra danîne û ziman weke pergeleke nîşanan pênase kirîye û awayê lêkolîna wî ya li ser ziman avahîsaz e. Xwendekarên wî notên dersên ku wî li zankoya Cenevreyê dabûn di sala 1916an da weke pirtûkekê çap kir. Piştî wî jî gelek dibistanên zimanzanîyê di bandora Saussurreyî da mayîne. Hinek ji wan; Dibistana Zimanzanîyê ya Pragê, Dibistana Kopenhagê û Dibistana Amerîkayê.

Di nav dibistana Amerîkayê da Noam Chomsky bi têgehên xwe yê rêzimana gerdûnî (universal gramer) û rêzimana hilberîner-zivirîner (generative gramer) ra ji yê din cuda dibe û mohra xwe li zimanzanîya modern danîye. Li gor wî di mêjîyê mirovan da taybetmendîyek heye (Abz.) ku ji mirovan ra taybet e û di bûnewerên din da tunne ye. Li gor wî mirov bi qayîdeyên hevpar yê zimanî dikare hevokên bêdawî çêke (Yozgat û yd., 2018: 35-40; Aydın, 2021: 25-29).

### **1.2.1. Binebeşên Zimanzanîyê**

Zanista zimanzanîyê; zimên di bin binebeşên weke dengzanî (fontetîk), morfoljî, fonolojî, watesazî (semantîk), peyvzanî (leksîyoloji), ferhengnasî, navnasî, zaravanasî û hwd. lêkolîn dike. Li jêrê em ê behsa van binebeşên zimannasîyê û bi hevoksazî ra girêdayî behsa rêkkestina hêmanên hevokê di nav hevokan da bikin.

#### **1.2.1.1. Fonetîk (Dengsazî)**

Dengê mirovan ji hêla deng derxistin û watetarbûna wî ra taybet e ji mirovan ra. Mirov ji bo baştêgehîştina dengê xwe zanistek danîye. Ew jî dengnasî ye. “Dengnasî; ew zanist e ku dengê mirovan, bêyî ku fonksiyonên wan û taybetmendîyên wan yê di warê ragihandinê da li ber çavan bigire lêkolîn dike.” (İmer û yd., 2011: 220). Dengsazî dengê mirovan destnîşan dike, tesnîf dike û taybetmendîyên wan pênase dike. Dema ku dengê mirovan tesnîf dike, weke du komên sereke (dengdêr-dengdar) tesnîf dike. Ji bilî van awayê derketin, çêbûna gotina dengên mirovan jî

lêkolîn dike. Dema ku vêya dike li organên mirovan yên ku deng û axaftinê çêdikin wek qirik, ziman, lêv û didan û hwd. di çarçoveya deng derxistinê da lêkolîn dike (Kocaman û yd., 2006: 20-34). Dengsazî li ser zimanekî tenê na, bi awayekî giştî li ser dengê mirovan dixebite.

#### **1.2.1.2. Fonolojî (Dengzanî)**

Dibistana Pragê ku di sala 1926an da ava bûye sûd ji teorîya Saussareyê wergirtîye ku wî ziman weke pergelekê qebûl kirîye û li gor wî “di hêlîngandina hêmanên hevokê da yek bi yek peywira foneman heye” û wî dengên mirovan di vê çarçoveyê da lêkolîn kirîye, peyva phonologie jî di vê wateyê da bi kar anîye. (Aksan, 2020: 28). Armancên dengnasîyê ew in ku aliyên cuda yên dengên zimanekî pêşan bide, xwezaya pergela zimanên dinyayê dest nîşan bike û fonksiyonên zimanan dîyar bike.

Her çiqas dengsazî û dengzanî du têgehên nêzî hev jî bin, navbera wan da cudayî heye. Dengsazî ji hêla fizîkî ya dengên mirovan ra mijûl dibe, lê dengzanî bi wan aliyên dengî ra mijûl dibe: peywira wan, rêzbûna wan û çawanîya bandora awayî bikaranîna wan.

#### **1.2.1.3. Morfolojî (Peyvsazî)**

Ji bo çêkirina hevokan peyv pêwîst in û ew zanista ku peyvên mirovan lêkolîn dike jê ra peyvzanî tê gotin. “Peyvzanî anku morfolojî di zimanzanîyê da beşek e. Bi rêya vê beşa zanistê, mirov reng û dirûvê bêjeyan, rêz û rêzikên pêkanîna bêjeyan nas dike.” (Tan, 2015: 55). Morfolojî di nav zimanekî da awayê bikaranîna kok û qertafan, wateyên qertafan û peywirên wan, taybetmendîyên dariştina peyvan û kişandinê û bi aliyên din yên dirûvî ra mijûl dibe. Qertaf û rayekên ku peyvan çêdikin, taybetmendîyên wan û bi hev ra bestina wan û rê û rêbazên dariştina peyvan ev hemû dikevin nav morfolojîyê. Têkilîya morfolojîyê bi densazî û ferhengnasî û hevoksazî û rehzanîyê ra jî heye (Aydın, 2021: 71).

#### **1.2.1.4. Semantîk (Watesazî)**

Di her zimanekî da her bêjeyek û hevokê xwedîyê wateyê ye (ne), ew wate li gor mebesta mirovan û li gor awayê bikaranînan dibe ku biguhêre. Ew binbeşa zimanzanîyê ku li ser wateya peyvan û hevokan dixebite watesazî ye. Watesazî ji ber

çend armancan hatîye holê ku ew jî ji holê rakina şêlîbûn (Ambiguity) û rêşaşîyên (Anomalie) peyvên û hevokan û şêweya dariştina (Praprasen) peyvên e (Dizeyî, 2014: 26-27).

#### **1.2.1.5. Leksîkolojî û Leksîkografî**

Leksîkolojî (peyvzanî) peyvên zimanekî ji hêla hebûn û dewlemendîya peyvên wî yên heyî, taymetmendîyên hêmanên zimên ji hêla morfolojîk ve û pêşketina peyvên wî zimanî ya dîrokî ve lêkolîn dike. Herwiha leksîkolojî peyvên zimanekî di çarçoveya qada wan ya wateyî da û di peywendîya wan ya civakî da lêkolîn dike (Aksan, 2020: 31).

Leksîkografî (ferhengnasî) jî têkilîya wê ya leksîkolojî ra ji nêz ra heye. Leksîkografî rê û rêbazan datîne ji bo amadekirina ferhengan û ferhengên ku berê hatine amadekirin ji hêla cur bi cur ve disenifîne (Aydın, 2021: 139).

#### **1.2.1.6. Dîyalektolojî (Zaravazanî)**

Ziman û zaravayên wan her dem di pêvajoya guherînan da ne. Armanca dîyalektolojîyê jî ew e ku cudahî û hevparîyên zaravayên zimanan derxe holê û awayê guherîna wan û zaravayan vebêje. Endamên zaravayan û sînorên wan yên cografî di qada dîyalektolojî da ne (Ağca, 2020: 6-7).

#### **1.2.1.7. Sentaks (Hevoksazî)**

Hevok ji bo xweşragihandina hest û ramanan navgîneke zaf kêrhatîdar e. Ji bo xweşragihandina hest û ramanan jî divê pergela rêzbûn û peywendîya hêmanên hevokê ya wî zimanî bê zanîn. “Sentaks; wate, hevoksazî, ji bo çend armancan e ku weke hîlbijartina keresteyan û rêzkirina hêmanên hevokê û ew guherînen ku bi ser rêzkirinê ve tên. Di hevoksazîyê da ji hêla erkan ve amaje bi peyvên tên kirin, ne bi dîmen û rê rêbaza çêkirina wan ve. Bi vî awayî hevoksazî destûra civandin û rêzkirina keresteyên hevokan e bi sîstema zimanekî dîyarkirî.” (Dizeyî, 2014: 163). Hêmanên hevokan ji bo ku peyameke watedar ragihînin li gor pergeleke dîyarkirî ya zimanekî rêz dibin û hevoksazî jî pergela wan ya rêzbûnê û peywendîya di navbera wan hêmanan da lêkolîn dike.

Di navbera hevoksazî û rêziman da têkilîyeke xurt heye. Heta hinek teorîyên hevoksazîyê bi navê rêzimanî tên navandin. Weku: Rêzimana Hilberîner (generative

gamer), Rêzimana Gerdûnî (universal gamer), Rêzimana Veavaker (Yaylagil, 2015: 120).

Wateya hevokan ji wateya peyvan ve nayê, ji ber bi hev ra girêdana hêmanên hevokê tê ku li gor rêzimana wî zimanî rêz bûne û di navbera hêmanên hevokê da ji hêla rêzimanî ve rêkkeftinek heye (Dizeyî, 2014: 43-44). Belê, rêkkeftin di hevoksazîyê da mijareke girîng e ji bo bikaranîna zimanekî û ji bo gihandina peyaman bi awayekî watedar.

### 1.3. Rêkkeftin

Her zimanek xwedîyê pergeleke taybet ya dengnasîyê ye; wate xwedîyê pergeleke veavakirina dengan e, xwedîyê pergeleke morfolojîk e; wate xwedîyê pergeleke çêkirina peyvan e, xwedîyê leksîkolojî û leksîkografî ye; wate pergela wî ya peyvzanî û ferhengnasî heye, xwedîyê pergeleka hevoksazîyê ye; wate xwedîyê pergela çêkirina hevokan ya peyvan e. Rêkkeftina hêmanên hevokê alîyekî girîng yê pergela hevoksazîyê ye.

“Rêkkeftin, di afirandina pêvajoya hevokê da hevkarîgerîya hêmanên hevokê ji hêla weke kes, jimare û rewş ve lêkolîn dike” (Yozgat û yd., 2018: 317). Ev ji bo famkirin û bikaranîn û fêrkirina zimanekî pir girîng e. Ji ber ku peyv çî lêker, çî nav, çî cînavk, çî hoker, çî rengdêr û hwd. be di nav hevokê da ji bo ku hevokeke li gor rêzimanî û watedar çêkin divê di navbera wan da rêkkeftinek û ahengek hebe. Eger mirov van rêzikên rêkkeftina zimanekî nezanibe, dibe ku hevokên şaş û bê watedar çêke û dibe ku nekare hest û ramanên xwe bigihîne yê bihîzer.

Mînak:

Biz cevizleri yedi.Ø\* (Me gûz xwarin)

Sen cevizleri yiyorsum.\* (Tu gûzan dixwî)

Hevokên jorê yên tirkî ji hêla rêkkeftinê ve şikestî ne. Ji ber ku pêveber bi bikerên hevokan ra rêknekeftîye û ji hêla kes û mêjerê ve bikerê nanimînin. Li gor rêzimana tirkî divê pêveber her dem bi bikeran ra rêkbikevin. (Demir, 2022: 396). Lewma jî ji bo ku ev hevokên tirkî, rêzimanî û watedar bin divê wiha bin:

Biz cevizleri yedik. (Me gûz xwarin)

Sen cevizleri yiyorsun. (Tu gûzan dixwî)

Di hevoksazîyê da rêkkeftina di navbera hêmanên hevokê bi rêya morfolojîk çêdibe. Hêmanên hevokê (pêveber, biker, bireser û hwd) li gor rêkkeftina ku rêzimana wî zimanî dîyar kirîye cînavkên kesandinê an jî li gor mêjerê qertafên yekjimarî û pirjimarîyê werdigirin cîhê dîyarkirî (Îmer û yd., 2011: 264).

Mînak:

I usually go to school. (Ez piranî diçim dibistanê)

She usually goes to school. (Ew piranî diçe dibistanê)

Dema em li mînakên jorê yê inglîzî mêze dikin, em dibînin ku di hevoka yekem da pêveberê (go) tu morfeman negirtîye, lê dema em li mînaka duyem mêze dikin, em dibînin ku vê carê pêveber (goes) morfema (-es) wergirtîye. Ev rewşên heyî jî bi rêzimana inglîzî tên, ji ber ku di dema fireh ya inglîzî da ji bo kesê yekem yê yekjimar tu morfem naçin dawîya pêveberê, lê ji bo kesê sêyem yê yekjimar (she, it, he) morfemên (-es, s) diçin dawîya pêveberê (Babayiğit, 2016: 58-59).

Di nav hevokê da divê du cure rêkkeftinên hêmanên hevokê hebe, yek jê rêkkeftina rêzimanî ye, yek jê rêkkeftina wateyî ye (Dizeyî, 2014: 202).

### 1.3.1. Rêkkeftina Wateyî

Hevokê ji bo ku bibe watedar, ji bilî rêkkeftina rêzimanî, divê rêkkeftina wateyî jî bihewîne. Hevokê dibe ku bibe rêzimanî lê ew nayê wê wateyê ku ew hevok jî hêla wateyê ve temam e (Dizeyî, 2014: 206).

Mînak:

Baran barî û her der spî kir.\*

Dema ku em li mînaka jorê mêze dikin, li gor rêzimana kurmancî hevok rast e, tu pirsgirêkeke rêzimanî tê da tune ye. Bes dema ku mirov ji jêla mantiqî ve mêze bike, dibîne ku pirsgirêkek heye. Ji ber ku dema ku baran dibare her der spî nake, tenê şil

dike, tu spîyêyek li dû xwe nahêle. Tiştê ku her der spî dike berf e. Eger ev hevok wisa bûya, tê da rêkkeftina wateyî çêdibû.

Baran barî û her der şil kir.

Yan jî

Berf barî û her der spî kir.

### 1.3.2. Rêkkeftina Rêzimanî

Hêmanên hevokê divê ji hêla kes, jimare, rewş û zayendê ve rêkbikevin. (Can û yd., 2020: 320) Ev kategoriyên rêkkeftinê di nav hevokê da dibe ku tenê bin, yan jî dibe ku ji yekê zêdetir jî hebin. Wate rêkkeftina hêmanên hevokê dibe ku tenê ji hêla kes jî be, dibe ku tenê ji hêla jimare ve be û hwd. û dibe ku yek, du, sê heb ji wan di heman demê da di nav hevokê da hebin. Niha jî em hinekî bi hûrgilî li wan kategoriyên rêkkeftinê mêze bikin.

#### 1.3.2.1. Kategoriyên Rêkkeftinê

##### 1.3.2.1.1. Kes

Kes, axêver û bihîzer û her kesê ku beşdarî axaftinê bûyî dinimîne. Weke kesê yekem (yekjimar-pirjimar), kesê duyem (yekjimar-pirjimar), kesê sêyem (yekjimar-pirjimar) tên dabeşkirin. Divê kesê ku ziman bi kar tîne, cînavka guncaw ya kesane ya wî zimanî li beramberî kesê diaxive bi kar bîne.

Di kurdîya kurmancî da weke rêzimanî cînavkên ku kesên dinimînin ev in:

Kesê yekem yê yekjimar	Ez, min
Kesê duyem yê yekjimar	Tu, te
Kesê sêyem yê yekjimar	Ew, wî, wê
Kesê yekem yê pirjimar	Em, me
Kesê duyem yê pirjimar	Hûn, we
Kesê sêyem yê pirjimar	Ew, wan

Di kurdîya soranî da weke rêzimanî cînavkên ku kesan dinimînin ev in:

Kesê yekem yê yekjimar	Min
Kesê duyem yê yekjimar	To
Kesê sêyem yê yekjimar	Ew
Kesê yekem yê pirjimar	Ême
Kesê duyem yê pirjimar	Êwe
Kesê sêyem yê pirjimar	Ewan

### 1.3.2.1.2. Mêjer

Navdêrên zimanan dibe ku yekjimar, dibe ku pirjimar bin. Di hinek zimanan da navdêr taybetmendîyên xwe yên mêjerî dîyar dikin. Ev dîyarkirin dibe ku bo yekjimarî bin, dibe ku ji bo pirjimarîyê bin (Çetin, 2023: 17).

Bêguman tenê ne navdêr, hin beşên din yên zimanan yên weke cînavk jî dibe ku di nav xwe da yekjimarî û pirjimarî bihewînin. Hinek ziman ji bo dîyarkirina yekjimarî û pirjimarîya navdêran pêşgir û paşgiran bi kar tînin. Di hinek zimanan da pirjimarî ji diduyan ve dest pê dike weke kurdî û inglîzî û tirkî, di hinek zimanan da jî pirjimarî ji sisê ve dest pê dike weke zimanê erebî (Emîn, 2009: 159).

Dema ku tê gotin yekjimarî, ew tê wê wateyê ku peyv wateya tişteki an jî kesekî pêşwazî dike. Dema ku tê gotin pirjimar, ew tê wê wateyê ku peyv wateya ji yekê zêdetir tiştan û kesan pêşwazî dike.

Di zaravayê kurmancî da mêjer ji qertafên tewangan, ji veqetandekan, ji qertafên nebinavkirî, ji cînavkan, ji hejmaran, ji baneşanê, di dema niha û bê û demên borî da dema ku lêkera pêveber teneper be ji pêveberê (mêjera bikerê) û di demên borî da dema ku lêkera pêveber têper be ji pêveberê (mêjera bireserê) tê famkirin (Baran, 2018: 54-57).

### Bi Rêya Tewangê:

Yekjimar: -î,- ê, -ekî-

Pirjimar: -ekê, -an, -inan.

Mînak:

Ev derman ji çavekî ra ye.

Mamosteyan ew bir.

### **Bi Rêya Veqetandakê:**

Yekjimar: a, ê, eke, ekî

Pirjimar: ên, ine

Mînak:

Mirova baş hat.

Mirovên baş hatin.

### **Bi Qertafên Nebinavkirî:**

Yekjimarî: -ek

Pirjimarî: -in

Mînak:

Maşîneyek sekinî.

Wê gûzin birine wê derê.

### **Bi Cînavkan:**

Yekjimar: Ez (min), tu (te), ew (wî, wê)

Pirjimar: Em (me), hûn (we), ew (wan)

Mînak:

Ez gotarê dinivîsim.

Em gotarê dinivîsin.

**Di Dema Niha û Bê û Demên Borî da ji Pêveberê:**

**Mînak:**

Xwendekar tê. **ø**

Xwendekar t**ên**.

Xwendekar hat. **ø**

Xwendekar hat**in**.

**Di Demên Borî da ji Pêveberê:**

**Mînak:**

Min çivîk dît.**ø**

Min çivîk dît**in**.

Di zaravayê soranî da mêjer; ji cînavkan, ji veqetandekan, ji hejmaran, ji baneşanê, ji qertafên nebinavkirî, ji qertafa naskirî û di demên borî da dema ku pêveber li gor bikerê teşe bigire tê famkirin. (Kurdo, 2021: 61) Lê di zaravayê soranî da, cuda ji kurmancî navdêr bêyî ku rewşa tewangê çêbe, eger pirjimar be, dikare qertafa pirjimarîyê (-an) werbigire û pirjimarîyê nîşan bide. (Xoşnaw, 2021: 36-37).

**Bi Rêya Veqetandekê:**

Yekjimar: -î

Pirjimar: -anî.

**Mînak:**

<b>Kurmancî</b>	سۆرانی
Pirtûka min.	پەرتووکی من. <sup>3</sup>
Pirtûkên min.	پەرتووکهکانی من. <sup>4</sup>

### Bi Rêya Qertafa Nebinavkirî:

Yekjimar: -êk

Mînak:

<b>Kurmancî</b>	سۆرانی
Hevalekî/ê ji min ra got.	هاوریییک به منی گوت. <sup>5</sup>

### Bi Rêya Qertafa Naskirî:

Yekjimar: -eke

Mînak:

<b>Kurmancî</b>	سۆرانی
Ew kerê han revîya.	گودرێژکه هه‌ل هات. <sup>6</sup>

### Di Demên Borî da bi Rêya Pêveberê:

<sup>3</sup> Bi alfabeya latînî: Pertûkî min.

<sup>4</sup> Bi alfabeya latînî: Pertûkekanî min.

<sup>5</sup> Bi alfabeya latînî: Hawrêyêk minî gut.

<sup>6</sup> Bi alfabeya latînî: Gudirêjeke hel hat.

Mînak:

Kurmancî	سۆرانی
Ew çû.	ئهو چوو. <sup>7</sup> ø
Em çûn.	ئیمه چووین. <sup>8</sup>
Wan bir.	ئهوان بردیان <sup>9</sup>

### Bi Rêya Qertafa Pirjimarîyê:

Pirjimar: -an

Mînak:

Kurmancî	سۆرانی
Hevalino werin vê derê.	هاورنیان وهرن بو ئێره. <sup>10</sup>
Ez zarokan tînim ji bo geştê.	من مندالهکان دههینیم بو گهشت. <sup>11</sup>

### Bi Rêya Cînavkan:

Yekjimar: Min, to, ew

Pirjimar: Ême, êwe, ewan

---

<sup>7</sup> Bi alfabeya latînî: Ew çû.ø

<sup>8</sup> Bi alfabeya latînî: Ême çûyn.

<sup>9</sup> Bi alfabeya latînî: Ewan birdyan.

<sup>10</sup> Bi alfabeya latînî: Hawrêyan werin bo êre.

<sup>11</sup> Bi alfabeya latînî: Min midalekan dehênim bo geşt.

Mînak:

Kurmancî	سۆرانی
Tu serkeftî bûyî.	تۆ سه‌رکهوتی بوویت. <sup>12</sup>
Em serkeftî bûn.	ئێمه سه‌رکهوتی بووین. <sup>13</sup>

### 1.3.2.1.3. Zayend

Hinek zimanên dinyayê peyvên wan taybetmendîyên zayendî nîşan didin û zaravayê kurdîya kurmancî jî yek ji wan e. “Zayend taybetmendîyeke ferhengî ye ji bo zimanan û zayenda xwe jî rasterast ji ferhanga wî zimanî werdigire.” (Çetin, 2023: 20) Eger zimanek zayendî be, peyvên wî zimanî bi hinek qertaf û dîyardeyên din zayenda xwe nîşan didin. Sedema ravekirina zayenda peyvên hinekî zehmet e. Ev di pêvajoya geşekirina zimanan da çêdibe û bi temamî nayê zanîn kîjan peyv ji ber çî xwedîyê çî zayend e.

Di kurmancî da zayend di rewşên ravekê da weke veqetandek, di rewşên tewangê da weke qertafên tewangê û di bankêkirinê da gava ku peyv yekjimar bin derdikeve. (Tan, 2015: 102, 206) Di ravekê da ji bo peyvên mêza (-a, -eke), ji bo peyvên nêrza (-ê, -ekî) tên bikaranîn. Di tewangê da ji bo ji bo peyvên mêza (-ê, -ekê), ji bo peyvên nêrza (-î, -ekî) tên bikaranîn. Di bangkirinê da (-o) ji bo mêran, (-ê) ji bo jinan tê bikaranîn.

#### Di Ravekê da:

Şibekeya min.

Pirtûkeke min winda bûye.

Destê te.

---

<sup>12</sup> Bi alfabeya latînî: **To** serkewtî bûyt.

<sup>13</sup> Bi alfabeya latînî: **Ême** serkewtî bûyn.

Destekî wê şewitîye.

**Di Tewangê da:**

Min ji Sosinê ra got.

Delalê ji min ra ew anî.

Hogirî sparteka xwe çêkir.

Hevalekî ez aciz kirim.

Jinikekê ji me ra stran got.

**Di Bangkirinê da:**

Keçê were.

Lawo were.

Ji cînavkên kurmancî yên tewandî yê kesê sêyem yê yekjimar zayenda kesê ku hêjayî gotinê ye dinimîne.

Wî : Ji bo mêr û nêrzayan

Wê : Ji bo jin û mêzayan

Herwiha cînavkên şanîdanî “vî” (ji bo mêran û nêrzayan) û “vê” (ji bo jinan û mêzayan) û cînavka pirsyarîyê “kîjan” (kîjanî ji bo mêr û nêrzayan), “kîjanê” (ji bo jinan û mêzayan) û cînavka nebinavkirî “yekî” (ji bo mêr û nêrzayan), “yekê” (ji bo jin û mêzayan) jî zayendê dinimînin.

Vî ji me ra rastî got.

Vê ji me ra xwarin çêkir.

Kîjanî anî?

Kîjanê bir?

Yekî ev wêne xêz kirîye.

Yekê dew çêkirîye.

Di zaravayê soranî da zayend têk çûye, zayend tenê di rewşa banglêkirinê da maye. Di banklêkirinê da ji bo mêran “-e”, ji bo jinan “-ê” tê bikaranîn (Kurd, 2018: 260, 261). Mînak:

Kurmancî	سۆرانی
Kuro, here malê.	کورە، بێرۆ بو مال. <sup>14</sup>
Keçê hay ji xwe hebe.	کچێ، ئاگات له خۆت بێت. <sup>15</sup>

#### 1.3.2.1.4. Rewş

Rewş weke rêzimanî xwerûbûn û tewandîbûna peyvan nîşan dide. “Hemû zimanên cîhanê ji bo ku peywendîya beşdarên hevokê dest nîşan bike li gor hinek rê û rêbazan tev digere. Ji bo vî tiştî ra di zimanzanîyê da “rewş” tê gotin.” (Yonat, 2019: 95). Rewşa rasterast û tewangê ya navdêr û cînavkan di nav hevokê da weke biker, bireser, raveker, raveber û hwd. û peywendîyên wan yên pêveberê ra dikevin vê beşê.

#### Rewş di Kurmancî da

Di kurmancî da navdêr û cînavk li gor peywîrên xwe û li gor cîhê ku lê ne, dibe ku di rewşa rasterast û tewandî bin. Di kurmancî da cînavk jixwe koma wê ya rasterast (xwerû) heye, navdêr jî eger qertafeke tewangê (-î, -ê, -ekî, -ekê, -an, -inan) negirtibe, jixwe di rewşa rasterast da ye (Tan, 2015: 92-94).

#### Rewşa Rasterast

---

<sup>14</sup> Bi alfabeya latînî: Kure, biro bo mal.

<sup>15</sup> Bi alfabeya latînî: Kiçê, agat le xot bêt.

Di dema niha û bê da biker çî cînavk çî navdêr bin di rewşa rasterast da ne.  
Mînak:

**Em** vê şevê ji vir diçin.

**Pelşîn** karê xwe dike.

**Ez** dê sibe van tiştan ragihînim.

Di demên borî dema ku lêkera pêveber teneper bû, biker çî cînavk çî navdêr bin dikevin rewşa rasterast. Mînak:

**Tu** duh pir westîyayî.

**Pelşîn** duh pir westîya.

### **Rewşa Tewandî**

Di dema niha û bê da bireser çî navdêr çî cînavk bin her dem di rewşa tewandî da ne. Cînavkên kurmancî jixwe koma wê ya tewandî jî heye, navdêr jî bi qertafên tewangê (-î, -ê, -ekî, -ekê, -an, -inan) li gor zayend û hejmar û binavkirî û nebinavkirîyê tîne tewandin. Mînak:

Ez **wan** dibînim.

Em **Pelşînê** dibinînin.

**Pelşîn** dê **me** bixebitîne.

Di demên borî da eger lêkera pêveber teneper bû, biker çî navdêr çî cînavk di rewşa tewandî da ne. Mînak:

**Min** ew dîtin.

**Me** **Pelşîn** dît.

**Pelşînê** em dîtin.

**Hogirî** **Pelşîn** dît.

Piştî daçekan cînavk û navdêr di rewşa tewandî da ne. Mînak:

Ez ji **wan** ra dibêjim.

Min li Sosinê mêze kir.

Sosinê ji cîranan ra got.

Di ravekê da navdêr û cînavk di rewşa tewandî da ne. Mînak:

Lênûska **me**.

Axa kurdan.

Kinca Sosinê.

Pêlava Rûstemî.

### **Rewş di Soranî da**

Di zaravayê soranî da ji bo navdêran ji bilî çend devoka Mukrîyanî rewşa tewangê nemaye, cînavkên zaravayê soranî jî rewşa wan ya rasterast û tewandî weke hev in. Wate em dikarin bibêjin, rewşa tewangê ya cînavkên soranî tunne ye (Pijwe, 2020: 83-84; Kurdo, 2021: 67-73).

### **Rewşa Rasterast ya Soranî**

Dem û têperî û têneperîya lêkerê ferq nake, navdêr û cînavkên soranî di rewşa rasterast da ne. Mînak:

<b>Kurmancî</b>	سۆرانى
Ez diçim.	من دهچم. <sup>16</sup>

---

<sup>16</sup> Bi alfabeya latîni: **Min** deçim.

Perwer nanê xwe dixwe.	پەر وەر نانێ خۆی دمخوات. <sup>17</sup>
Nûpelê karê xwe kir.	نوو پهل کارێ خۆبێ کرد. <sup>18</sup>
Em hevalî dibînin.	ئێمه هاورێکه دهبینین. <sup>19</sup>
Nazdarê ji min ra got.	نازدار به منی گوت. <sup>20</sup>

### Rewşa Tewandî ya Soranî

Weke ku me li jorê jî got, di soranî da ji bilî devokên Mukrîyanî rewşa tewangê ji holê rabûye. Tewandîna vê devoka soranî jî mîna ku kurmancî dike, zayendê dîyar nake. Wate tewandîna devoka Mukrîyanî ne ji hêla zayendê ve ye, tenê ji hêla dîyarkirina hejmarê ve ye (Pijwe, 2020: 83).

Tewandîna biresera dema niha. Mînak:

<b>Kurmancî</b>	سۆرانی
Ew pirtûkê dikirin.	ئەوان پەرتووکی دەکرن. <sup>21</sup>

Tewandîna navdêran piştî daçekan. Mînak:

<b>Kurmancî</b>	سۆرانی
-----------------	--------

<sup>17</sup> Bi alfabeya latînî: **Perwer** nanî xoy dexwat.

<sup>18</sup> Bi alfabeya latînî: **Nûpel** karî xoyî kird.

<sup>19</sup> Bi alfabeya latînî: **Ême** hawrêke debînîn.

<sup>20</sup> Bi alfabeya latînî: **Nazdar** be minî gut.

<sup>21</sup> Bi alfabeya latînî: Ewan pertûkî dekirin.

Tarayê av da Nazdarê.	تارا ئاوی به نازداری دا. <sup>22</sup>
Tara avê dide Hogirî.	تارا ئاوی به هوگری دەدا. <sup>23</sup>

### 1.3.3. Ergatîvî û Akûzatîfî

Ji bo famkirina mijara rêkkeftinê divê mirov cureyên ergatîvî û akûzatîfî baş bizane. Ergatîvî û akûzatîfî kategorîyên rêzimanî ne ku girêdayî ne bi mijarên rêkkeftinê û îşaretkirina biker û berkarê ra. Eger bikera lêkera têneper û bikera lêkera têper weke hev bêne îşaretkirin û rêkkeftin di navbera biker û pêveberê da be, ev rêkkeftin akûzatîf e (Yonat & Aslanoğlu, 2023: 14). Dema em li kurmancî mêze dikin, di kurmancî da akûzatîfî; yek, di demên borî da dema ku lêker têneper bin derdikeve û dudu, di dema niha û bê da û di wan raweyan da derdikeve ku li ser rayekên dema niha yên lêkeran çûbûne. Wate di kurmancî da nîv-akûzatîfî heye, ji ber ku di demên borî da dema ku lêker têper bin dernakeve. Mînak:

Ez diçim.

Ez çûm.

Em dîwaran boyax dikim.

Em ê nan bixwin.

Gava em li mînakan mêze dikin, di dema niha û bê da jî di dema borî da jî biker wekî hev hatine îşaretkirin (xwerû mayîne, tu qertafên tewangê negirtine), rêkkeftinê jî di navbera biker û lêkerên pêveberê da çûbûye. Lewra jî ev cureyê rêkkeftinê akûzatîf e.

---

<sup>22</sup> Bi alfabeya latînî: Tara awî be Nazdarî da.

<sup>23</sup> Bi alfabeya latînî: Tara awî be Hogirî deda.

Ergatîvî berovajî akûzatîf e. Di avanîya ergatîv da bikera lêkera têneper û biresera lêkera têper wekî hev têne îşaretkirin û bikera lêkera têper jî bi awayekî din têne îşaretkirin, rêkkeftin jî di navbera bireser û lêkera pêveber da ye (Tan, 2015: 87; Yonat & Aslanoğlu, 2023: 15). Di kurmancî da rewşa ergatîvî di demên borî da dema ku lêkereke têper weke pêveber tê bikaranîn derdikeve. Ji ber ku tenê di demên borî da da derdikeve, kurmancî nîv-ergatîv e. Di ergatîvîya kurmancî da biker weke tewandî tê îşaretkirin. Eger biker cînavk bin; ji koma tewandî ya cînavkan dibin, eger navdêr bin; li gor mêjer û zayenda xwe qertafên tewangê digirin. Bireser jî di ergatîvîya kurmancî da weke xwerû têne îşaretkirin û tu qertafên tewangê nagirin. Mînak:

Min tu mûjil kirî.

Te ez mûjil kirim.

Zarokan ez westandim.

Sozdarê em mêvan kirin.

Dema em li mînakan mêze dikin, em dibînin ku biker weke tewandî, bireser weke xwerû hatine îşaretkirin. Lêkerên pêveber bi bireseran ra rêkkeftine û cînavkên kesandinê li gor bireseran wergirtine.

## **2. CÎNAVKÊN KESANE Û KESANDINÊ DI ZARAVAYÊN KURMANCÎ Û SORANÎ DA**

Xebata me behsa rêkkeftina hêmanên hevokê di nav hevokê da dike. Ji bo başfamkirina wê divê mirov cînavkên kesane û kesandinê yên herdu zaravayên kurmancî û soranî baş bizane ku fam bike bê ka çi bi çi ra, çawa rêkkeftîye. Ji bo wê jî di vê beşa xwe da em ê behsa cînavkên kesane û kesandinê yên herdû zaravayan û peywirên wan di nav hevokê da bikin.

### **2.1. Kurmancî**

Zaravayê kurmancî zaravayê herî berbelav yê zimanê kurdî ye. Di heman demê da axêverên zaravayê kurmancî beşa herî qelabalix yê zimanê kurdî pêk tînin. Axêverên zaravayê kurmancî li ser hemû parçeyên axa Kurdistanê hene (Berwarî, 2011: 101).

Li Bakur: Mereş, Sêwas, Erzîngan, Meletî, Semsûr, Elazîz, Şirnex, Betlîs, Mûş, Wan, Qers, Erzorom, Erdexen, Îdir, Colemêrg, Êlih, Riha, Amed, Mêrdîn, Dersîm, Çêwlig.

Li Başûr: Duhok, Zaxo, Şengal, Akrê, Berdereş.

Li Rojhilat: Makû, Êrmîye, Şino.

Li Rojava: Qamişlo, Kobanî, Heseke, Efrîn (Besîr û yd., 1994: 5; Ebdulla û yd., 2010: 80).

#### **2.1.1. Cînavkên Kesane yên Kurmancî**

Cînavkên Kesane yên zaravayê kurmancî dibin du kom. Koma yekem cînavkên kesane yên xwerû, koma duyem cînavkên kesane yên tewandî ye.

##### **2.1.1.1. Cînavkên Kesane yên Xwerû**

Cînavkên kesane xwerû yên kurmancî ev in: Ez, tu, ew, em, hûn, ew (Malmîsanij, 2015: 97).

###### **2.1.1.1.1. Peywirên Cînavkên Kesane yên Xwerû**

Cînavkên kesane yên kurmancî yên xwerû, çi têper çi têneper di hemû lêkerên dema niha û bê da û di lêkerên têneper yên demên borî da weke biker (Bedîrxan û

Roger, 2004:171, 174, 175); di lêkerên têper yên demên borî da weke bireser têne bikaranîn (Abdullah, 2021: 37-39) Em ê li jêrê bi mînakan wan xalan nîşan bidin.

- Ev cînavkên kesane yên xwerû di dema niha û bê da dibin biker. Mînak:

**Ez** avê vedixwim.

**Tu** yê avê vexwî.

**Ew** avê vedixwe.

**Em** dê avê vexwin.

**Hûn** avê vedixwin.

**Ew** dê avê vexwin.

Lê divê em vêya bibêjin ku eger ev cînavk di nav ravekê da cîh bigirin û bibin raveker, hingê dem dema niha û bê jî be, cînavk mecbûr ditewin.

Hevala te avê vedixwe.

Hevala te dê avê vexwe.

Çawa em di mînakan da dibînin di nav ravekê da (hevala te) cînavka xwerû “tu” bûye “te”, ji ber ku di nav ravekan da eger cînavka xwerû raveker be, cînavk ditewe.

- Di demên borî da dema ku lêkera pêveber têneper be, cînavkên xwerû dibin biker. Mînak:

**Ez** li te kenîyam.

**Tu** li min kenîyayî.

**Ew** li me kenîya.

**Em** li we kenîyan.

**Hûn** li wî kenîyan.

**Ew** li me kenîyan.

- Cînavkên xwerû di demên borî da weke bireser têne bikaranîn. Mînak:

Te **ez** rûreş kirim.

Mîn **tu** rûreş kirî.

Wê/ wî **em** rûreş kirin.

We **ez** rûreş kirim.

Me **hûn** rûreş kirin.

Wan **ez** rûreş kirim.

### **2.1.1.2. Cînavkên Kesane yên Tewardî**

Cînavkên kesane yên tewardî yên kurmancî ev in: min, te, wî/wê, me, we, wan (Rizgar, 2005: 31).

#### **2.1.1.2.1. Peywirên Cînavkên Kesane yên Tewardî**

Cînavkên tewardî çawa em ê li jêrê li mînakan jî bibînin, di dema niha û bê da weke bireser, di demên borî yên têper da jî weke biker tên bikaranîn. (Sayım, 2017: 9) Weke din jî di nav ravekê da weke raveker û piştî daçekan weke têrker û bireser tên bikaranîn (Baran, 2018: 89).

- Cînavkên tewardî yên kurmancî di dema niha û bê da şûna bireseran digirin.

Mînak:

Ez **we** dişînim.

Tu **me** dişînî.

Ew **me** dişîne.

Em **we** dişînin.

Hûn **min** dişînin.

Ew **wan** dişînin.

- Cînavkên tewandî yên kurmancî di demên borî da eger lêkera pêveber têper be, weke biker têne bikaranîn. Mînak:

**Min** tu şandî.

**Te** ez şandim.

**Wî/wê** ez şandim.

**Me** ew şandin.

**We** ew (kesê sêyem ê yekjimar) şand.

**Wan** tu şandî.

- Cînavkên kesane yên tewandî yên kurmancî di ravekê da weke raveker tên bikaranîn. Mînak:

Mala **min**.

Mala **te**.

Mala **wî/wê**.

Mala **we**.

Mala **me**.

Mala **wan**.

- Ev cînavkên kesane di nav hevokê da piştî daçekan tên. Mînak:

Tu ji **min** ra bibêje.

Ez ji **te** ra bibêjim.

Hûn ji **wî/wê** ra bibêjin.

Tu ji **me** ra bibêje.

Ez ji **we** ra bibêjim.

Ez ji **wan** ra bibêjim.

### 2.1.2. Cînavkên Kesandinê yên Kurmancî

Di pênasekirina cînavkên kesandinê da di nav zimanzanên kurd da hinek nakokî hene. Hinek kes ev weke cînavkên kesandinê, hinek kes weke paşgirên kesandinê, hinek kes weke qertafên cihnavên kesîn pênase kirine. (Baran, 2018: 97) Ji bilî wan, hinek kes jî wan bi lêkera bûnê girê didin. Lê li gor me ew nêrîna ku cînavkên kesandinê tenê bi lêkera bûnê girê didin kêr dimîne. Her çiqas cînavkên kesandinê di dema niha ya hevokên navdêrî da (wate; ew pêveberên ku bi navdêr an jî rengdêrekê çêbûyî) wateya lêkera “bûn”ê bihewînin jî di hevokên navdêrî yên demên borî da û di hemû demên hevokên lêkerî da weke cînavkên kesandinê derdikevin. Di vî warî da Samî Tan mijar wiha rave kirîye: “Lê bi bawerîya min ew her çiqas di nîşandana rewşa mirov û nasandina kesan de anku di hevokên navdêrî de lêkera “bûn”ê di nava xwe da dihewînin jî, ji lêkera “bûn” cudatir in. Ev yek di hevokên lêkerî û demên borî yên hevokên navdêrî de xwe bi awayekî zelal nîşan dide.” (Tan, 2015: 138). Dema ku mirov li mînakên hevokên navdêrî û lêkerî mêze dike, wêya baştir fam dike.

Mînak:

Hevokên navdêrî (dema niha)	Hevokên navdêrî (dema borî)	Hevokên lêkerî (dema niha)
Ez dirêj <b>im</b> .	Ez dirêj bûm.	Ez dadik <b>im</b> .
Tu dirêj <b>î</b> .	Tu dirêj bûyî.	Tu dadik <b>î</b> .
Ew dirêj <b>e</b> .	Ew dirêj bû.	Ew dadik <b>e</b> .
Em dirêj <b>in</b> .	Em dirêj bûn.	Em dadik <b>in</b> .
Hûn dirêj <b>in</b> .	Hûn dirêj bûn.	Hûn dadik <b>in</b> .
Ew dirêj <b>in</b> .	Ew dirêj bûn.	Ew dadik <b>in</b> .

Çawa em di mînakan da jî dibînin, cînavkên kesandinê tenê di dema niha da dema ku hevokeke navdêrî hebe, şûna lêkera “bûn”ê digire, eger heman hevoka navdêrî di demên borî da bin, wê demê lêkera “bûn”ê cuda tê bikaranîn û cînavkên kesandinê cuda derdikevin. Jixwe di hevokên lêkerî da bêyî cudahiya deman cînavkên kesandinê her dem ji rayeka lêkeran cuda derdikevin.

Di zaravayê kurancî da komeke tenê ya cînavkên kesandinê heye. Ew jî ji bo kesandina cînavkên kesane yên xwerû ye. (Sağmıç, 1991: 73-74). Her çî qas di tabloya jêrê da weke du cure cînavkên kesandinê xuya bikin jî ew bi dawîya pêveberê ya bi tîpa dengdêr an jî dengdarê ra têkildar e. Wate eger dawîya pêveberê bi tîpeke dengdar biqede, cînavkên kesandinê yên alîyê çepê tên bikaranîn; eger dawîya pêveberê bi tîpeke dengdêr biqede, wê demê cînavkên kesandinê yên alîyên rastê tên bikaranîn. Mînak:

Ez kurd **im**. Ez Îranî **me**.

Tu kurd **î**. Tu Îranî **yî**.

Ew kurd **e**. Ew Îranî **ye**.

Em kurd **in**. Em Îranî **ne**.

Hûn kurd **in**. Hûn Îranî **ne**.

Ew kurd **in**. Ew Îranî **ne**.

Cînavkên Kesane yên Xwerû	Cînavkên Kesandinê
Ez	-(i)m, me
Tu	-(y)î
Ew	-(y)e
Em	-in, ne
Hûn	-in, ne
Ew	-in, ne

Nîşe: Ji bo kesê yekem yê pirjimar (em) di hin devokên kurmancî da li şûna “-in”ê “-în” tê bikaranîn (Xoşnaw, 2015: 62). Mînak:

Em biçîn heval bimînin

“Mîm û Hê” bîra xwe bînin

Fatîhan jê ra bixwînin

Hewce û der întîzar e (Teyran, 2020: 236)

Nîşe: Ji bo kesê sêyem yê yekjimar (ew) di hin devokên kurmancî da “-ît” an jî “it,” tèn bikaranîn (Xoşnaw, 2015: 62). Mînak:

Zuhrê bibihêt newayê ‘uşşaq

Reqassi bibit li ewcê neh taq

Sazê dilê kul bi zîr û bem bit

Sazendeyê ‘eşqê Zîn û Mem bit (Xanî, 2022: 50)

### 2.1.2.1. Peywirên Cînavkên Kesandinê yên Zaravayê Kurmancî

Cînavkên kesandinê yên zaravayê kurmancî di dema niha û bê û demên borî da dema ku lêker têneper bin, bikerê dinimînin; di demên borî da dema ku lêker têper bin, bireserê dinimînin. (Tan, 2015: 131-141) Li jêrê tevî mînakan me mijar rave kirîye.

- Di dema niha û bê da di dawîya pêveberê da bikerê ji hêla kes û jimare ve pêşwazî dike. Mînak:

Ez derî vedikim.

Tu yê derî vekî.

Ew derî vedike.

Em dê derî vekin.

Hûn derî vedikin.

Ew dê derî vekin.

- Di demên borî da eger lêkera pêveber teneper bû, diçe dawîya pêveberê û bikerê ji hêla kes û jimare ve pêşwazî dike. Mînak:

Ez çûm.

Tu çuyî.

Ew çû.

Em çûn.

Hûn çûn.

Ew çûn.

Lê weke di mînaka kesê sêyem yê yekjimar da jî xuya dibe, di demên borî yê kurmancî da ji bo kesê sêyem yê yekjimar tu cînavka kesandinê tunne ye (Baran, 2018: 86).

- Di demên borî da eger lêkera pêveber teneper be, diçe dawîya pêveberê û bireserê ji hêla kes û jimare ve pêşwazî dike. Mînak:

Min tu şewitandî.

Te ez şewitandim.

Wî/wê ez şewitandim.

Me tu şewitandî.

We em şewitandim.

Wan ez şewitandim.

Di zaravayê Kurmancî da ji bo cînavkên kesane yê tewandî tu cînavkên kesandinê tune ne.

<b>Cînavkên Kesane yê Tewandî</b>	<b>Cînavkên Kesandinê</b>
Min	-
Te	-
Wî/wê	-
We	-
Me	-
Wan	-

Weku di tabloyê da jî tê dîtin ji bo cînavkên kesane yê tewandî tu cînavkên kesandinê tune ne. Ji ber ku dema ku ew dibin bikera hevokan, hingê lêkera pêveber gerguhêz, dem jî demeke borî ye. Di demên borî yê kurmancî da jî eger lêkera pêveber têper bû, li gor bikerê na, li gor bireserê cînavkên kesandinê werdigire.

## **2.2. Soranî**

Soranî ku jê ra kurmancîya başûr, kurdîya nawendî û kurmancîya xwarû jî tê gotin piştî kurmancî, duyem mezintirîn zaravayê kurdî ye ji hêla hejmara axêveran ve (Badî, 2018: 48, 49; Berwarî, 2011: 101; Mistefa, 1971: 25). Beşeke zaf ya kurdên Iraq û Îranê bi vî zaravayî diaxivin. Ev bajarên ku zaravayê soranî dixavin ev in:

Li Başûr: Silêmanî, Hewlêr, Kerkûk, Berdereş

Li Rojhilat: Şino, Mihabad, Sine, Seqez, Bane, Erdelan, Serdeşt (Sabir û Shadan, 2020: 531; Xoşnaw, 2016: 77-78).

### **2.2.1. Cînavkên Kesane di Zaravayê Soranî da**

Di zaravayê soranî da berovajî kurmancî komeke tenê ya cînavkên kesane heye. Ew jî ev in: Min, to, ew, ême, êwe, ewan (Dizeyî, 2015: 71, 72).

#### **2.2.1.1. Peywirên Cînavkên Kesane yê Soranî**

Weke em ê li jêrê jî amaje bi wan bikin, cînavkên kesane yê soranî di hemû deman da dikarin bibin biker jî dikarin bibin bireser jî (Dizeyî, 2014: 201-202), ji ber ku weku kurmancî weke xwerû û tewandî du komên cuda yê cînavkên kesane yê soranî tune ne.

- Di nav hevokê da lêker têper-têneper an jî dem ferq nake, cîhê navan digirin û weke biker têne bikaranîn. Mînak:

Kurmancî	سۆرانی
Ez diçim.	من دهچم. <sup>24</sup>
Wî/wê ez neanîm.	ئهی منی نههینا. <sup>25</sup>
Em wan diwestînin.	ئیمه ئهوان ماندوو دهکهن. <sup>26</sup>
Me ew westandin.	ئیمه ئهوانمان ماندوو کرد. <sup>27</sup>

- Dem û têperî-têneperîya lêkera pêveber ferq nake, di nav hevokê da dibe ku weke bireser bêne bikaranîn. Mînak:

Kurmancî	سۆرانی
Heval te dibînin.	هاورنیان تو دهبینن. <sup>28</sup>
Kûçik me ditirsîne.	سهگهکه ئیمه دهر سینیت. <sup>29</sup>
Baranê em şil kirin.	بارانهکه ئیمه ی تهر کرد. <sup>30</sup>

<sup>24</sup> Bi alfabeya latînî: **Min** deçim.

<sup>25</sup> Bi alfabeya latînî: **Ew** minî nehêna.

<sup>26</sup> Bi alfabeya latînî: **Ême** ewan mandû deken.

<sup>27</sup> Bi alfabeya latînî: **Ême** ewanman mandû kird.

<sup>28</sup> Bi alfabeya latînî: Hawrêyan **to** debînin.

<sup>29</sup> Bi alfabeya latînî: Segeke **ême** detirsînêt.

<sup>30</sup> Bi alfabeya latînî: Baraneke **êmey** ter kird.

### 2.2.2. Cînavkên Kesandinê yê Soranî

Di zaravayê soranî da du komên cuda yê cînavkên kesandinê hene. Her çiqas hin kesan ew bi ser sê koman ve dabeş kiribin jî li gor me weke du kom bêne dabeşkirin baştir dibe. Ji ber ku dabeşkirina koma sêyem tenê ji ber cudahiya cînavkên kesandinê yê kesê sêyem yê yekjimar (-î, -êt -at -e) ya soranî ye û li gor me hewce nake ji ber cudayîke biçûk weke ku komeke cuda hebûbe bê nîşandan. Em ê cînavkên kesandinê yê soranî weke koma bihêz û bêhêz pênase bikin, ji ber ku cînavkên kesandinê yê koma yekem (bihêz) li gor yê koma duyem (bêhêz) çalaktir in. Em ê li jêrê bi hûrgilî amaje bi bihêzbûn û bêhêzbûna wan bikin.

#### 2.2.2.1. Cînavkên Kesandinê yê Bihêz

Cînavkên Kesane	Cînavkên Kesandinê yê Koma Bihêz
Min	-(i)m
To	-it
Ew	-î, y
Ême	-man
Êwe	-tan
Ewan	-yan

(Resûl, 2006: 174)

Di kesê sêyem yê yekjimar ya soranî da di koma cînavkên kesandinê yê bihêz da du cînavkên cuda xuya dikin (-î, y) lê ew di eslê xwe da weke hev in, hatina wan tenê li gor dengdêrbûna an jî dengdarbûna tîpa dawî ya peyvan ra têkildar e.

<sup>31</sup> Bi alfabeya latînî: Hewaleke toy tûre kird.

### 2.2.2.1.1. Peywirên Cînavkên Kesandinê yên Koma Bihêz

Cînavkên kesandinê yên soranî yên bihêz weku em ê li jêrê jî bi mînak amaje pê bikin; dibe ku di nav hevokê da bikerê yan jî bireserê ji hêla kes û mêjerê ve nîşan bidin, dibe ku di nav ravekê da ravekerê nîşan bidin û bi raveberê bizeliqin, dibe ku tevî cînavka vegerok bêne bikaranîn, dibe ku tevî hejmaran bêne bikaranîn, dibe ku tevî cînavka nîşane û pirsyarîyê bêne bikaranîn (Şalî û yd., 2019: 39-56; Marif, 2014: 230-233).

➤ Di dema niha da ji bo nimandina bireserê tên bikaranîn. Mînak:

Kurmancî	سۆرانی
Ez wan dixwim.	دهیانخۆم. (من ئەوان دەخۆم) <sup>32</sup>
Ew me tînin.	دهمانهینن. (ئەوان ئێمه دههینن) <sup>33</sup>
Ew me nexweş dike.	ئەو نهخۆشمان دهکات. (ئەو ئێمه نهخۆش دهکات) <sup>34</sup>

➤ Di ravekê da diçe dawîya raveberê û pê dizeliqe. Mînak:

Kurmancî	سۆرانی
Mala min.	مالم. (مالی من) <sup>35</sup>
Mala te.	مالت. (مالی تو) <sup>36</sup>

<sup>32</sup> Bi alfabeya latîni: Deyanxom. (Min ewan dexom)

<sup>33</sup> Bi alfabeya latîni: Demanhênin. (Ewan ême dehênin)

<sup>34</sup> Bi alfabeya latîni: Ew nexošman dekat. (Ew ême nexoš dekat)

<sup>35</sup> Bi alfabeya latîni: Malim. (Malî min)

<sup>36</sup> Bi alfabeya latîni: Malit. (Malî to)

Mala wî/wê.	مالی. (مالی ئهو) <sup>37</sup>
Mala me.	مالمان (مالی ئیمه). <sup>38</sup>
Mala we.	مالتان (مالی ئیوه). <sup>39</sup>
Mala wan.	مالیان (مالی ئهوان). <sup>40</sup>

➤ Tevî cînavka vegerok tên bikaranîn. Mînak:

Kurmancî	سۆرانی
Min/ez bi xwe.	خۆم. <sup>41</sup>
Te/tu bi xwe.	خۆت. <sup>42</sup>
Wî-wê/ew bi xwe.	خۆی. <sup>43</sup>
Me/em bi xwe.	خۆمان. <sup>44</sup>
We/hûn bi xwe.	خۆتان. <sup>45</sup>

<sup>37</sup> Bi alfabeya latînî: Malî. (Malî ew)

<sup>38</sup> Bi alfabeya latînî: Malman. (Malî ême)

<sup>39</sup> Bi alfabeya latînî: Maltan. (Malî êwe)

<sup>40</sup> Bi alfabeya latînî: Malyan. (Malî ewan)

<sup>41</sup> Bi alfabeya latînî: Xom.

<sup>42</sup> Bi alfabeya latînî: Xot.

<sup>43</sup> Bi alfabeya latînî: Xoy.

<sup>44</sup> Bi alfabeya latînî: Xoman.

<sup>45</sup> Bi alfabeya latînî: Xotan.

Wan/ew bi xwe.	خۆیان. <sup>46</sup>
----------------	----------------------

➤ Tevî hejmaran tèn nivîsîn. Mînak:

Kurmancî	سۆرانی
Yek ji wan.	یه‌کێکیان. (یه‌کێک له ئەوان) <sup>47</sup>
Hezar ji we.	ههزارتان. (ههزار له ئێوه) <sup>48</sup>

➤ Bi cînavkên nîşane ra tèn bikaranîn. Mînak:

Kurmancî	سۆرانی
Vê ji me ra bîne.	ئەمەمان بۆ بهێنه. (ئەمە بۆ ئێمه بهێنه.) <sup>49</sup>
Wê ji bo wan bike.	ئەوهیان بۆ بکه. (ئەوه بۆ ئەوان بکه.) <sup>50</sup>
Ez vê ji bo te bibînim	ئەمەت بۆ بدۆزیمهوه. (من ئەمە بۆ تۆ بدۆزیمهوه.) <sup>51</sup>

➤ Di gel cînavkên pirsyarîyê tèn bikaranîn. Mînak:

---

<sup>46</sup> Bi alfabeya latîni: **Xoyan**.

<sup>47</sup> Bi alfabeya latîni: **Yêkêkyan** (Yekêk le ewan)

<sup>48</sup> Bi alfabeya latîni: **Hezartan** (Hezar le êwe)

<sup>49</sup> Bi alfabeya latîni: **Ememan** bo bihêne. (Eme bo ême bihêne)

<sup>50</sup> Bi alfabeya latîni: **Eweyan** bo bike. (Ewe bo ewan bike)

<sup>51</sup> Bi alfabeya latîni: **Emet** bo bidozîmewe. (Min eme bo to bidozîmewe)

Kurmancî	سۆرانى
Kîjan ji we.	كامتان. (كام له ئێوه) <sup>52</sup>
Çend ji we.	چهندتان. (چهند له ئێوه) <sup>53</sup>

➤ Tevî cînavka nebinavkirî “hîç”ê tèn bikaranîn. Mînak:

Kurmancî	سۆرانى
Tu tişteki min nîye.	هیچم نیه. <sup>54</sup>
Tu tişteki te tuneye.	هیچت نیه. <sup>55</sup>
Tu tişteki wî/wê tuneye.	هیچی نیه. <sup>56</sup>
Tu tişteki me tuneye.	هیچمان نیه. <sup>57</sup>
Tu tişteki we tuneye.	هیچتان نیه. <sup>58</sup>
Tu tişteki wan tuneye.	هیچیان نیه. <sup>59</sup>

<sup>52</sup> Bi alfabeya latîni: Kamtan (Kam le êwe)

<sup>53</sup> Bi alfabeya latîni: Çendtan (Çend le êwe)

<sup>54</sup> Bi alfabeya latîni: Hîçim nîye.

<sup>55</sup> Bi alfabeya latîni: Hîçit nîye.

<sup>56</sup> Bi alfabeya latîni: Hîçî nîye.

<sup>57</sup> Bi alfabeya latîni: Hîçman nîye.

<sup>58</sup> Bi alfabeya latîni: Hîçtan nîye.

<sup>59</sup> Bi alfabeya latîni: Hîçyan nîye.

- Di demên borî da bikerê dinimînin. Mînak:

Kurmancî	سۆرانی
Min xwar.	من خواردم. <sup>60</sup>
Te xwar.	تۆ خواردت. <sup>61</sup>
Wî/wê xwar.	ئهو خواردی. <sup>62</sup>
Me xwar.	ئیمه خواردمان. <sup>63</sup>
We xwar.	ئێوه خواردتان. <sup>64</sup>
Wan xwar.	ئهووان خواردیان. <sup>65</sup>

- Di hevokên demên borî ku tenê ji pêveberekê pêk hatî da dibe ku bireserê an jî bikerê binimînin, herwiha dibe ku hem bireserê hem jî bikerê binimînin.

Dibe ku bikerê binimînin. Mînak:

Kurmancî	سۆرانی
Wan em birin.	بردیانین. (ئهووان ئیمهیان برد) <sup>66</sup>

<sup>60</sup> Bi alfabeya latîni: Min xward**im**.

<sup>61</sup> Bi alfabeya latîni: To xward**it**.

<sup>62</sup> Bi alfabeya latîni: Ew xward**î**.

<sup>63</sup> Bi alfabeya latîni: Ême xward**man**.

<sup>64</sup> Bi alfabeya latîni: Êwe xward**tan**.

<sup>65</sup> Bi alfabeya latîni: Ewan xward**yan**.

<sup>66</sup> Bi alfabeya latîni: Birdy**an**în. (Ewan êmeyan bird)

Wan em birin.	بردینیان. (ئەوان ئیمەیان برد) <sup>67</sup>
---------------	---

Weku di mînakan da jî tê dîtin cînavka kesandinê ya bihêz dibe ku li pêş yan jî li paş cînavka kesandinê ya bêhêz be, lê her dem bikerê pêşwazî dike.

Dibe ku hem bireserê hem jî bikerê binimînin. Mînak:

<b>Kurmancî</b>	<b>سۆرانی</b>
Wan em birin.	بردمانیان. (ئەوان ئیمەیان برد) <sup>68</sup>
We ew birin.	بردیانتان. (ئێوه ئەوانتان برد) <sup>69</sup>

Di van mînakan da cînavkên bihêz yên ku li pêş hatine bireserê, yên ku di dawîyê da hatine bikerê ji hêla kes û jimare ve temsîl dike.

#### 2.2.2.2. Cînavkên Kesandinê yên Koma Bêhêz

Cînavkên Kesane	Cînavkên Kesandinê yên Koma Bêhêz
Mîn	-im
To	-ît, -yt
Ew	-êt, -at, -e
Ême	-în, -yn
Êwe	-in
Ewan	-in

(Şalî û yd., 2019: 41).

<sup>67</sup> Bi alfabeya latînî: Birdînyan. (Ewan êmeyan bird)

<sup>68</sup> Bi alfabeya latînî: Birdmanyân. (Ewan êmeyan bird)

<sup>69</sup> Bi alfabeya latînî: Birdyantân. (Êwe ewantan bird)

Di tabloyê da ji bo beramberî cînavka kesê sêyem yê yekjimar (ew) weke cînavka kesandinê ya bêhêz sê hebên cuda (-êt, at, e) xuya dikin, ew jî bi bikaranîna hin lêkeran ra têkildar e. Di hin lêkerên soranî yên weke xwardin, birdin, şuştin, kirdin û hwd. da ku rayeka wan ya dema niha bi dengdêrekî (e, o) diqide di dema niha da cînavka kesandinê ya kesê sêyem yê yekjimar dibe “-at” (Emîn, 2014: 103). Mînak:

Kurmancî	سۆرانی
Ew dixwe.	ئەو دەخوات. <sup>70</sup> (Lêker xwardin, rayeka dema niha “xo” ye)
Ew dişo.	ئەو دەشووات. <sup>71</sup> (Lêker şuştin, rayeka dema niha “šo” ye)
Ew dike.	ئەو دەکات. <sup>72</sup> (Lêker kirdin, rayeka dema niha “ke” ye)
Ew dibe.	ئەو دەبات. <sup>73</sup> (Lêker birdin, rayeka dema niha “be” ye)

Divê em vê jî li gotinên xwe zêde bikin ku di vê rewşa dema niha da ku ji bo kesê sêyem yê yekjimar “at” tê bikaranîn, dema ku “at” tê dawîya tîpa wan ya dengdêr (o, e) yan jî kokê têne avêtin, yan jî li şûna wan “w” tê bikaranîn.

<sup>70</sup> Bi alfabeya latînî: Ew dexwat.

<sup>71</sup> Bi alfabeya latînî: Ew deşwat.

<sup>72</sup> Bi alfabeya latînî: Ew dekat.

<sup>73</sup> Bi alfabeya latînî: Ew debat.

Lê eger rayeka dema niha ya lêkerekê bi dengdarekê biqede, hingê ji bo kesê sêyem yê yekjimar weke cînavka kesandinê “-êt” tê bikaranîn. Mînak:

Kurmancî	سۆرانی
Ew diçe.	ئەو دەچیت. <sup>74</sup>
Ew dimîne.	ئەو دەمیییت. <sup>75</sup>

Weke din jî di dema niha da di wan hevokên navdêrî da ku bi alîkarîya lêkera “bûn”ê çûbûne û rewşê nîşan didin, ji bo kesê sêyem yê yekjimar cînavka kesandinê weke “-(y)e” tê bikaranîn. Mînak:

Kurmancî	سۆرانی
Ew kurd e.	ئەو کوردە. <sup>76</sup>
Ew nexweş e.	ئەو نەخۆشە. <sup>77</sup>

Xaleke din ya girîng ku divê em ji bo kesê sêyem yê yekjimar ya soranî bibêjin ew e ku weke kurmancî di soranî da jî “di demên borî da eger pêveber têneper be, kesê sêyem yê yekjimar di forma sifir da (ø) derdikeve.” (Birzu, 2017: 86). Mînak:

Kurmancî	سۆرانی
Ew şewitî.	ئەو سوتتا. <sup>78</sup> ø

<sup>74</sup> Bi alfabeya latînî: Ew deçêt.

<sup>75</sup> Bi alfabeya latînî: Ew demînet.

<sup>76</sup> Bi alfabeya latînî: Ew kurd e.

<sup>77</sup> Bi alfabeya latînî: Ew nexoš e.

<sup>78</sup> Bi alfabeya latînî: Ew sûtta.ø

Ew westîya.	ئەو ماندوو بوو. <sup>79</sup>
-------------	-------------------------------

Digel ku ji bo kesê duyem yê yekjimar (to) û kesê yekem yê pirjimar (ême) di beşa koma bêhêz da du heb cînavkên kesandinê (-ît, -yt), (în, yn) xuya dikin jî ew li gor dendêrbûn an jî dengdarbûna dawîya pêveberê ve diguhêrin. Dema ku pêveber bi dengdar biqede, “-ît” û “-în” tê bikaranîn; dema ku pêveber bi tîpeke dengdêr biqede, “-yt” “-yn” tê bikaranîn. Mînak:

Kurmancî	سۆرانى
Em kurd in.	ئێمه کوردین. <sup>80</sup>
Em dixwin.	ئێمه دەخوین. <sup>81</sup>
Tu nexweş î.	تۆ نهخوشت. <sup>82</sup>
Tu dibînî.	تۆ دهخویت. <sup>83</sup>

#### 2.2.2.2.1. Peywirên Cînavkên Kesandinê yên Koma Bêhêz

Cînavkên kesandinê yên bêhêz yên soranî weke em ê li jêrê bi mînakan nîşan bidin; di dema niha û bê da û di dema borîya teneper da ji bo nimandina bikerê ji hêla kes û mêjerê ve tê bikaranîn, di demên borî da di hevokên têper yên ku tenê ji pêveberekê pêk hatî da jî ji bo ku bireserê ji hêla kes û mêjerê ve binimîne tînan bikaranîn (Pijwe, 2020: 128-133; Dizeyî, 2015: 107; Marif, 2014: 232).

<sup>79</sup> Bi alfabeya latînî: Ew mandû bu.ø

<sup>80</sup> Bi alfabeya latînî: Ême kurd in.

<sup>81</sup> Bi alfabeya latînî: Ême dexoyin.

<sup>82</sup> To nexoşt.

<sup>83</sup> To dexoyt.

- Di dema niha û bê da lêkera pêveber têper jî be teneper jî be ferq nake, bikeran dinimîne. Mînak:

Kurmancî	سۆرانی
Ez diçim.	من دهروم. <sup>84</sup>
Tu pirtûkan tînî?	تو پەرتوکهکان دههینیت؟ <sup>85</sup>
Ew diçe.	ئەو دهچیت. <sup>86</sup>
Em kurd in.	ئێمه کوردین. <sup>87</sup>
Hûn min dibînin.	ئێوه من دهبین. <sup>88</sup>
Ew karê xwe dikin.	ئەوان کاری خۆیان دهکەن. <sup>89</sup>

- Di demên borî da gava ku lêkera pêveber teneper bû, bikera hevokê ji hêla kes û jimare ve dinimîne. Mînak:

Kurmancî	سۆرانی
Ez çûm.	من چووم. <sup>90</sup>

<sup>84</sup> Bi alfabeya latînî: Min derom.

<sup>85</sup> Bi alfabeya latînî: To pertûkekan dehênît?

<sup>86</sup> Bi alfabeya latînî: Ew deçêt.

<sup>87</sup> Bi alfabeya latînî: Ême kurd îin.

<sup>88</sup> Bi alfabeya latînî: Êwe min debîinin.

<sup>89</sup> Bi alfabeya latînî: Ewan karî xoyan deken.

<sup>90</sup> Bi alfabeya latînî: Min çûm.

Tu çûyî.	تۆ چوویت. <sup>91</sup>
Ew çû.	ئەو چوو. <sup>92</sup>
Em çûn.	ئێمه چووین. <sup>93</sup>
Hûn çûn.	ئێوه چوون. <sup>94</sup>
Ew çûn.	ئەوان چوون. <sup>95</sup>

- Di demên borî da dema ku lêkera pêveber têper bû û hevok tenê ji pêveberekê pêk hat, eger bireser hebe, bireserê dinimîne.

Ji bo ku bireserê binimîne dibe ku di dawîya pêveberê da be. Mînak:

Kurmancî	سۆرانی
Min tu şandî.	ناردمیت. (من تۆم نارد) <sup>96</sup>
Te ez şandim.	ناردتم. (تۆ منت نارد) <sup>97</sup>
Wî/wê ez şandim.	ناردیم. (ئەو منی نارد) <sup>98</sup>

<sup>91</sup> Bi alfabeya latînî: To çûyt.

<sup>92</sup> Bi alfabeya latînî: Ew çû.ø

<sup>93</sup> Bi alfabeya latînî: Ême çûyn.

<sup>94</sup> Bi alfabeya latînî: Êwe çûn.

<sup>95</sup> Bi alfabeya latînî: Ewan çûn.

<sup>96</sup> Bi alfabeya latînî: Nardimît. (Min tom nard)

<sup>97</sup> Bi alfabeya latînî: Narditim. (To minit nard)

<sup>98</sup> Bi alfabeya latînî: Nardîim. (Ew minî nard)

Me hûn şandin.	ناردمانن. (ئیمه ئیوهمان نارد) <sup>99</sup>
We em şandin.	ناردتانن. (ئیهه ئیمهتان نارد) <sup>100</sup>
Wan ez şandim.	ناردیانم. (ئهوان منیان نارد) <sup>101</sup>

Ji bo ku bireserê binimîne dibe ku berî cînavka kesandinê ku bikerê dinimîne were.

Mînak:

Kurmancî	سۆرانی
Min tu şandî.	ناردیتم. (من تۆم نارد) <sup>102</sup>
Te ez şandim.	ناردمت. (تۆ منت نارد) <sup>103</sup>
Wî/wê ez şandim.	ناردمی. (ئهو منی نارد) <sup>104</sup>
Me hûn şandin.	ناردنمان. (ئیمه ئیوهمان نارد) <sup>105</sup>
We em şandin.	ناردنتان. (ئیهه ئیمهتان نارد) <sup>106</sup>

<sup>99</sup> Bi alfabeya latîni: Nardman**in**. (Ême êweman nard)

<sup>100</sup> Bi alfabeya latîni: Nardt**an**in. (Êwe êmetan nard)

<sup>101</sup> Bi alfabeya latîni: Nardyan**im**. (Ewan minyan nard)

<sup>102</sup> Bi alfabeya latîni: Nard**i**tim. (Min tom nard)

<sup>103</sup> Bi alfabeya latîni: Nard**im**it. (To minit nard)

<sup>104</sup> Bi alfabeya latîni: Nard**im**î. (Ew minî nard)

<sup>105</sup> Bi alfabeya latîni: Nard**in**man. (Ême êweman nard)

<sup>106</sup> Bi alfabeya latîni: Nard**in**tan. (Êwe êmetan nard)

Wan ez şandim.

ناردیمیان. (ئەوان منیان نارد)<sup>107</sup>

Ji mînakan jî em dibînin ku cînavkên kesandinê yên bêhêz dibe ku werin dawîya pêvberê yan jî berî cînavka bihêz werin, lê bi her awayî be, di demên borî da di wan hevokên ku tenê ji lêkereke têper pêk hatî da, her dem biresera hevokan dinimînin.



---

<sup>107</sup> Bi alfabeya latîni: Nardimyan. (Ewan minyan nard)

### 3. CUREYÊN RÊKKEFTINÊN KURMANCÎ Û SORANÎ

#### 3.1. Cureyên Rêkkeftinên Kurmancî

##### 3.1.1. Rêkkeftina Kurmancî di Dema Niha da

Dema niha, kar û rewş û rûdanan vedibêje ku di dema anha da çêdibin. Di zaravayê kurmancî da dema niha bi xêra qertafa dema niha “di-” yê çêdibe. Herwiha rayeka dema niha ya lêkeran û cînavkên kesandinê jî lê zêde dibin û bi vî awayî dema niha çêdibe (Baran, 2018: 150-151).

Wexta ku em ji hêla rêkkeftinên hêmanên hevokê ve lê mêze dikin, em dibînin ku di dema niha ya zaravayê kurmancî da her dem biker bi pêveberê ra rêkdikeve. Ev qayîde hem ji bo lêkerên têper, hem jî lêkerên têneper di nava xwe da dihevine. Mînak:

##### **Bi Lêkerên Têper**

**Lêker: Dîtin**

Ez te dibînim.

Tu min dibînî.

Ew min dibîne.

Hûn me dibînin.

Ew (an) te dibînin.

Ev mînakên ku bi lêkerekê têper “dîtin”ê çêbûne ji me ra nîşan didin ku di dema niha da lêkera pêveber bi bikerên hevokan ra rêkkeftine û cînavên wan yên kesandinê wergirtine. Ji bo ku baş bê famkirin, me di mînakan da cînavkên kesandinê yên ku hatine dawîya pêveberan reşawî kirine. Ew cînavkên kesandinê ji ber bikeran çûne dawîya pêveberan.

##### **Bi Lêkerên Têneper**

**Lêker: Ketin**

Ez dikevim avê.

Tu dikevî avê

Ew dikeve avê.

Em dikevin avê.

Hûn dikevin avê.

Ew(an) dikevin avê.

Ji mînakan jî tê famkirin ku rêkkeftina kurmancî di dema niha da wexta ku pêvebera hevokê teneper jî be, naguhêre û dîsa biker û pêveber rêkdikevin û pêveber cînavkên kesandinê yên bikerên hevokan werdigirin.

Ev cureyê rêkkeftina kurmancî di dema niha da lêker pêkhatî û biwêjî jî bin, naguhêre, dîsa rêkkeftin di navbera biker û pêveberê da çêdibe.

Ew daran hildikin.

Tu kê radikî.

Ew pirtûkên xwe bi cih dike.

Zarok dîyarîyên xwe vedikin.

Em wan ji xwe bi dûr dixin.

### **3.1.1.2. Çend Îstîsna di Dema Niha ya Kurmancî da**

Dema niha ya kurmancî wê encamê derdixe ku bikerên wan bi pêveberên wan ra rêkdikevin. Weke tê zanîn di kurmancî da du cure cînavkên kesane hene û di dema niha ya kurmancî da bikerên hevokan ji beşa xwerû ya cînavkan dibin (eger biker cînavk nebe jî peyv qertafên tewangê nagire û xwerû dimîne), bireserên wan ji beşa cînavkan ya tewandî dibin (bireser cînavk ne, peyveke din jî be, dîsa qertafên tewangê digire) û pêveber li gor bikerê tê kişandin, wate cînavkên wê yên kesandinê û hejmarî digirin (Bedîrxan, 2006: 52, 89). Ji bo vê yekê di zimanzanîyê da akûzatîfî tê gotin. akûzatîfî du alîyên wê hene, hem rêkkeftina biker û pêveberê dinimîne hem jî dîyarkirina bireserê di hevokekê da dinimîne (Lezgîn, 2015: 84,85)

Kurdîya kurmancî di vî warî da di demên niha û bê da tam; di demên borî da nîv-akûzatif xuya dike. Bes di devoka başûrê rojhilat ya kurmancî da di lêkerên wekî “vîyan”, “hebûn” û hin pêveberên “tecrûbekar” da rewşên derasayîya yên dema niha ya kurmancî derdikevin (Yonat, 2022: 254-257).

Herwiha di wan hevokên navdêrî da ku bi kopulayê çêbûne û hêmana wan ya pêveberê ya yekem ji cînavkên kesane yên kesê yekem yê yekjimar “ez” û kesê duyem yê yekjimar “tu” çêbûyî, rewşên derasayî ya rêkkeftina dema niha ya kurmancî derdikeve.

### 3.1.1.2.1. Lêkera Vîyan

Rayeka dema niha ya vê lêkera vîyanê “vê” ye, dîsa qertafa dema niha “di-” tê ber rayeka lêkerê lê dema ku ev lêker di dema niha ya kurmancî da weke pêveber tê bikaranîn, pêveber (vîyan) weke lêkerên têper yên dema borî ya kurmancî, weke ergatîv tev digere û pêveber bi bikerê ra na, bi bireserê ra rêkdikeve. Herwiha dîsa weke qayîdeyên dema borî yên kurmancî yên ergatîvî biker ditewe û bireser xwerû dimîne. (Bedîrxan, 1991: 27; Bozkurt, 2008: 228-229).

<b>Kurmancîya Standart</b>	<b>Kurmancîya Başûrê Rojhilat</b>
Ew ji te hez dike.	Wî/wê tu divêyî.
Tu wan dixwazî.	Te ew divên.
Ez alîkarîyê dixwazim.	Min alîkarî divê.Ø
Ez zivistanê naxwazim.	Min zivistan nevê.Ø

Gava mirov li mînakên kurmancîya başûrê rojhilat ya kurmancî mêze dike, dibîne ku digel ku dem dema niha ye, berovajî qayîdeyên dema niha biker tewîyane, bireser xwerû mayîne. Dîsa mirov dibîne ku pêveber bi bireseran ra rêkkeftine û li gor biresera hevokan cînavkên kesandinê wergirtine. Di mînaka yekem da bireser “tu” ye û lewma jî pêveberê li gor wê cînavka kesandinê “-yî” wergirtîye, di mînaka duyem da bireser “ew” e û lewra jî pêveber cînavka kesandinê ya kesê sêyem yê pirjimarîyê (-n) wergirtîye, di mînakên sêyem û çarem da jî ji ber ku bireser amaje bi tiştê sêyem yê yekjimar dikin (alîkarî, zivistan) lewra jî pêveberan tu cînavkên kesandinê wernegirtîye û di rewşa sifir da mayîne. Jixwe ne pêkan e ku pêveber bi bikeran ra

rêkbikevin, ji ber ku di mînakên devoka kurmancî ya başûrê rojhilat da em dibînin, biker tewîyane û herwekî tê zanîn ji bo bikerên tewandî tu cînavkên kesandinê tunnene.

### **3.1.1.2.2. Bikaranîna Lêkera Hebûnê di Wateya Xwedîtîyê da**

Lêkera hebûnê du wateya wê heye; yek wucûd-bûna kesekî-tiştêkî li cîhekî ye, ya din jî xwedîtî ye. (Xoşnaw, 2015: 54) Di devoka kurmancî ya başûrê rojhilat da ji bo bikaranîna lêkera hebûnê cudahîyek heye. Di vê devokê da gava ku lêkera hebûnê di wateya xwedîtîyê da tê bikaranîn, qayîdeya dema niha ya kurmancî berovajî dibe.

Mînak:

#### **Kurmancî Standart**

Du pêûsên min hene.

Miheke te heye.

Pênc mihên te hene.

#### **Kurmancî Başûrê Rojhilat**

Min du pêûs hene.

Te mihek heye.

Te pênc mih hene.

Dema em li mînakên devoka kurmancîya başûrê rojhilat mêze dikin, em dibînin di dema niha da ji bo lêkera hebûnê derasayîyek xuya dike. Digel ku dem dema niha ye, biker berovajî akûzatîfa dema niha tewîyane û pêveber jî bi bikerê ra na, bi bireserên xwe ra rêkkeftine û li gor mêjera wan teşe girtine. Di mînakên kurmancîya standart da jî cînavkên tewandî xuya dikin, lê ew ji ber ravekê tewîyane, weke ku tê zanîn di ravakê da raveker ditewin. Di mînakên devoka kurmancîya başûrê rojhilat da ravek xira bûne, qertafên veqetaneke ji holê rabûne û raveker jî wekî tewandî çûne alîyê çepê û bi rolê bikerê rabûne.

Herwiha encameke wisa jî derdikeve ku eger lêkera “hebûn”ê bi awayê devoka başûrê rojhilat bê bikaranîn û di wateya xwedîtîyê da be, taybetmendîyên lêkereke têper nîşan dide, lewra bireserê werdigire. Ev jî derasayîyek e, ji ber ku lêkera “hebûn”ê weke lêkereke teneper tê qebûlkin.

### **3.1.1.2.3. Bi Pêveberên Tecrûbekar**

#### **Bi Kurmancîya Standart**

Ez dicemidim. (Ez serma dikim)

#### **Bi Kurmancîya Başûrê Rojhilat**

Min sar e.

Ez digermijim.

Min germ e.

Di mînakên kurmancîya standart da em dibînin, pêveber bi bikeran ra rêkkeftine û cînavkên wan yên kesandinê wergirtine, bes di mînakên di devoka kurmancîya başûrê rojhilat em dibînin, cînavka kesandinê ya kesê sêyem yê yekjimar (-e) weke cînavka kesandinê hatîye bikaranîn û rêkkeftinek di navbera biker û pêveberê da tunne ye.

#### 3.1.1.2.4. Bikaranîna Cînavkan weke Temamkerê Bikerê di Pêveberên Kopulayî da

Di hevokên navdêrî da ji lêkera alîkar ra ku pêveber û bikerê bi hev ra girê dide, kopula tê gotin (Çiçekdağı, 2016:131-141). Di kurmancî da ev lêkera alîkar “bûn” e û bi navdêran ra tê bikaranîn û hevokên navdêrî çêdike. Ev lêkera kopula “bûn” di hevokên navdêrî yên dema niha ya kurmancî da weke cînavkên kesandinê, di demên borî da jî weke lêkera “bûn” derdikeve. Di van hevokên kopulayî da dema ku hinek cînavkên kesane weke tamamkerê bikerê (subject complement)<sup>108</sup> bêne bikaranîn, lêkera alîkar (kopula) bi bikera hevokê ra na, bi beşa tamamkerê bikerê ra rêkdikeve. Ev jî di dema niha ya kurmancî da rewşeke îstîsna çêdike, ji ber ku di dema niha da divê bikerê hevokê bi pêveberê ra rêkbikeve. Ji bo ku em fam bikin di kîjan cînavkên kesane da ev rewş derdikeve, em ê li jêrê hemû cînavkên kesane weke tamamkerê bikerê bi kar bînin.

Kesê yekem yê yekjimar	Kesê duyem yê yekjimar	Kesê sêyem yê yekjimar	Kesê yekem yê pirjimar	Kesê duyem yê pirjimar	Kesê sêyem yê pirjimar
Ez	Tu	Ew	Em	Hûn	Ew
Ez ez im.	Tu ez <b>im.</b>	Ew ez <b>im.</b>	Em ez <b>im.</b>	Hûn ez <b>im.</b>	Ew ez <b>im.</b>
Ez tu me.	Tu tu <b>yî.</b>	Ew tu <b>yî.</b>	Em tu ne.	Hûn tu <b>yî.</b>	Ew tu <b>yî.</b>
Ez ew im.	Tu ew <b>î.</b>	Ew ew e.	Em ew in.	Hûn ew in.	Ew ew <b>e.</b>

<sup>108</sup> Temamkerê bikerê ji bo pênasekirina bikerê, tevî lêkereke peywendîdar tê bikaranîn.

Ez em im.	Tu em î.	Ew em <b>in.</b>	Em em in.	Hûn em in.	Ew em in.
Ez hûn im.	Tu hûn î.	Ew hûn <b>in.</b>	Em hûn in.	Hûn hûn in	Ew hûn in.
Ez ew im.	Tu ew î.	Ew ew <b>in.</b>	Em ew in	Hûn ew in	Ew ew in.

Dema em li mînakan mêze dikin, em dibînin; gava ku kesê duyem yê yekjimar (tu) biker be û kesê yekem yê yekjimar (ez) tamamkerê bikerê be, lêker bi bikerê ra na, bi tamamkerê bikerê ra rêkdikeve, cînavkên kesandinê li gor tamamkerê bikerê werdigire. Eger kesê sêyem yê yekjimar (ew) bibe biker; kesê yekem yê yekjimar (ez), kesê duyem yê yekjimar (tu), kesê yekem yê pirjimar (em), kesê duyem yê pirjimar (hûn) û kesê sêyem yê pirjimar (ew) jî bibin tamamkerê bikerê, lêker bi bikerê ra na, bi wan tamamkerê bikeran ra rêkdikeve, cînavkên kesandinê li gor tamamkerê bikerê werdigire. Wexta ku kesê yekem yê yekjimar (em) bibe biker û kesê yekem yê yekjimar (ez) jî bibe tamamkerê bikerê, lêker bi bikerê ra na, bi tamamkerê bikerê ra rêkdikeve, cînavkên kesandinê li gor tamamkerê bikerê werdigire. Gava ku kesê duyem yê pirjimar (hûn) bibe biker; kesê yekem yekjimar (ez) û kesê duyem yê yekjimar (tu) jî bibin tamamkerê bikerê, lêker bi bikerê ra na, bi wan tamamkerên bikeran ra rêkdikeve, cînavkên kesandinê li gor tamamkerê bikerê werdigire. Dema ku kesê sêyem yê pirjimar (ew) bibe biker; kesê yekem yê yekjimar (ez), kesê duyem yê yekjimar (tu) û kesê sêyem yê yekjimar (ew) jî bibin tamamkerê bikerê, lêker bi bikerê ra na, bi wan tamamkerên bikeran ra rêkdikeve, cînavkên kesandinê li gor tamamkerê bikerê werdigire.

### 3.1.2. Rêkkeftina Kurmancî di Dema Bê da

Dema bê wê demê ji me ra nîşan dide ku kar û bûyer û rewş hîn pêk nehatine, lê ihtîmal heye di dahatûyê da pêk werin. Dema bê ya kurmancî weke dema niha ya kurmancî li ser rayeka dema niha ya lêkeran çêdibe (Tan, 2015: 273) Lê berî rayeka dema niha, em qertafa daxwazî “bi-” yê tînin, dûre rayeka dema niha û cînavkên kesandinê yan jî mêjerî yên bikerê li lêkeran zêde dikin. Ev “bi”ya qertafa daxwazî di kurmancîya başûr da pir caran nayê bikaranîn û tenê rayeka dema niha û cînavkên kesandinê yên bikerê tînin bikaranîn (Xoşnaw, 2015: 99).

Mînak: Ez dê (bi)xwim.

Li vir divê em vêya jî li gotinên xwe zêde kin ku dema bê di kurmacî da bi saya amraza “dê” pêk tê. Ev “dê”ya hanê di hin devokên kurmacî da weke “wê”, “ê” û “yê” tê bikaranîn.

Ji hêla rêkkeftina hêmanên hevokê ve pêveberên dema bê ya kurmacî herdem bi bikerên hevokan ra rêkdikevin. Lêkerên me têper jî bin, teneper jî bin, ferq nake, ev yek tu karîgerî li ser rêkkeftina dema bêya kurmacî nake.

### **Bi Lêkerên Têper**

Ez dê te bişînim.

Tu dê wan bişînî.

Ew dê te bişîne.

Em dê te bişînin.

Hûn dê wan bişînin.

Ew dê te bişînin.

Mînakên jorê nîşanî me didin ku pêveberan li gor bikerên hevokan cînavkên kesandinê wergirtine, rêkkeftin di navbera biker û pêveberan da ye û bireserên hevokan tu karîgerî li ser pêveberan nekirîye.

### **Bi Lêkerên Teneper**

Ez dê bikenim.

Tu dê bikenî.

Ew dê bikene.

Em dê bikenin.

Hûn dê bikenin.

Ew dê bikenin.

Di mînanan da jî xuya dibe ku tenepebûna lêkeran tu karîgerî li ser rêkkeftina dema bê ya kurmancî nake, rêkkeftin dîsa di navbera biker û pêveberan da ye, pêveberên hevokan bi bikerên hevokan ra rêkkeftine û pêveberan cînavkên kesandinê yên bikeran wergirtine.

### 3.1.3. Rêkkeftina Kurmancî di Demên Borî da

Kar û bûyer û rewşên ku di dema rabirdû da rû dane em bi demên borî dîyar dikin. Di zaravayê kurmancî da dema borî li ser rayeka dema borî ya lêkeran çêdibe. Rayeka dema borî bi avêtina radera lêkeran “-(i)n”ê bi dest dikeve (Baran, 2018: 141-142).

Mînak:

Kir-in: Kir

Xwar-in: Xwar

Zanî-n: Zanî

Sekinî-n: Sekinî

Rayeka sade ya dema borî ya kurmancî di heman demê da di demên borî da kesê sêyem yê yekjimar (wî/wî/ew) dinimîne. Ji ber ku di demên borî da ji bo kesê sêyem yê yekjimar tu cînavkên kesandinê tunene.

Ew sekinî.Ø

Wî xwast.Ø

Ew mamoste bû.Ø

Wê ava xwe vexwar.Ø

Di mînanan da jî tê dîtin. Di dema borî ya kurmancî da ji bo kesê sêyem yê yekjimar tu cînavkên kesandinê tune ne, pêvebaran tu cînavka kesandinê wernegirtîye.

Herçî mijara rêkkeftinê ye, di rêkkeftina demên borî ya kurmancî da têperbûn û têneperbûna lêkerê bi bandor e. Gava ku lêkerên ku bi rola pêveberîyê li hevokan radibin têneper bin, weke demên niha û bê, pêveber bi bikera hevokan ra rêkdikeve, lê wexta ku lêkerên ku bi rola pêveberîyê li hevokan radibin têper bin, pêveber bi bireserê ra rêkdikeve û cînavkên kesandinê li gor bireserê werdigere. (Bedîrxan û Roger, 2004: 171,174,175) Di zimanzanîyê da ji vî tiştî ra (rêkkeftina bireserê bi pêveberê ra) “ergatîvî” tê gotin.

Mînak.

Ez rabûm. (lêker têneper)

Mîna tu şandî. (lêker têper)

Bêguman ergatîvî tenê ne ew tişt e ku pêveber li gor bireserê teşe bigere, di pergela ergatîvî da bikera lêkera têneper û biresera lêkera têper weke hev tên nîşandan (Güneri, 2018: 107; İmer û yd., 2011: 207; Arslan, 2016: 64).

Mînak:

**Tu** nivistî.

Me **tu** dîtî.

Herwiha di pergela ergatîvîyê da bikerên hevokan têne dîyarkirin (Yonat, 2019: 231-232). Dîyarkirina bikerên kurmancî bi tewandina bikeran ve çêdibe. Mirov yan ji koma tewandî ya cînavkan (min, te, wî/wê, me, we, wan) cînavkek weke biker bi kar tîne an jî bikerên ku ne cînavk in bi qertafên tewangê (-î, -ê, an, ekî, ekê, -inan) ditewîne. Wate di demên borî da wexta ku lêkera pêveber têper be; biker ditewe, îca biker bitewe divê bireser xwerû be (di kurmancî da nabe hem biker hem bireser tewandî an jî xwerû bin), yekjimarî û pirjimarîya bireserê ji pêveberê tê famkirin, ji ber ku di vê rewşê da pêveber li gor bireserê cînavkên kesandinê û jimarîyê werdigire (Sayım, 2017: 7-8).

Ji bilî van di her dema borî ya kurmancî da ji bilî rayeka lêkeran ya dema borî û cînavkên kesandinê, her demekê qertafên wan yên demî yên taybet hene ji bo

dîyarkirina cureyên demên borî. Tenê dema borî ya têdayî (sade) ne xwedîyê qertafeke taybet ya demê ye.

### **3.1.3.1. Dema Borî ya Têdayî (Sade)**

Weke me li jorê got, rayeka dema borî ya lêkerên kurmancî di heman demê da dema borî ya têdayî ya kurmancî nîşan dide. Mirov raderê ji lêkerê diavêje û bi vî awayî rayeka dema borî ango dema borî ya têdayî derdikeve holê. Mirov cînavkên kesandinê jî li gor têperî û teneperbûna lêkerê li rayeka dema borî zêde dike û bi vî awayî dema borî ya têdayî çêdibe. (Kurd, 2018: 147-148) Bêşik ji ber ku ev jî demeka borî ya kurmancî ye qayîdeyên ergatîvîyê di vê demê da jî derbasdar in. Eger lêkera pêveber têper be; biker ditewe, bireser xwerû dimîne, pêveber bi bireserê ra rêkdikeve û cînavkên kesandinê yên bireserê werdigire.

#### **Bi Lêkerên Têper**

##### **Lêker: Birin**

Min tu birî.

Te ez birim.

Wê/wî em birin.

Me tu birî.

We ez birim.

Wan ew bir.Ø

Mînakên lêkerên têper vêya nîşan didin ku rêkkeftina dema borî ya têdayî ya kurmancî di navbera biker û bireserê da ye. Di hevokên mînak da jî xuya dibe ku pêveberan cînavkên kesandinê yên bireseran wergirtine. Tenê di mînaka dawî da pêveberê tu cînavka kesandinê wernegirtîye, ev jî ji ber ku wekî me berê jî amajê pê kirî, di demên borî da ji bo kesê sêyem yê yekjimar yê xwerû (ew) tu cînavkên kesandinê tune ne (Baran, 2018: 86).

#### **Bi Lêkerên Teneper**

## **Lêker: Hatin**

Ez hatim.

Tu hatî.

Ew hat.Ø

Em hatin.

Hûn hatin.

Ew hatin.

Hevokên mînak yên lêkera têneper ji me ra nîşan didin ku di dema borî ya têdayî ya kurmancî da rêkkeftin her weke dema niha û dema bê ya kurmancî di navbera biker û pêveberê da ye. Pêveberên hevokan cînavkên kesandinê yên bikeran wergirtine. Tenê di hevoka sêyem da pêveberê tu cînavkên kesandinê wernegirtîye, ji ber ku di di demên borî yên kurmancî da ji bo kesê sêyem yê yekjimar (ew) tu cînavkên kesandinê tune ne.

### **3.1.3.2. Çîrokîya Dema Borî ya Têdayî**

Di dema borî da eger em bixwazin behsa bûyereke bikin ku berî bûyereke din pêk hatîye, em vê demê bi kar tînin.

Çîrokîya dema borîya têdayî ya kurmancî bi saya rayeka dema borî ya lêkeran û bi lêkera alîkar “bûn”ê çêdibe. Mirov dikare çêbûna çîrokîya dema borî ya têdayî bi vî awayî nîşan bide:

Rayeka dema borî + bûn + Cînavkên kesandinê an jî hejmarî (Li gor têperî an jî têneperîya lêkerê)

Ev jî demek e borî ye û qayîdeyên ergatîvî di vê demê da jî derbasdar e. Wexta ku lêker têper bin, pêveber li gel bireserê; wexta ku lêker têneper bin, pêveber li gel bikerê rêkdikeve.

### **Bi Lêkerên Têper**

### **Lêker: Hêskirin**

Te ez hêrs kiribûm.

Min tu hêrs kiribûyî.

Wê/wî em hêrs kiribûn.

Me tu hêrs kiribûyî.

We ez hêrs kiribûm.

Wan ew (kesê sêyem ê yekjimar) hêrs kiribû.Ø

Weke em dibînin pêveberên hevokan li gor ergatîvîyê tev gerîyane û cînavkên kesandinê yên bireseran wergirtine. Ji ber ku lêkera me “hêskirin” lêkereke têper e.

### **Bi Lêkerên Têneper**

#### **Lêker: Ketin**

Ez ketibûm nav zeryayê.

Tu ketibûyî nav zeryayê.

Ew ketibûØ nav zeryayê.

Em ketibûn nav zeryayê.

Hûn ketibûn nav zeryayê.

Ew ketibûn nav zeryayê.

Ji mînanan jî bi zelalî tê dîtin, di çîrokîya dema borî ya têdayî da wexta ku lêkera pêveber têneper be, weke demên borî yên din yên kurmancî, pêveber li gel bikerê rêkdikeve û cînavkên wan yên kesandinê werdigire.

### 3.1.3.3. Dema Borî ya Dûdar

Dema borîya dûdar amaje bi wan kar û rûdan û rewşan dike ku di dema borî da çêbûne lê ew dema borîya ku tê behs kirin kengî ye bi tamamî ne zelal e. Wexta ku rûdanekê di dema borî da rû da û mirov paşê pê hesîya yan jî ji kesekî din bihîst, hîn bû, wê wextê jî bi kar tîne.

Di kurdîya kurmancî da dema borîya dûdar bi rayeka dema borî ya lêkeran û bi rayeka raweyî “-îye”yê çêdibe. Ev “îye”ya dema borîya dûdar çêker ji aliyê hin kesan ve weke “îye” tê bikaranîn. Lê weke ku Komxebata Kurmancîyê pêşniyar kirî, li gor me ev “î” bê parastin û weke “-îye” bê bikaranîn dê hîn çêtir be (Komxebeta Kurmancîyê, 2019: 54). Herwiha wexta ku dawîya rayeka dema borî ya lêkeran bi tîpeke dengdêr biqede, ew “î” ya destpêka “-îye” yê tê avêtin û tenê “-ye” dimîne, carnar jî tenê weke “-e” dimîne. (Bedîrxan, 1991: 30; Baran, 1991: 101)

Bêşik ev jî demeke borî ya kurmancî ye û wexta ku lêkerên pêveber têper bin, dîsa qayîdeyên ergatîvîyê derbasdar in. Wate wexta ku lêker têper bin, pêveber li gel bireserê; wexta ku lêker têneper bin, pêveber li gel bikerê rêkdikeve.

#### **Bi Lêkerên Têper**

##### **Lêker: Anîn**

Min du kulîlk anîne.

Te kulîlkek anîye.ø

Wê/wî pênc kulîlk anîne.

Me kulîlk anîye.ø (Kulîlkeke tenê)

We kulîlk anîne. (Pir kulîlk)

Wan kulîlk anîne. (Pir kulîlk)

#### **Bi Lêkerên Têneper**

##### **Lêker: Şiqitîn**

Ez li ser cemedê şiqitîme.

Tu li ser cemedê şiqitîye.

Ew li ser cemedê şiqitîye.Ø

Em li ser cemedê şiqitîne.

Hûn li ser cemedê şiqitîne.

Ew li ser cemedê şiqitîne.

### **3.1.3.4. Dema Borî ya Berdewam**

Bûyer, rûdan û rewşên ku di dema borî da bi awayekî çîrokî û berdewamî çêbûne dikevin nav dema borîya berdewam.

Dema borîya berdewam di kurmancî da bi saya qertafa “-di”, rayeka dema borî ya lêkeran û cînavkên kesadinê çêdibin (Mukrîyanî, 1984: 231). Cînavkên kesandinê dîsa li gor têperî û teneperîya lêkerê tên dawîya pêveberê. Eger lêkera pêveber têper be, dîsa qayîdeyên ergatîvîyê derbasdar e, wata pêveber li gel bireserê rêkdikeve; eger lêkera pêveber negerguhêz be, pêveber li gel bikera hevokê rêkdikeve.

#### **Bi Lêkerên Têper**

##### **Lêker: Çêkirin**

Min sparteka xwe çêdikir.Ø (spartekeke tenê ye)

Te spartekên xwe çêdikirin. (spartek zaf in)

Wî/wê spartekên xwe çêdikirin. (spartek zaf in)

Me sparteka xwe çêdikir.Ø (spartekeke tenê ye)

We spartekên xwe çêdikirin. (spartek zaf in)

Wan sparteka xwe çêdikir.Ø (spartekeke tenê ye)

Weke di mînanan da jî dîyar e, pêvebaran li gor bireserên xwe teşe girtîye, di bireserên pirjimar da cînavkên kesandinê yên pirjimarîyê, di bireserên yekjimar da jî tu cînavkên kesandinê wernegirtine, ji ber ku biresera yekjimar amaje bi cînavka kesê sêyem yê yekjimar dike (ew) û mîna ku em dizanin di demên borî da ji bo wê tu cînavkên kesandinê tunnene.

Ji bo ku başir bê famkirin em vê carê jî birserên xwe ji beşa cînavkan bigirin.

### **Lêker: Destnîşankirin**

Min tu dest nîşan dikirî.

Te ez dest nîşan dikirim.

Wî/wê ez dest nîşan dikirim.

Me ew (kesê sêyem ê yekjimar) dest nîşan kir.Ø

We ez dest nîşan dikirim.

Wan tu dest nîşan dikirî.

Ji mînanan jî tê famkirin ku pêveber li gel bireserên xwe rêkkeftine û li gor wan cînavkên xwe yên kesadinê wergirtine.

### **Bi lêkerên Têneper**

#### **Lêker: Raketin**

Ez radiketim.

Tu radiketî.

Ew radiket.Ø

Em radiketin.

Hûn radiketin.

Ew radiketin.

Ji ber ku vê carê pêvebera me ji lêkereke têneper pêk hatîye, pêveber bi bikerên hevokan ra rêkkeftîye û wan pêveberan cînavkên kesandinê yên bikeran wergitine. Li vir divê em vê jî bidin zanîn ku li vir me lêkereke pêkhatî (dariştî) bi kar anîye (raketin) û di kurmancî da dema ku lêkereke pêkhatî bê bikaranîn pêşgirên lêkeran (ra-, ve-, da-, hil û hwd.) tên destpêka lêkerê û piştê endamên din yên pêveberê rêz dibin.

### **3.1.3.5. Çend Îstîsna di Demên Borî yên Kurmancî**

Her çiqas me got di kurmancî da di demên borî da gava ku lêker têper be, pêveber bi bireserê ra rêkdikeve û cînavkên wê yên kesandinê ango yekjimarî-pirjimarîyê werdigire jî di demên borî da ji bo vê rêkkeftina kurmancî ya ku em jê ra ergatîvî dibêjin, çend haletên îstîsna hene.

#### **3.1.3.5.1. Cînavka Vegerok “Xwe”**

Dema di hevokê da biker û bireser ji yek kesî û ji yek mêjerî bin û tevgera biker raste rast li ser wî bi xwe bin, hingê cînavka bireser bi cînavka “xwe” tê nimandin (Bedîrxan, 1998: 76). Mînak:

Min ez dîtîm.\*

Ev hevok ji hêla qayîdeyên kurmancî ve şaş e, ji ber ku kar li bikerê vedigere, loma jî divê li şûna bireserê (ez) “xwe” bê bikaranîn. Divê hevok wiha be:

Min xwe dît.

Cînavka vegerok ji hêla zayendê ve nêtar e û her çiqas li şûna yekjimarî jî pirjimarîyê jî bê bikaranîn jî, di rêkkeftinê da weke yekjimar tê bikaranîn. Loma jî gava ku cînavka vegerok bibe biresera hevoka demeke borî ya kurdîya kurmancî, bireser her dem weke yekjimar tê qebûlkirin (Yavaş, 2019: 18-19).

Mînak:

Me xwe dît.ø

Wan xwe rezîl kir.ø

Te xwe xemiland?**ø**

Min xwe veşart.**ø**

Ji mînakên jî dîyar e, ku “xwe” şûna yekjimarîyê jî bigire ku şûna pirjimarîyê jî bigire, her dem weke yekjimar tê qebûlkin. Tişt û kesê yekjimar jî weke kes û tiştê sêyem yekjimar tê qebûlkin. Di demên borî da cînavka kesandinê ji bo kes û tiştê sêyem sifir e (**ø**), li gor wê li gel pêveberê rêkdikeve û tu cînavkên kesandinê an jî hejmarî wernagire.

### **3.1.3.5.2. Cînavka Berbihevîn “Hevdu”**

“Pronava berbihevîn ew pronav e ko di qisetê da du kesên têvel bi hev ra dinimîne û li şûna wan dikeve.” (Bedîrxan, 1998: 77). Ev cînavk li heremên weke Behdînan û Colemêrgê weke “êk”, êkûdu” tê bikaranîn. Her çiqas weke wate pirjimarîyê pêşwazî bike jî di axaftin û hevoksazîya kurmancî da weke yekjimar tê qebûlkin loma jî cînavka kesandinê weke sifir (**ø**) tê qebûlkin. Ev jî rê vedike ku ji hêla ergatîvîyê ve rewşeke awarte derkeve. Ji ber ku her çiqas “hevdu” wateya herî kêr du kesan di nava xwe da bihevîne jî di ergatîvîyê da dema bireser be, weke yekjimar tê qebûlkin.

Mînak:

Wan hevdu dît.**ø**

Me hevdu hêrs anî.**ø**

We hevdu paqij kir.**ø**

Mînak bi zelalî nîşan didin ku cînavka berbihevîn dema ku weke bireser bê bikaranîn, weke yekjimar tê qebûlkin û rêkkestina wê ya li gel lêkerê jî li gor wê dibe. Di ergatîvîya kurmancî da biresera yekjimar (kes yan jî tiştê sêyem) tu qertafan nîşan nade, tenê rayeka dema borî tê bikaranîn. Cînavka berbihevîn jî vê taybetmendîyê nîşan dide, lê di wan nivîsan da ku heta niha derbarê ergatîvîya kurmancî da hatine nivîsîn, qet behsa vê îstîsnaya ergatîvîyê ya cînavka berbihevîn nehatîye kirin.

### 3.1.3.5.3. Lêkerên ku bi Cînavkeke Lihevxiştî Pêkhatine

Ev cure lêker ji lêkerekê û ji cînavkeke lihevxiştî pêk hatine. Ji van cure lêkeran ra hinek kesan gotîye “lêkerên veqetînbar” (Farqînî, 2019: 139), hinek kesan gotîye “lêkerên bidaçek” (Tan, 2015: 265), hinek kesan jî gotîye lêkerên “hevdudanî” (Baran, 2018: 179). Di van lêkeran da hinek lêker hene bireserê digirin nav xwe, hinek ji van lêkeran jî bireserê nagirin nava xwe. Ev lêkerên bidaçek ku bireserê digirin nava xwe di demên borî da qayîdeya ergatîvîya kurmancî bînpê dikin û mebest ji bireserê pirjimar jî be, her dem weke yekjimar tê qebûlkirin (Farqînî, 2019:152; Tan, 2015: 266).

Mînak:

Me li wan mêze kir.Ø (lêmêzekirin)

We li wan da.Ø (lêdan)

Dema ku mirov li van mînakên jorê dinêre, dibîne ku bireser pirjimar in, bes ji ber ku ketine navbera daçek (piştî daçekan navdêr û cînavk ditewin) û lêkeran, tewîyane û êdî dema hatine kişandin, weke yekjimar hatine qebûlkirin. Ev jî ji ber wê ye ku ji ber ku bireser piştî daçekê hatine û tewîyane û xwerûbûna wan ji holê rabûye, loma êdî pêveber li gor wan nehatine kişandin. Wate qayîdeya ergatîvîyê li vir derbas nabe.

Îcar ka em binêrin ew rewşa lêkerên bidaçek yên ku bireseran nagirin nav xwe çawa dibe.

Min sê pirtûk ji wî xwestin. (jêxwestin)

Wî kinc li wê kirin. (lêkirin)

Te şeş gulîyên darê jê kirin. (jêkirin)

Ji mînakan jî tê famkirin ku dema ew lêkerên bidaçek yên ku bireseran nagirin nava xwe bêne bikaranîn, qayîdeya ergatîvîyê xira nabe û pêveberê bi bireserê ra rêkdikeve û cînavkên yekjimarî-pirjimarî an jî kesandinê li gor bireserê werdigire.

#### 3.1.3.5.4. Veşartîbûn û Dûrketina Kesê Sêyem yê Pirjimar

Di kurdîya kurmancî da dema ku kes an jî tiştê sêyem yê pirjimar biker be û neyê bilêvkin; wê demê bireser yekjimar jî be, pirjimar jî be, ferq nake ji bo ku di wateyê da alozî çênebe û bê famkirin biker pirjimar e pêveber li gor bikera pirjimar tê kişandin û bikera pirjimar û lêkera têper rêkdikevin. Ev jî îstîsnayeke ergatîvîya kurmancî ye, ji ber ku di hevoka ergatîv da divê pêveber bi bireserê ra rêkbikeve, ne li gor bikerê (Aykoç, 2021: 49).

Mînak:

Wan çivîkek serbest berda. (Bikera pirjimar dîyar e.)

Çivîkek serbest berdan. (Bikera pirjimar ne dîyar e.)

Wan pirtûkek kirî. (Bikera pirjimar dîyar e.)

Pirtûkek kirîn. (Bikera pirjimar ne dîyar e.)

Weke di mînakan da jî xuya ye, dema ku bikera kes an jî tiştê sêyem yê pirjimar bê bikaranîn (xuya û eşkere be), rêkkestin li gor qayîdeyên ergatîvîya kurmancî ye; lê dema ku neyê bikaranîn, ergatîvî tê binpêkirin û ji bo ku mêjera bikerê bê famkirin pêveber li gel bikera pirjimar û nuxumandî rêkdikeve.

Di vê mijarê da xalek heye ku divê bê behskirin ku kesên heta niha li ser vê mijarê nivîsîne li ser nesekinîne. (Aykoç, 2021: 49; Baran, 2018: 216-217; Bedîrxan û Roger, 2004: 314; Yavaş û Kizil: 2020, 80-81). Rast e, dema ku bikera pirjimar neyê bikaranîn bireser na, bikera pirjimar ya nuxumadî bi pêveberê ra rêkdikeve, lê di wan hevokan da ku bikera pirjimar nayên bikaranîn, dema ku bireser cînavkên kesane yê xwerû bin û hevok jî bersîveke pîrsekê be, qayîdeya ergatîvîyê parastî dimîne û li gor ergatîvîyê dîsa pêveber bi bireserê rêkdikeve û cînavkên kesandinê li gor bireserê werdigire.

Mînak:

Wan kî bir? (Bikera pirjimar dîyar e.)

Ez birim. (Wan ez birim)

Wan kî hilbijart?

Tu hilbijartî. (Wan tu hilbijartî)

Ji mînakên jorê jî bi zelalî xuya dibe ku bikera pirjimar neyê bilêvkirin jî dema ku bireser cînavkên xwerû bin û hevok jî hevokeke bersîvdanê be, qayîdeya ergatîvîya kurmancî tê parastin û pêveber bi bireserê ra rêkdikeve.

Dîsa di vê mijarê da xalek heye ku vê îstîsnaya veşartûbûna bikera kesê sêyem yê pirjimar xira dike. Celadet Bedîrxan di pirtûka xwe da behsa vê yekê kirîye û weke dût ketina bikera kesê sêyem yê pirjimar ji lêkerê rave kirîye (Bedîrxan û Roger, 2004: 314) Mehmet Yonat jî di gotara xwe da amaje bi vê yekê kirîye û mijar bi vê mînakê rave kirîye (Yonat û Aslanoğlu, 2023: 17):

“Du ciwan hatin dikanê, ji dikandar pakêtek cixare xwestin.”

Dema em li mînakê mêze dikin, em dibînin ku du pêveberên hevokê hene. Yek ji wan lêkera têneper hatin e û bi bikerê ra (du ciwan) rêkkeftîye, cînavkên kesandinê li gor wê girtîye, lewra di demên borî da lêkerên têneper bi bikerê ra rêkdikevin. Pêveberê duyem “xwestin” e û têper e. Li gor qayîdeyên demên borî yên kurmancî dema ku lêkera pêveber têper be, divê biker bitewe, bireser xwerû be û pêveber jî bi bireserê rêkbikeve. Lê di mînakê da em dibînin ku digel pêveber têper e û bireser yekjimar e (pakêtek cixare), pêveber di rewşa sifir da nemayîye, (ji ber ku di demên borî yên kurmancî da ji bo kes û tiştê sêyem yê yekjimar tu cînavkên kesandinê tune ne) wê cînavka kesandinê yê pirjimarîyê (-in) li gor cînavka kesê sêyem yê pirjimar yê tewandî (wan) wergirtîye. Ev ji ber wê ye ku di hevokê da du daraz hene û heta ku rewş hatîye ser daraza têper bikera pirjimar ji lêkera pêveber ya têper dût ketîye. Lewra jî ew halet çêbûye ku mirov bixwaze bikera kesê sêyem yê pirjimar dîyar bike.

### **3.1.3.5.5. Dema ku di Hevokekê da Lêkerên Têneper û Têper Bibin Pêveberên Heman Bikerê**

Celadet Bedîrxan dibêje, di demên borî yên kurmancî da eger lêkerekê têneper û têper di heman hevokê da bibin pêveberên bikerekê û tenê bikera tewandî bê

bikaranîn, lêkera pêveber ya têneper tu cînavkên kesandinê wernagire (Bedîrxan, 1998: 75).

Mînak:

Min çû<sup>ø</sup> du zebeş anîn.

Wî rabû<sup>ø</sup> du çiqil şkandin.

Me çû<sup>ø</sup> telefonê kirî.<sup>ø</sup>

Îca di van mînakan da jî em dibînin lêkerên pêveber “çûn” “rabûn” yên têneper ku li pêş in tu cînavka kesandinê wernegirtîye û di rewşa sifir da mayîne. Lê lêkerên pêveber yên têper “anîn, şkandin, kirîn” li gor ergatîva kurmancî tev gerîyane û bi bireserên xwe ra rêkkeftine, cînavkên kesandinê li gor wan wergirtine. Di vir da ji bo lêkerên têneper derasayîyek xuya dike, ji ber ku wan tu cînavkên kesandinê li gor bikerê wernegirtine. Weke tê zanîn di demên borî da eger lêker têneper be, weke dema niha rewşa akûzatîfî çêdibe, lêkera têneper ya pêveber bi bikerê ra rêkdikeve û li gor wê cînavkên kesandinê werdigire, lê li vir rewşeke derqayîdeya vê rewşê çêbûye.

Bedîrxan di heman berhama xwe da dibêje, di hevokên wisa da bikaranîneke wisa jî heye ku ji bo lêkera têper jî ji bo lêkera têneper jî biker derdikeve (Bedîrxan, 1998: 74-75).

Ez çû<sup>m</sup>, min du zebeş anîn.

Ew rabû<sup>ø</sup>, wî du çiqil şikandin.

Em çû<sup>n</sup>, me telefonê kirî.<sup>ø</sup>

Eger hevokên wisa bi vî awayî çêbin, wate ji bo lêkera têneper jî biker derkeve, lêkerên têneper jî bi bikerê ra rêkdikevin û cînavkên kesandinê li gor wan werdigirin. Bi vî awayî jî rewşa awarte ya dema borî ya kurmancî jî ji holê radibe.

Lê ev rewşa derasayî ya dema borî ya kurmancî di çend lêkerên têneper yên espektîf da derdikeve. Mikail Bülbül di gotara xwe ya bi navê *Risteyên Aloz di Kurmancî da* da li ser vê mijarê sekiniye. Wî behsa lêkerên “çûn” û “rabûn” û çend

lêkerên din kirîye ku di demên borî da weke lêkerên espektîf dikarin bêne bikaranîn. Ev herdu lêker di demên borî da dema ku weke lêkerên espektîf têne bikaranîn ji wateya xwe ya bingehîn dûr dikevin û bi rolê bidawîbûn (çûn) û destpêkirinê (rabûn) radibin (Bülbül, 2019: 268). Hingê ev herdu lêker ji hêla rêkkestîne ve bêalî dimînin û di rewşa sifir da dibin. Wate tu cînavkên kesandinê wernagirin.

### **3.1.3.5.6. Bikaranîna Lêkera Hebûnê di Wateya Xwedîtîyê da**

Me behsa lêkera hebûnê di dema niha da weke îstîsnayeke dema niha ya kurmancî kiribû, herwekî dema niha, lêkera hebûnê di demên borî da jî eger weke xwedîtîyê bê bikaranîn, taybetmendiyên lêkereke têper nîşan dide û bi bikerê ra na, bi bireserê ra rêkdikeve. Ev jî li gor qayîdeya ergatîvîya kurmancî ye. Bêguman weke di dema niha da jî me got, ev awa bikaranîna lêkera “hebûn”ê di hemû devokên kurmancî da tune ye, di devoka kurmancîya başûrê rojhilat da tê dîtîn (Yonat, 2022: 254-257) .

Mînak:

Min du gul hebûn.

Me gulek hebû.ø

Wê pênc xanî hebûn.

Weke em di mînakan da jî dibînin, lêkera hebûnê ya pêveber bi bikeran ra na, bi bireserên xwe ra rêkkestîye û li gor mêjera wan teşe girtîye.

### **3.1.3.5.7. Bi Pêveberên Tecrûbekar**

Pêveberên tecrûbekar ne tenê di dema niha ya kurmancî da di demên borî da jî berovajî qayîdeyên rêkkestîna kurmancî tev digerin (Yonat, 2022: 254-257). Di demên borî da dema ku lêker têneper bin, divê hevok li gor akûzatîfî tev bigere û divê biker xwerû be, pêveber jî li gor bikera xwerû teşe bigire. Lê pêveberên tecrûbekar berovajî vê tevdigerin.

Mînak:

Min sar bû.ø (Ez qefilîm, Ez cemidîm)

Me germ bû.ø (Em germijîn)

Di mînan da jî em dibînin digel ku pêveberên tecrûbekar li vir ne têper in, biker tewîyane û pêveber jî li şûna ku bi bikerê ra rêkbikevin di rewşa sifir da mayîne û tu cînavka kesandinê wernegirtîye. Bêguman weke ku me di beşa îstîsnayên dema niha ya kurmancî da got, ev rewş di devoka başûrê rojhilat da derdikeve.

### 3.1.3.5.8. Bikaranîna Cînavkan weke Temamkerê Bikerê di Pêveberên Kopulayî da

Di dema niha da me weke îstîsnayeke rêkkeftina dema niha ya kurmancî behsa vê yekê kiribû. Weke dema niha ya kurmancî, di demên borî yê kurmancî da jî di hevokên kopulayî da dema ku hinek cînavkên kesane bi rolê tamamkerê bikerê radibin, lêkera kopula bi bikerê ra na, bi tamamkerê bikerê ra rêk rêkdikeve. Bêguman ev rewş weke dema niha ya kurmancî jî me behs kirî, ji bo hinek cînavkan ev yek derbasdar e. Mînak:

Kesê yekem yê yekjimar	Kesê duyem yê yekjimar	Kesê sêyem yê yekjimar	Kesê yekem yê pirjimar	Kesê duyem yê pirjimar	Kesê sêyem yê pirjimar
Ez	Tu	Ew	Em	Hûn	Ew
Ez ez bûm.	Tu ez bûm.	Ew ez bûm.	Em ez bûm.	Hûn ez bûm.	Ew ez bûm.
Ez tu bûm.	Tu tu bûyî.	Ew tu bûyî.	Em tu bûn.	Hûn tu bûyî.	Ew tu bûyî.
Ez ew bûm.	Tu ew bûyî.	Ew ew bû. ø	Em ew bûn.	Hûn ew bûn.	Ew ew bû.ø
Ez em bûm.	Tu em bûyî.	Ew em bûn.	Em em bûn.	Hûn em bûn.	Ew em bûn.
Ez hûn bûm.	Tu hûn bûyî.	Ew hûn bûn.	Em hûn bûn.	Hûn hûn bûn.	Ew hûn bûn.
Ez ew bûm.	Tu ew bûyî.	Ew ew bûn.	Em ew bûn.	Hûn ew bûn.	Ew ew bûn.

Ji mînakên jorê em fam dikin ku weke dema niha ya kurmancî, di dema borî da jî gava ku kesê duyem yê yekjimar (tu) biker be û kesê yekem yê yekjimar (ez)

temamkerê bikerê be, rêkkeftin di navbera lêker û tamamkerê bikerê da ye. Eger kesê sêyem yê yekjimar (ew) bibe biker; kesê yekem yê yekjimar (ez), kesê duyem yê yekjimar (tu), kesê yekem yê pirjimar (em), kesê duyem yê pirjimar (hûn) û kesê sêyem yê pirjimar (ew) jî bibin tamamkerê bikerê, rêkkeftin di navbera lêker û tamamkerê bikerê da ye. Wexta ku kesê yekem yê pirjimar (em) bibe biker û kesê yekem yê yekjimar (ez) jî bibe tamamkerê bikerê, rêkkeftin di navbera lêker û tamamkerê bikerê da ye. Gava ku kesê duyem yê pirjimar (hûn) bibe biker; kesê yekem yê yekjimar (ez) û kesê duyem yê yekjimar (tu) jî bibin tamamkerê bikerê, rêkkeftin di navbera lêker û tamamkerê bikerê da ye. Dema ku kesê sêyem yê pirjimar (ew) bibe biker; kesê yekem yê yekjimar (ez), kesê duyem yê yekjimar (tu) û kesê sêyem yê yekjimar jî bibin tamamkerê bikerê, rêkkeftin di navbera lêker û tamamkerê bikerê da ye.

#### **3.1.4. Rêkkeftina Kurmancî di Tebatîyê da**

Tebatîya zaravayê kurmancî bi bikaranîna lêkera “hatin”ê weke lêkereke alîkar bi dest dikeve. Di haleta tebatîya kurmancî da lêkera hatinê li gor dem û li gor kes an jî hejmara biresera ku şûna bikerê girtîye tê kişandin û lêkera bingehîn jî di rewşa raderîn da dimîne (Subaşî, 2023: 49; Rizgar, 2005: 266-268). Tebatîya kurmancî weke zaravayê soranî tenê di wan hevokan da çêdibe ku têper in.

Ji hêla rêkkeftina hêmanên hevokê ve di tebatîya kurmancî da di hemû deman da lêkera alîkar “hatin”, wate tebatî çêkera kurmancî, bi biresera ku şûna bikerê girtîye ra rêkdikeve û cînavkên wê yên kesandinê an jî hejmarî werdigire.

Mînak:

**Lêker: Girtin**

**Dema Niha**

Ez dihê**m** girtin.

Tu dihê**yî** girtin.

Ew dihê~~o~~ girtin.<sup>109</sup>

Em dihên girtin.

Hûn dihên girtin

Ew dihên girtin.

### **Dema Borî**

Ez hatim girtin.

Tu hatî girtin.

Ew hat~~o~~ girtin.

Em hatin girtin.

Hûn hatin girtin.

Ew hatin girtin.

Wekî ku ji mînakan jî xuya dibe dem çî dibe bila bibe, lêkera alîkar ya tebatî çêker “hatin”, bi biresera ku şuna bikerê girtîye ra rêkdikeve û kesandin û jimareya wan nîşan dide.

## **3.2. Cureyên Rêkkeftinên Soranî**

### **3.2.1. Rêkkeftina Soranî di Dema Niha da**

Dema niha ku bi soranî jê ra dibêjin katî esta û katî ranebirdû, kar û bûyer û rewşê radigihîne ku mirov tê da ye. Di soranî da dema niha bi qertafa dema niha (de-), rayeka dema niha ya lêkeran û cînavkên kesandinê (ji koma duyem) pêk tê (Emîn,

---

<sup>109</sup> Di dema niha û di dema bê ya zaravayê kurmancî da ji bo çend lêkeran wekî hatin, şuştin û dirûtin cînavka kesandinê ya kesê sêyem yê yekjimar (-e) nayê bikaranîn. Lêkera hatinê jî yek ji wan e, lewma tu cînavkên kesandinê ji bo kesê sêyem yê yekjimar nehatîye.

2009: 91, 93, 122, 381, 382). Em dikarin formûla pêkhatina dema niha ya soranî bi vî awayî nîşan bidin.

De + rayeka dema niha lêkerê + cînavkên kesandinê yên koma bêhêz

Di warê rêkkeftinê da pêveberên hevokên dema niha ya soranî her dem bi bikerên xwe ra rêkdikevin. Wate pêveber cînavkên kesandinê ji koma bêhêz li gor bikerê werdigire (Kurdo, 2021: 177-178).

### **Bi Lêkerên Têper**

#### **Lêker: Xwêndin**

<b>Kurmancî</b>	<b>سۆرانی</b>
Ez rojnameyê dixwînim.	من رۆژنامه دهخوینم. <sup>110</sup>
Tu rojnameyê dixwînî.	تۆ رۆژنامه دهخوینیت. <sup>111</sup>
Ew rojnameyê dixwîne.	ئهو رۆژنامه دهخوینیت. <sup>112</sup>
Em rojnameyê dixwînin.	ئهم رۆژنامه دهخوینین. <sup>113</sup>
Hûn rojnameyê dixwînin.	ئێوه رۆژنامه دهخوینن. <sup>114</sup>
Ew rojnameyê dixwînin.	ئهوان رۆژنامه دهخوینن. <sup>115</sup>

<sup>110</sup> Bi alfabeya latînî: Min rojname dexwênim.

<sup>111</sup> Bi alfabeya latînî: To rojname dexwênît.

<sup>112</sup> Bi alfabeya latînî: Ew rojname dexwênêt.

<sup>113</sup> Bi alfabeya latînî: Ême rojname dexwênîn.

<sup>114</sup> Bi alfabeya latînî: Êwe rojname dexwênin.

<sup>115</sup> Bi alfabeya latînî: Ewan rojname dexwênin.

## Bi Lêkerên Têneper

### Lêker: Kewtin

Kurmancî	سۆرانى
Ez dikevim.	من دهكهم. <sup>116</sup>
Tu dikevî.	تو دهكهویت. <sup>117</sup>
Ew dikeve.	ئهو دهكهویت. <sup>118</sup>
Em dikevin.	ئیمه دهكهوین. <sup>119</sup>
Hûn dikevin.	ئیهوه دهكهون. <sup>120</sup>
Ew dikevin.	ئهوان دهكهون. <sup>121</sup>

Li mînakên jorê bi zelalî xuya dike ku rêkkeftina dema niha ya soranî di navbera biker û pêveberê da ye. Pêveberan lêker gerguhêz jî be, negerguhêz jî be, cînavkên kesandinê yên bêhêz li gor bikeran wergirtine û rêkkeftin di navbera biker û pêveberê da ye.

---

<sup>116</sup> Bi alfabeya latînî: Min dekew**im**.

<sup>117</sup> Bi alfabeya latînî: To dekew**ît**.

<sup>118</sup> Bi alfabeya latînî: Ew dekew**êt**.

<sup>119</sup> Bi alfabeya latînî: Ême dekew**în**.

<sup>120</sup> Bi alfabeya latînî: Êwe dekew**in**.

<sup>121</sup> Bi alfabeya latînî: Ewan dekew**in**.

### 3.2.1.1. Çend Îstîsna di Dema Niha ya Soranî da

#### 3.2.1.1.1. Dema ku Hevok Tenê ji Pêveberekê Pêk Were

Di zaravayê soranî da carnan li gor rewşan ango li gor bijartina mirovan hevok dibe ku tenê ji pêveberekê pêk were. Ev yek dibe ku li ser lêkereke têneper jî dibe ku li ser lêkereke têper jî çêbe. Dema ku li ser lêkereke têneper çêbe, tenê cînavka kesandinê ya koma bêhêz diçe dawîya pêveberê, lê dema ku li ser lêkerên têper çêdibe, di vê rewşê da cînavka kesandinê ya bikerê û cînavka kesandinê ya bireserê hemû li ser lêkera têper (pêveber) kom dibin û pêveber hem bikerê hem jî bireserê nîşan dide. Îca ji hêla rêkkeftinê ve em dikarin bêjin pêveber hem bi bikerê ra hem jî bi bireserê ra rêkdikeve. (Emîn, 2009: 91, 102)

Di vê rewşa soranî ku hevok tenê ji pêveberekê pêk were, biker ji koma bêhêz ya cînavkên kesandinê, bireser jî ji koma bihêz ya cînavkên kesandinê pêk tê (Marif, 2014: 164-165).

Heke em pergela vê rewşa soranî formûlîze bikin bi vî awayî dibe:

De                      yan                      hên                      êt (Ew ewan dehênêt)<sup>122</sup>  
↑                      ↑                      ↑                      ↑  
De + cînavkên bihêz (bo bireser) + rayeka dema niha + cînavkên bêhêz (bo biker)

Mînak:

#### Lêker: Bînîn

Kurmancî	سۆرانی
Em te dibînin.	ده‌بیین. (ئیمه تو ده‌بیین) <sup>123</sup>

<sup>122</sup> Kurmancîya vê hevokê: Ew wan tîne.

<sup>123</sup> Bi alfabeya latînî: De**bînîn**. (Ême to debînîn)

### Lêker: Nardin

<b>Kurmancî</b>	سۆرانی
Ez we dişînim.	دهتا ئێریم. (من ئێوه دهئێریم) <sup>124</sup>

### Lêker: Firoştin

<b>Kurmancî</b>	سۆرانی
Ew wan difiroşe.	دهیانفروشتیت. (ئهو ئهوان دهفروشتیت) <sup>125</sup>

### Lêker: Hênan

<b>Kurmancî</b>	سۆرانی
Ew wî/wê tînin.	دههینن. (ئهوان ئهو دههینن) <sup>126</sup>

Di mînakên jorê da yekem cînavkên kessandinê ku em dibînin ji beşa bihêz ya cînavkên kesandinê ne ku ji bo nimandina bireseran hatine, dawî cînavkên kesandinê ku ji beşa bêhêz ya cînavkên kesandinê ne ji bo nimandina bikeran hatine. Wate pêveber bi bireser û bikerê ra rêkkestîye û cînavkên wan yên kesandinê wergitine.

#### 3.2.1.1.2. Dema ku Lêkera Wîstinê Bê Bikaranîn

Di soranî da lêkerek bi navê “wîstin” heye ku tê beramberî lêkera “vîyan”ê ya kurmancî. Rayeka dema niha ya vê lêkerê di soranî da “ewê” ye. Dema ku ev lêker tenê bê bikaranîn rêkkestî dîsa di navbera biker û pêveberê da dibe, lê cînavkên

---

<sup>124</sup> Bi alfabeya latînî: *Detannêrim*. (Min êwe denêrim)

<sup>125</sup> Bi alfabeya latînî: *Deyanfiroşêt*. (Ew ewan defiroşêt)

<sup>126</sup> Bi alfabeya latînî: *Deyhênin*. (Ewan ew dehênin)

kesandinê naçin dawîya pêveberê, dikevin navbera qertafa dema niha (de-) û rayeka dema niha ya lêkerê û vê carê cînavkên kesandinê yên koma bêhêz na, yên koma bihêz têne bikaranîn (Zendî, 2019: 122-125; Kurdo, 2021: 225). Ev jî derasayîyekê çêdike, ji ber ku li gor rêkheftina dema niha ya soranî divê pêveber cînavkên kesandinê yên koma bêhêz werbigirin. Mînak:

Kurmancî	سۆرانی
Ez dixwazim.	من دەمەوێ. <sup>127</sup>
Tu dixwazî.	تۆ دەتەوێ. <sup>128</sup>
Ew dixwaze.	ئەو دەپەوێ. <sup>129</sup>
Em dixwazin.	ئێمە دەمانەوێ. <sup>130</sup>
Hûn dixwazin.	ئێوه دەتانەوێ. <sup>131</sup>
Ew dixwazin.	ئەوان دەیانەوێ. <sup>132</sup>

Du tişt li mînakan bala me dikişîne, yekem, digel ku dem dema niha ye, cînavkên kesandinê ne ji koma bêhêz, ji koma bihêz hatine; duyem, cînavkên kesandinê neçûne dawîya pêveberê ketine navbera qertafa dema niha û pêveberê.

<sup>127</sup> Bi alfabeya latînî: Min demewê.

<sup>128</sup> Bi alfabeya latînî: To detewê.

<sup>129</sup> Bi alfabeya latînî: Ew deyewê.

<sup>130</sup> Bi alfabeya latînî: Ême demanewê.

<sup>131</sup> Bi alfabeya latînî: Êwe demanewê.

<sup>132</sup> Bi alfabeya latînî: Ewan deyanewê.

Lê dema ku hevok bireserekê werbigire, wê demê cînavkên kesandinê yên koma bihêz naçin pêveberê, diçin dawîya bireserê û bireser bi bikerê ra rêdkikeve. (Pijwe, 2020: 171). Mînak:

Kurmancî	سۆرانی
Ez avê dixwazim.	من ئاوم دهوئ. <sup>133</sup>
Tu avê dixwazî.	تو ئاوت دهوئ. <sup>134</sup>
Ew avê dixwaze.	ئهو ئاوی دهوئ. <sup>135</sup>
Em avê dixwazin.	ئێمه ئاومان دهوئ. <sup>136</sup>
Hûn avê dixwazin.	ئێوه ئاوتان دهوئ. <sup>137</sup>
Ew avê dixwazin.	ئهان ئاویان دهوئ. <sup>138</sup>

Ev rewşa derasayî ya lêkera “wîstin”ê dema ku peyvek tê ba lêkera wîstinê û lêkereke hevedudanî çêdibe jî dîsa rû dide û cînavkên kesandinê yên ji koma bihêz dîsa diçin dawîya bireserê. Mînak:

Kurmancî	سۆرانی
Ez ji te hez dikim.	من تۆم خوش دهوئ. <sup>139</sup>

<sup>133</sup> Bi alfabeya latînî: Min aw**im** dewê.

<sup>134</sup> Bi alfabeya latînî: To aw**it** dewê.

<sup>135</sup> Bi alfabeya latînî: Ew aw**î** dewê.

<sup>136</sup> Bi alfabeya latînî: Ême aw**man** dewê.

<sup>137</sup> Bi alfabeya latînî: Êwe aw**tan** dewê.

<sup>138</sup> Bi alfabeya latînî: Ewan aw**yan** dewê.

<sup>139</sup> Bi alfabeya latînî: Min tom xo**ş** dewê.

Tu ji min hez dikî.	تۆ منت خوش دهوئى. <sup>140</sup>
Ew ji min hez dike.	ئەو منى خوش دهوئى. <sup>141</sup>
Em ji te hez dikin.	ئېمە تۆمان خوش دهوئى. <sup>142</sup>
Hûn ji wan hez dikin.	ئێوه ئەوانتان خوش دهوئى. <sup>143</sup>
Ew ji te hez dikin.	ئەوان تۆيان خوش دهوئى. <sup>144</sup>

Weke encam ji bo lêkera “wîstin”ê di dema niha ya soranî da rewşeke awarte heye. Hem ji hêla bikaranîna cînavkên kesandinê ve hem jî cîhê hatina wan ve.

### 3.2.1.1.3. Bikaranîna Lêkera Hebûnê di Wateya Xwedîtîyê da

Lêkera hebûnê wekî me berê jî got, du wateya wê heye, yek wucûdbûn, yek jî xwedîtî ye. Di dema niha ya zaravayê soranî da eger lêkera hebûn di wateya xwedîtîyê da bê bikaranîn, weke lêkereke têper tê qebûlkirin û cînavkên kesandinê yên bihêz diçin dawîya bireserê û biker bi bireserê ra rêkdikevin, bireser li gor bikerê cînavkên kesandinê ji koma bihêz werdigire (Marif, 2014: 274, 275). Di vê rewşê da gava ku bireser di hevokê da veşartî be, cînavkên kesandinê yên bihêz rasterast diçin dawîya lêkera hebûnê (Kurdo, 2021: 221). Mînak:

---

<sup>140</sup> Bi alfabeya latînî: To **minî**t xoş dewê.

<sup>141</sup> Bi alfabeya latînî: Ew **minî** xoş dewê.

<sup>142</sup> Bi alfabeya latînî: Ême **to**man xoş dewê.

<sup>143</sup> Bi alfabeya latînî: Êwe ewan**tan** xoş dewê.

<sup>144</sup> Bi alfabeya latînî: Ewan **to**yan xoş dewê.

### Dema ku Bireser Xuva Be

Kurmancî	سۆرانی
Sê gulên min hene.	من سێ گولم ههیه. 145
Sê gulên te hene.	تۆ سێ گولت ههیه. 146
Sê gulên wî/wê hene.	ئهو سێ گولی ههیه. 147
Sê gulên me hene.	ئێمه سێ گولمان ههیه. 148
Sê gulên we hene.	ئێوه سێ گولتان ههیه. 149
Sê gulên wan hene.	ئهوان سێ گولیان ههیه. 150

### Dema ku Bireser Xuva Nebe

Kurmancî	سۆرانی
Ez heme.	من ههمه. 151
Tu heyî.	تۆ ههته. 152
Ew heye.	ئهو ههیهتی. 153

<sup>145</sup> Bi alfabeya latîni: Min sê gulim heye.

<sup>146</sup> Bi alfabeya latîni: To sê gult heye.

<sup>147</sup> Bi alfabeya latîni: Ew sê gulî heye.

<sup>148</sup> Bi alfabeya latîni: Ême sê gulman heye.

<sup>149</sup> Bi alfabeya latîni: Êwe sê gultan heye.

<sup>150</sup> Bi alfabeya latîni: Ewan sê gulyan heye.

<sup>151</sup> Bi alfabeya latîni: Min heme.

<sup>152</sup> Bi alfabeya latîni: To hete.

<sup>153</sup> Bi alfabeya latîni: Ew heyetî.

Em hene.	ئێمه هه‌مانه. 154
Hûn hene.	ئێوه هه‌تانه. 155
Ew hene.	ئێوان هه‌يانه. 156

Lê eger lêkera hebûnê di wateya hebûna tiştêkî kesekî li cîhekî da (wucûd-bûn) bê bikaranîn, li gor qayîdeyên dema niha ya soranî tevdigere, pêveber bi bikerê ra rêkdikeve û li gor bikerê cînavkên kesandinê ji koma bêhêz werdigire (Kurdo, 2021: 216). Mînak:

Kurmancî	سۆرانی
Ez heme.	من هه‌مه. 157
Tu heyî.	تۆ هه‌ییت. 158
Ew heye.	ئێو هه‌یه. 159
Em hene.	ئێمه هه‌ین. 160
Hûn hene.	ئێوه هه‌ن. 161

<sup>154</sup> Bi alfabeya latînî: Ême **hemane**.

<sup>155</sup> Bi alfabeya latînî: Êwe **hetane**.

<sup>156</sup> Bi alfabeya latînî: Ewan **heyane**.

<sup>157</sup> Bi alfabeya latînî: Min **heme**.

<sup>158</sup> Bi alfabeya latînî: To **heyît**.

<sup>159</sup> Bi alfabeya latînî: Ew **heye**.

<sup>160</sup> Bi alfabeya latînî: Ême **heyn**.

<sup>161</sup> Bi alfabeya latînî: Êwe **hen**.

Ew hene.	ئەوان هەن. <sup>162</sup>
----------	---------------------------

### 3.2.1.1.4. Ku di lêkerên Têper yê Hevedudanî da Bireser Veşartî Be

Di dema niha ya soranî da eger lêkerekê têper ya hevedudanî bê bikaranîn û bireser di hevokê da hebe û veşartî be, bireser bi yekem hêmana lêkera hevedanî ra rêkdikeve, biker jî bi dawî hêmana lêkerê ra rêkdikeve. Mînak

#### Lêker: Xoşxalkirdin

Kurmancî	سۆرانى
Tu me kêfxweş dikî.	تو خوشخالمان دهکەیت. (تو ئیمه خوشخال دهکەیت) <sup>163</sup>
Hûn wan kêfxweş dikin.	ئێوه خوشخالیان دهکەن. (ئێوه ئەوان خوشخال دهکەن) <sup>164</sup>

### 3.2.2. Rêkkeftina Soranî di Dema Bê da

Dema bê; kar, bûyer û rewşên ku di demeke piştî anhayê dê pêk werin ji me ra radigihîne. Dema bê ya soranî weke dema niha ya soranî li ser rayeka dema niha ya lêkeran çêdibe. Di soranî da weke kurmancî ji bo dema bê hêmaneke taybet (dê) û qertafeke taybet (bi) tunne ne. Dema bê ya soranî weke dema niha ya soranî çêdibe, wateya dema dahatû mirov bi saya hokeran li hevokê bar dike (Xoşnaw, 2021: 145; Emîn, 2014: 181).

<sup>162</sup> Bi alfabeya latînî: Ewan hen.

<sup>163</sup> Bi alfabeya latînî: To hoşxalman dekeyt. (To ême hoşxal dekeyt)

<sup>164</sup> Bi alfabeya latînî: Êwe hoşxalyan deken. (Êwe ewan hoşxal deken)

Ji hêla rêkkeftinê ve dîsa weke dema niha soranî di dema bê ya soranî da jî rêkkeftin di navbera biker û pêveberê da ye. Wate pêveber li gor bikerê teşe digire.

### **Bi Lêkerên Têper**

#### **Lêker: Nûsîn**

<b>Kurmancî</b>	<b>سۆرانی</b>
Ez ê sibe nameyan binivîsim.	من سبهینی نامهکان دهنوو سم. <sup>165</sup>
Tu yê sibe nameyan binivîsim.	تو سبهینی نامهکان دهنوو سیت. <sup>166</sup>
Ew ê sibe nameyan binivîse.	ئهو سبهینی نامهکان دهنوو سیت. <sup>167</sup>
Em ê sibe nameyan binivîsin.	ئیمه سبهینی نامهکان دهنوو سین. <sup>168</sup>
Hûn ê sibe nameyan binivîsin.	ئیهه سبهینی نامهکان دهنوو سن. <sup>169</sup>
Ew ê sibe nameyan binivîsin.	ئهوان سبهینی نامهکان دهنوو سن. <sup>170</sup>

### **Bi Lêkerên Têneper**

#### **Lêker: Royîştin**

<b>Kurmancî</b>	<b>سۆرانی</b>
-----------------	---------------

<sup>165</sup> Bi alfabeya latînî: Min sibeynî namekan denûs**im**.

<sup>166</sup> Bi alfabeya latînî: To sibeynî namekan denûs**ît**.

<sup>167</sup> Bi alfabeya latînî: Ew sibeynî namekan denûs**êt**.

<sup>168</sup> Bi alfabeya latînî: Ême sibeynî namekan denûs**în**.

<sup>169</sup> Bi alfabeya latînî: Êwe sibeynî namekan denûs**in**.

<sup>170</sup> Bi alfabeya latînî: Ewan sibeynî namekan denûs**in**.

Ez ê sibê biçim.	من بهیانی دهروم. <sup>171</sup>
Tu yê sibê biçî.	تو بهیانی دهرویت. <sup>172</sup>
Ew ê sibê biçê.	ئهو بهیانی دهروات. <sup>173</sup>
Em ê sibê biçin.	ئیمه بهیانی دهروین. <sup>174</sup>
Hûn ê sibê biçin.	ئیه بهیانی دهرون. <sup>175</sup>
Ew ê sibê biçin.	ئهوان بهیانی دهرون. <sup>176</sup>

Herdu mînakên têper û têneper ji me ra nîşan didin ku di dema bêya soranî da weke dema niha soranî rêkkeftin di navbera biker û pêveberê da ye. Pêveberan li gor bikerên hevokan cînavkên kesandinê yên koma bêhêz wergirtine.

### 3.2.3. Rêkkeftina Soranî di Demên Borî da

Dema borî bi giştî behsa ew bûyer û rewş û karan dike ku berî axaftinê pêk hatine. Demên borî yên soranî li ser rayeka dema borî ya lêkeran pêk tê û ew jî bi avêtina qertafa raderîn ji lêkeran bi dest dikeve (Marif, 2014: 200-201). Em dikarin bêjin bidestxistina rayeka dema borî ya soranî û kurmancî weke hev e.

Mînak:

Kird-in: Kird

---

<sup>171</sup> Bi alfabeya latînî: Min beyanî derom.

<sup>172</sup> Bi alfabeya latînî: To beyanî deroyt.

<sup>173</sup> Bi alfabeya latînî: Ew beyanî derwat.

<sup>174</sup> Bi alfabeya latînî: Ême beyanî deroyñ.

<sup>175</sup> Bi alfabeya latînî: Êwe beyanî deron.

<sup>176</sup> Bi alfabeya latînî: Ewan beyanî deron.

Bird-in: Bird

Bû-n: Bû

Hêna-n: Hêna

Di mijara rêkkeftina demên borî yên soranî da çend faktor hene ku di rêkkeftina hêmanên hevokê da xwedan bandor in. Ev:

### Eger Lêkera Pêveber Têper Be:

- Eger bireser hebe û di nav hevokê da eşkere be, bireser li gel bikerê rêkdikeve û cînavkên kesandinê yên koma bihêz werdigire (Emîn, 2009: 94, 163). Mînak:

ئێمه نانمان خوارد.<sup>177</sup>

- Eger bireser tune be û pêveber qertafa neyînî “ne”yê negire, biker bi pêveberê ra rêkdikeve û cînavkên kesandinê yên bihêz diçin dawîya pêveberê (Pijwe, 2020: 177) Mînak:

ئێمه نهمانخوارد.<sup>178</sup>

- Eger bireser tune be û pêveberê qertafa neyînîyê “ne” bigire, biker bi pêveberê ra rêkdikeve û cînavkên kesandinê yên koma bihêz dikevin navbera qertafa neyînî û rayeka lêkerê. Mînak:

ئێمه نهمانخوارد.<sup>179</sup>

---

<sup>177</sup> Bi alfabeya latînî: Ême nan**man** xward. (Kurmancîya vê hevokê: Me nan xwar)

<sup>178</sup> Bi alfabeya latînî: Ême xward**man**. (Kurmancîya vê hevokê: Me xwar)

<sup>179</sup> Bi alfabeya latînî: Ême n**eman**xward. (Kurmancîya vê hevokê: Me nexwar)

- Eger lêker, lêkereke pêkhatî be û bireser veşartî be yan jî mirov bi zanebûn dîyar neke, wê demê biker bi pêveberê ra rêkdikeve û cînavkên kesandinê yên koma bihêz dikevin navbera pêşgir û lêkerê (Marif, 2014: 194). Mînak:

ئێمه ههلمانیزارت.<sup>180</sup>

Weke tê dîtin cîhê cînavkên kesandinê yên bihêz li gor veşartîbûn an jî eşkerebûna bireserê û li gor hebûn an jî nebûna pêşgira lêkerê diguhêrin. Ji bilî van çend rewşên îstîsna hene, em ê wan li jêrê di bin serenaveke cuda da nîşan bidin.

### **Eger Lêkera Pêveber Têneper Be:**

- Weke dema niha û bêya soranî pêveber bi bikerê ra rêkdikeve û cînavkên kesandinê yên bêhêz werdigire. Mînak:

ئێمه خهوتین.<sup>181</sup>

Ji bilî rayeka dema borî ya lêkeran û wergirtina cînavkên kesandinê (li gor têperî, têneperî, eşkerebûn û veşartîbûna bireserê) her demeke borî ya soranî qertafeke wê ya demê heye. Tenê dema borîya têdayî li derveyî vê ye, ji ber ku rayeka sade ya dema borîya têdayî di heman demê da dema borîya têdayî ya soranî bi xwe ye. Niha jî ji bo ku em baştir rêkkeftina soranî di demên borî da fam bikin, yek bi yek li çêbûna wan mêze bikin.

#### **3.2.3.1. Dema Borî ya Têdayî**

Ev dem amaje bi wan bûyer û rewş û karan dike ku di demeke borî da pêk hatîye, teva bûye û mirov ji kesekî din nebihîstîye, bi xwe dîtîye, şahid bûye.

Dema borîya têdayî ku bi soranî jê ra dibêjin dema borîya sade an jî nêzîk bi xêra avêtina raderê ji lêkeran bi dest dikeve, ji bilî wê tu qertafeke taybet ya demê nagire (Dizeyî, 2014: 86).

---

<sup>180</sup> Bi alfabeya latînî: Ême hel**man**bijart. (Kurmancîya vê hevokê: Me hilbijart)

<sup>181</sup> Bi alfabeya latînî: Ême xew**tîn**. (Kurmancîya vê hevokê: Em raketin)

Ji hêla rêkkeftinê ve weke me li jorî jî got, dema ku lêkera pêveber têper be û bireser xuya be, bireser bi bikerê ra rêkdikeve û cînavkên kesandinê yên koma bihêz werdigire. Eger bireser veşartî be, pêveber bi bikerê ra rêkdikeve û cînavkên kesandinê yên koma bihêz werdigire. Gava ku lêkera pêveber teneper be, weke dema niha û bê pêveber bi bikerê ra rêkdikeve û cînavkên kesandinê yên koma bêhêz werdigire.

### **Bi Lêkera Têper (Dema ku Bireser Xuya Be)**

#### **Lêker: Nardin**

<b>Kurmancî</b>	<b>سۆرانی</b>
Min pirtûk şand.	من پەرتووکهکه <b>م</b> نارد. <sup>182</sup>
Te pirtûk şand.	تۆ پەرتووکهکه <b>ت</b> نارد. <sup>183</sup>
Wî/wê pirtûk şand.	ئەو پەرتووکهکه <b>ی</b> نارد. <sup>184</sup>
Me pirtûk şand.	ئێمه پەرتووکهکه <b>مان</b> نارد. <sup>185</sup>
We pirtûk şand.	ئێوه پەرتووکهکه <b>تان</b> نارد. <sup>186</sup>
Wan pirtûk şand.	ئەوان پەرتووکهکه <b>یان</b> نارد. <sup>187</sup>

<sup>182</sup> Bi alfabeya latînî: Min pertûkek**m** nard.

<sup>183</sup> Bi alfabeya latînî: To pertûkek**t** nard.

<sup>184</sup> Bi alfabeya latînî: Ew pertûke**key** nard.

<sup>185</sup> Bi alfabeya latînî: Ême pertûkek**man** nard.

<sup>186</sup> Bi alfabeya latînî: Êwe pertûkek**etan** nard.

<sup>187</sup> Bi alfabeya latînî: Ewan pertûke**keyan** nard.

Weke di mînanan da jî tê dîtin, bireserên hevokan xuya ne û lewma jî rêkkeftin di navbera biker û bireseran da çêbûye û bireseran cînavkên kesandinê yên koma bihêz li gor bikeran wergirtine.

### **Bi Lêkera Têper (Dema ku Bireser Veşartî Be)**

#### **Lêker: Nardin**

<b>Kurmancî</b>	<b>سۆرانی</b>
Min şand.	من ناردیم. <sup>188</sup>
Te şand.	تۆ ناردیت. <sup>189</sup>
Wî/wê şand.	ئهو ناردی. <sup>190</sup>
Me şand.	ئێمه ناردمان. <sup>191</sup>
We şand.	ئێوه ناردتان. <sup>192</sup>
Wan şand.	ئەوان ناردیان. <sup>193</sup>

Vê carê bireserên me di hevokan da veşartî ne û loma jî rêkkeftin di navbera biker û pêveberê da ye û pêveberan cînavkên kesandinê yên koma bihêz wergirtine.

### **Bi Lêkerên Têneper**

---

<sup>188</sup> Bi alfabeya latînî: Min nard**im**.

<sup>189</sup> Bi alfabeya latînî: To nard**it**.

<sup>190</sup> Bi alfabeya latînî: Ew nard**î**.

<sup>191</sup> Bi alfabeya latînî: Ême nard**man**.

<sup>192</sup> Bi alfabeya latînî: Êwe nard**tan**.

<sup>193</sup> Bi alfabeya latînî: Ewan nard**yan**.

## Lêker: Dabezîn

Kurmancî	سۆرانى
Ez daketim.	من دابەزیم. <sup>194</sup>
Tu daketî.	تۆ دابەزیت. <sup>195</sup>
Ew daket.	ئەو دابەزى. <sup>196</sup> ø
Em daketin.	ئێمه دابەزین. <sup>197</sup>
Hûn daketin.	ئێوه دابەزین. <sup>198</sup>
Ew daketin.	ئەوان دابەزین. <sup>199</sup>

Ji mînakên lêkera teneper tê famkirin ku dema ku lêkerekê teneper bê bikaranîn, rêkkeftin di navbera biker û pêveberê da dibe û ji ber ku lêker teneper e pêveber weke dema niha, cînavkên kesandinê yên koma bêhêz werdigire.

### 3.2.3.2. Çîrokîya Dema Borî ya Têdayî

Çîrokîya dema borî ku bi soranî jê ra rabirdûya dûr dibêjin behsa wan bûyer û rewş û karan dike ku di demeke borî ya pir berê axaftinê rûdane.

Çîrokîya dema borî ya soranî bi rayeka dema borî ya lêkeran û bi alîkarîya lêkera alîkar “bûn” ê çêdibe (Sheyholislami, 2020: 99). Ji ber ku ew jî demeke borî ya

---

<sup>194</sup> Bi alfabeya latînî: Min dabezîm.

<sup>195</sup> Bi alfabeya latînî: To dabezîyt.

<sup>196</sup> Bi alfabeya latînî: Ew dabezî.ø

<sup>197</sup> Bi alfabeya latînî: Ême dabezîyn.

<sup>198</sup> Bi alfabeya latînî: Êwe dabezîn.

<sup>199</sup> Bi alfabeya latînî: Ewan dabezîn.

soranî ye, lewma jî qayîdeyên demên borî ku me li jorê gotin, ji bo vê demê jî derbasdar in. Wate, rêkkeftina hêmanên hevokê û wergirtina wan ya cînavkên kesandinê yên komên bihêz û bêhêz li gor têperî û teneperîya lêkera pêveber û eşkerebûn û veşartîbûna bireserê ye.

### **Bi Lêkerên Têper (Dema ku Bireser Xuya Be)**

#### **Lêker: Dîtin**

<b>Kurmancî</b>	<b>سۆرانی</b>
Min tu dîtibûyî.	من تۆم دیتبوو. <sup>200</sup>
Te ez dîtibûm.	تۆ منت دیتبوو. <sup>201</sup>
Wî/wê ez dîtibûm.	ئهو منی دیتبوو. <sup>202</sup>
Me tu dîtibûyî.	ئیمه تۆمان دیتبوو. <sup>203</sup>
We ez dîtibûm.	ئیهه منتان دیتبوو. <sup>204</sup>
Wan ez dîtibûm.	ئهوان منیان دیتبوو. <sup>205</sup>

Lêkera me li vir têper e û bireserên me têda xuya ne, li gor qayîdeyên dema borî ya soranî cînavkên kesandinê yên bihêz li gor bikerên hevokan çûne dawîya

<sup>200</sup> Bi alfabeya latînî: Min **tom** dîtibû.

<sup>201</sup> Bi alfabeya latînî: To **minit** dîtibû.

<sup>202</sup> Bi alfabeya latînî: Ew **minî** dîtibû.

<sup>203</sup> Bi alfabeya latînî: Ême **to**man**** dîtibû.

<sup>204</sup> Bi alfabeya latînî: Êwe **mintan** dîtibû.

<sup>205</sup> Bi alfabeya latînî: Ewan **minyan** dîtibû.

bireseran. Wate, bireser bi bikeran ra rêkkeftine û cînavkên kesandinê yên koma bihêz li gor bikeran wergirtine.

### **Bi Lêkerên Têper (Dema ku Lêker Veşartî Be)**

#### **Lêker: Dîtin**

<b>Kurmancî</b>	<b>سۆرانی</b>
Min dîtibû.	من دیتبووم. <sup>206</sup>
Te dîtibû.	تو دیتبووت. <sup>207</sup>
Wî/wê dîtibû.	ئهو دیتبووی. <sup>208</sup>
Me dîtibû.	ئیمه دیتبوومان. <sup>209</sup>
We dîtibû.	ئیهه دیتبووتان. <sup>210</sup>
Wan dîtibû.	ئهوان دیتبوویان. <sup>211</sup>

Dema ku lêker têper be, lê bireser veşartî be, li gor qayîdeyên dema borî ya soranî divê cînavkên kesandinê yên bihêz biçin dawîya pêveberê. Di van mînakên jorê da jî wisa bûye û pêveber bi bikeran ra rêkkeftine û wan cînavkên kesandinê yên koma bihêz li gor kes û jimareya bikeran wergirtine.

<sup>206</sup> Bi alfabeya latînî: Min dîtibû**m**.

<sup>207</sup> Bi alfabeya latînî: To dîtibû**t**.

<sup>208</sup> Bi alfabeya latînî: Ew dîtibû**y**.

<sup>209</sup> Bi alfabeya latînî: Ême dîtibû**man**.

<sup>210</sup> Bi alfabeya latînî: Êwe dîtibû**tan**.

<sup>211</sup> Bi alfabeya latînî: Ewan dîtibû**yan**.

## Bi Lêkerên Têneper

### Lêker: Kewtin

Kurmancî	سۆرانى
Ez ketibûm.	من كهوتبووم. <sup>212</sup>
Tu ketibûyî.	تۆ كهوتبوویت. <sup>213</sup>
Ew ketibû.	ئهو كهوتبوو. <sup>214</sup> ø
Em ketibûn.	ئێمه كهوتبووین. <sup>215</sup>
Hûn ketibûn.	ئێوه كهوتبوون. <sup>216</sup>
Ew ketibûn.	ئەوان كهوتبوون. <sup>217</sup>

Vê carê lêkera me lêkerekê têneper e. Li gor qayîdeyên dema borî ya soranî dema ku lêker têneper be divê lêkera pêveber bi bikerê ra rêkbikeve û li gor bikeran cînavkên kesandinê yên bêhêz werbigirin. Di mînakên me da jî pêveber bi bikeran ra rêkkeftine û wan cînavkên kesandinê yên bêhêz li gor kes û jimareya bikerên xwe wergirtine.

---

<sup>212</sup> Bi alfabeya latînî: Min kewtibûm.

<sup>213</sup> Bi alfabeya latînî: To kewtibûyt.

<sup>214</sup> Bi alfabeya latînî: Ew kewtibû.ø

<sup>215</sup> Bi alfabeya latînî: Ême kewtibûyn.

<sup>216</sup> Bi alfabeya latînî: Êwe kewtibûn.

<sup>217</sup> Bi alfabeya latînî: Ewan kewtibûn.

### 3.2.3.3. Dema Borî ya Dûdar

Dema borîya dûdar (bi soranî rabirdûy tewaw) kar û bûyer û rewşên ku di dema borî da pêkhatine û encamên wê hîn jî berdewam in destnîşan dike. Dibe ku mirov hin bûyerên dema borî jî kesên din bibîze û hîn bibe, êdî ew bûyerên ku mirov bi xwe nedîtine, jî kesên din bihîstine û hîn bûye, ew jî dikevin dema borîya dûdar.

Di soranî da dema borîya dûdar bi rayeka dema borî ya lêkeran + bi qertafa “-û” an jî “-w”yê û bi qertafa “-e”yê çê çêdibe (Birzu, 2017: 83; Abi, 2018: 82-83). Piştî wan, dîsa li gor têperî û teneperîya lêkerê û veşartîbûn û eşkerebûna bireserê cînavkên kesane diçin yan dawîya pêveberê, yan jî diçin dawîya bireserê û rêkkeftin bi vî awayî çêdibe:

#### Bi Lêkera Têper (Dema ku Bireser Xuya Be)

##### Lêker: Gutin

Kurmancî	سۆرانی
Min stran gotîye.	من گۆرانیم گوتوووه. <sup>218</sup>
Te stran gotîye.	تو گۆرانیت گوتوووه. <sup>219</sup>
Wî/wê stran gotîye.	ئهو گۆرانیی گوتوووه. <sup>220</sup>
Me stran gotîye.	ئێمه گۆرانیمان گوتوووه. <sup>221</sup>
We stran gotîye.	ئێوه گۆرانیتان گوتوووه. <sup>222</sup>

<sup>218</sup> Bi alfabeya latînî: Min gora<sup>n</sup>im gutûwe.

<sup>219</sup> Bi alfabeya latînî: To gora<sup>n</sup>it gutûwe.

<sup>220</sup> Bi alfabeya latînî: Ew gora<sup>n</sup>iy gutûwe.

<sup>221</sup> Bi alfabeya latînî: Ême gora<sup>n</sup>iman gutûwe.

<sup>222</sup> Bi alfabeya latînî: Êwe gora<sup>n</sup>itan gutûwe.

Wan stran gotîye.	ئەوان گۆرانییان گوتووہ. <sup>223</sup>
-------------------	--

Ji mînakên jorê jî xuya dibe li gor qayîdeyên dema borî yê soranî dema ku bireser hebe, cînavkên kesandinê yê bihêz diçin dawîya bireserê û bireser bi bikerê ra rêkdikeve û bireser li gor bikerê cînavkên kesandinê yê koma bihêz werdigire.

### **Bi Lêkerên Têper (Dema ku Bireser Veşartî Be)**

#### **Lêker: Gutin**

Kurmancî	سۆرانی
Min gotîye.	من گوتووہ. <sup>224</sup>
Te gotîye.	تۆ گوتووہ. <sup>225</sup>
Wî/wê gotîye.	ئەو گوتووہتی. <sup>226</sup>
Me gotîye.	ئێمە گوتووہمانە. <sup>227</sup>
We gotîye.	ئێوہ گوتووہتانە. <sup>228</sup>
Wan gotîye.	ئەوان گوتووہیانە. <sup>229</sup>

<sup>223</sup> Bi alfabeya latîni: Ewan goraniyan gutûwe.

<sup>224</sup> Bi alfabeya latîni: Min gutûme.

<sup>225</sup> Bi alfabeya latîni: To gutûte.

<sup>226</sup> Bi alfabeya latîni: Ew gutûyetî.

<sup>227</sup> Bi alfabeya latîni: Ême gutûmane.

<sup>228</sup> Bi alfabeya latîni: Êwe gutûtane.

<sup>229</sup> Bi alfabeya latîni: Ewan gutûyane.

Di mînakên lêkera têper da ku vê carê bireser tê da veşartî ne cînavkên kesandinê yên bihêz li gor qayîdeya soranî ya dema borî çûne dawîya pêveberê û pêveber ji hêla kes û jimare ve bi bikerê ra rêkkeftine.

### **Bi lêkerên Têneper**

#### **Lêker: Royîştin**

<b>Kurmancî</b>	<b>سۆرانى</b>
Ez çûme.	من رۆیشتوو <b>مه</b> . <sup>230</sup>
Tu çûye.	تۆ رۆیشتوو <b>یت</b> . <sup>231</sup>
Ew çûye.	ئەو رۆیشتوو <b>ه</b> . <sup>232</sup>
Em çûne.	ئێمه رۆیشتوو <b>ین</b> . <sup>233</sup>
Hûn çûne.	ئێوه رۆیشتوو <b>ن</b> . <sup>234</sup>
Ew çûne.	ئەوان رۆیشتوو <b>ن</b> . <sup>235</sup>

<sup>230</sup> Bi alfabeya latînî: Min royiştû**me**.

<sup>231</sup> Bi alfabeya latînî: To royiştû**yt**.

<sup>232</sup> Bi alfabeya latînî: Ew royiştû**we**.

<sup>233</sup> Bi alfabeya latînî: Ême royiştû**yn**.

<sup>234</sup> Bi alfabeya latînî: Êwe royiştû**n**.

<sup>235</sup> Bi alfabeya latînî: Ewan royiştû**n**.

Weke di mînakên lêkera têneper da jî xuya dîkin dema ku lêker têneper be, cînavkên kesandinê yên bêhêz diçin dawîya pêveberê û pêveber ji hêla kes û jimare ve li gor bikerê teşe digire.

### 3.2.3.4. Dema Borî ya Berdewam

Dema borîya berdewam, di dema borî da wateya bi berdewamî çêbûna kar û rewş û bûyeran dide û behsa karekî dema borî dike ku berî karekî din hatîye kirin.

Dema borîya berdewam di soranî da bi qertafa “de-”yê ku diçe destpêka rayeka dema borî ya lêkeran çêdibe. Dîsa weke me li jorê gotî, li gor qayîdeyên rêkkeftina dema borî ya soranî hêmanên hevokê li gor têperî û têneperîya lêkera pêveber û eşkrebûn û veşartîbûna bireserê rêkdikevin. Eger lêker têneper bû, cînavkên kesandinê yên koma bêhêz diçin dawîya pêveberê. Eger lêker têper bû û bireser veşartî bûn, cînavkên kesandinê yên koma bihêz yên bikerê bi pêveberê ra rêkdikeve, bes vê carê naçin dawîya pêveberê, dikevin navbera “de-”yê û rayeka dema borî (Xoşnaw, 2015: 173, 174).

### Bi Lêkera Têper (Dema ku Bireser Xuya Be)

#### Lêker: Bîstin

Kurmancî	سۆرانی
Min tu dibihîstî.	من تۆم دهبیست. <sup>236</sup>
Te ez dibihîstim.	تۆ منت دهبیست. <sup>237</sup>
Wî/wê hûn dibihîstin.	ئهو ئێوهی دهبیست. <sup>238</sup>
Me ew dibihîstin.	ئێمه ئهوانمان دهبیست. <sup>239</sup>

<sup>236</sup> Bi alfabeya latînî: Min tom debîst.

<sup>237</sup> Bi alfabeya latînî: To minit debîst.

<sup>238</sup> Bi alfabeya latînî: Ew êwey debîst.

<sup>239</sup> Bi alfabeya latînî: Ême ewanman debîst.

We ez dibihîstim.	ئێوه منتان ده‌بیست. 240
Wan tu dibihîstî.	ئه‌وان تو‌یان ده‌بیست. 241

Ji mînakan bi başî tê famkirin ku dema ku lêker têper be û bireser eşkere be, bireser bi bikerê ra rêkdikeve û cînavka kesandinê ya bihêz werdigire dawîya xwe.

### **Bi Lêkera Têper (Dema ku Bireser Veşartî Be)**

#### **Lêker: Bîstin**

<b>Kurmancî</b>	<b>سۆرانی</b>
Min dibihîst.	من ده‌بیست. 242
Te dibihîst.	تو ده‌تبیست. 243
Wî/wê dibihîst.	ئهو ده‌بیست. 244
Me dibihîst.	ئیمه ده‌مانبیست. 245
We dibihîst.	ئێوه ده‌تانبیست. 246
Wan dibihîst.	ئه‌وان ده‌یانبیست. 247

<sup>240</sup> Bi alfabeya latînî: Êwe mintan debîst.

<sup>241</sup> Bi alfabeya latînî: Ewan toyan debîst.

<sup>242</sup> Bi alfabeya latînî: Min dembîst.

<sup>243</sup> Bi alfabeya latînî: To detbîst.

<sup>244</sup> Bi alfabeya latînî: Ew deybîst.

<sup>245</sup> Bi alfabeya latînî: Ême demanbîst.

<sup>246</sup> Bi alfabeya latînî: Êwe detanbîst.

<sup>247</sup> Bi alfabeya latînî: Ewan deyanbîst.

Di van mînakên jorê da dîsa lêkera me têper e, bes vê carê bireserên me veşartîne. Ji ber wê jî pêveber bi bikeran ra rêkkeftine, lê vê carê cînavkên kesandinê yên bihêz weke dema borîya têdayî, çîrokîya dema borî ya têdayî û dema borî ya dûdar neçûne dawîya pêveberê, ketine nav qertafa dema borîya berdewam “de-”yê û rayeka lêkerê.

### **Bi Lêkera Têneper**

#### **Lêker: Hatîn**

<b>Kurmancî</b>	<b>سۆرانی</b>
Ez dihatim.	من دهاتم. 248
Tu dihatî.	تۆ دهاتیت. 249
Ew dihat.	ئهو دهات. 250
Em dihatin.	ئێمه دهاتین. 251
Hûn dihatin.	ئێوه دهاتن. 252
Ew dihatin.	ئێوان دهاتن. 253

---

<sup>248</sup> Bi alfabeya latînî: Min dehat**im**.

<sup>249</sup> Bi alfabeya latînî: To dehat**ît**.

<sup>250</sup> Bi alfabeya latînî: Ew dehat.**ø**

<sup>251</sup> Bi alfabeya latînî: Ême dehat**în**.

<sup>252</sup> Bi alfabeya latînî: Êwe dehat**in**.

<sup>253</sup> Bi alfabeya latînî: Ewan dehat**in**.

Weke me li jorê jî got, dema ku lêker têneper be, di dema borîya berdewam ya soranî da pêveber li gel bikerê rêkdikeve û cînavkên kesandinê yên bêhêz werdigire û cînavkên kesandinê diçin dawîya pêveberê. Mînakên jorê bi zelalî vêya ji me ra dipeytîne.

### 3.2.3.5. Çend Îstîsna di Demên Borî yên Soranî da

#### 3.2.3.5.1. Dema ku Hevok Tenê ji Pêveberekê Pêk Were

Mîna ku di dema niha soranî da jî me dît, di zaravayê soranî da dibe ku hevok ji pêveberekê tenê pêk were, hingê eger lêkera pêveber têper be, pêveber bi herdu hêmanên hevokê ra, bi biker û bireserê ra rêkdikeve û cînavkên kesandinê li gor mêjer û kesandinê yên biker û bireserê werdigire. Di vê rewşê da, di dema niha ya soranî da pêveberê ji bo bireserê ji koma bihêz cînavkên kesandinê werdigirtin; ji bo bikerê jî ji koma bêhêz yên cînavkên kesandinê werdigirtin. Îca di dema borî da berovajî wê dibe. Ji bo bireserê ji koma bêhêz, ji bo bikerê jî ji koma bihêz cînavkên kesandinê werdigire (Pijwe, 2020: 131-132; Khalid, 2019: 41). Mînak:

#### Ji bo dema niha

<b>Kurmancî</b>	سۆرانی
Em wan dibin.	دهیانبەین. (ئیمه ئهوان دهبەین) <sup>254</sup>

#### Ji bo Dema Borî

<b>Kurmancî</b>	سۆرانی
Me ew birin.	بیردمان. (ئیمه ئهوانمان بێرد) <sup>255</sup>

<sup>254</sup> Bi alfabeya latînî: *Deyanbeyn*. (Ême ewan debeyn)

<sup>255</sup> Bi alfabeya latînî: *Birdmanin*. (Ême ewanman bird)

Dema em li mînakan mêze dikan, di dema niha da pêşî qertafa dema niha (de-) paşê ji bo bireserê cînavka kesandinê ji koma bihêz, piştire dema niha ya lêkerê û di dawîyê da jî ji bo bikerê cînavka kesandinê ji koma bêhêz rêz bûne û em dikarin bêjin pêveber bi bireseran ra jî bi bikeran ra rêkkeftine. Eger em ji bo dema niha vêya formûlûze bikin, bi vî awayî dibe:

De                      *yan*                      be                      *yn.*      (Ême ewan debeyn)<sup>256</sup>  
 ↑                      ↑                      ↑                      ↑  
 De + C. Bihêz (bo bireser) + Rayeka dema niha + C. Bêhêz (bo biker)

Dema em li mînaka dema borî mêze dikan, di dema borî da pêşî rayeka dema borî ya lêkerê, paşê ji bo bikerê cînavka kesandinê ji koma bihêz û di dawîyê da ji bo bireserê cînavka kesandinê ji koma bêhêz rêz bûne û dîsa pêveber hem bi bikerê ra hem jî bi bireserê ra rêkkeftiye. Eger ji bo dema borî em formûlûze bikin, bi vî awayî dibe:

Bird                                      *man*                                      *in.*      (Ême ewanman bird)<sup>257</sup>  
 ↑                                      ↑                                      ↑  
 Rayeka dema borî + C. Bihêz (bo biker) + C. Bêhêz (bo bireser)

### Çend Mînakên Din ji Dema Borî ra:

#### Lêker: Bînîn

Kurmancî	سۆرانی
Me tu dîtî.	بینیمانیت. (ئیمه تۆمان بینى) <sup>258</sup>

#### Lêker: Hênan

<sup>256</sup> Kurmancîya vê hevokê: Em wan dibin.

<sup>257</sup> Kurmancîya vê hevokê: Me ew birin.

<sup>258</sup> Bi alfabeya latînî: Bînî*manî*t. (Ême toman bînî)

<b>Kurmancî</b>	سۆرانى
Wan ew anî.	هینایان.ø (ئەوان ئەویان هینا) <sup>259</sup>
Wan ew anîn.	هینایانن. (ئەوان ئەوانیان هینا) <sup>260</sup>

### Lêker: Kuştin

<b>Kurmancî</b>	سۆرانى
We ew kuştin.	كوشتانن. (ئێوه ئەوانتان كوشت) <sup>261</sup>

### Lêker: Sûtandin

<b>Kurmancî</b>	سۆرانى
Min ew şewitand.	سووتاند.ø (من ئەوم سووتا) <sup>262</sup>

### Lêker: Bîstin

<b>Kurmancî</b>	سۆرانى
Te em bihîstin.	بیستین. (تو ئەمەت بیست) <sup>263</sup>

<sup>259</sup> Bi alfabeya latînî: Hênayan.ø (Ewan ewyan hêna)

<sup>260</sup> Bi alfabeya latînî: Hênayanin. (Ewan ewanyan hêna)

<sup>261</sup> Bi alfabeya latînî: Kuştanin. (Êwe ewantan kuşt)

<sup>262</sup> Bi alfabeya latînî: Sûtandim.ø (Min ewim sûtand)

<sup>263</sup> Bi alfabeya latînî: Bîstitîn. (To êmet bîst)

### Lêker: Xwardin

<b>Kurmancî</b>	سۆرانی
Wî/wê ew xwarin.	خواردین. (ئهو ئهوانی خوارد) <sup>264</sup>

Di vê rewşa soranî da ku biker û bireser li ser pêveberê kom dibe tişteki din bala mirovan dikişîne ku dişibe ergatîvîya kurmancî. Weke tê zanîn ergatîvî du aliyên wê hene. Yek dîyarkirina bikerê ye, duyem rêkkestina pêveberê bi bireserê ra ye (Pijwe, 2020: 45, 46). Di kurmancî da di demên borî da dema ku lêker têper bû, ergatîvî derdikeve. Îca dema em li van mînakên demên borî yên soranî mêze dikin, em dibînin ku pêveberan cînavkên kesandinê yên bêhêz li gor bireseran standine dawîya xwe. Ev jî nîşan dide ku soranî; wexta ku hevokên wê tenê ji pêvebereke têper pêk were, biker û bireser bi hev ra li ser pêveberê bêne nîşandan, taybetmendîya ergatîvîyê ya rêkkestina bireser û pêveberê nîşan dide.

Her çiqas me got di demên borî yên soranî da di van hevokên ku tenê ji pêvebereke têper pêk hatîye pêveber ji bo bikerê ji koma bihêz, ji bo bireserê ji koma bêhêz cînavkên kesandinê werdigire jî caran du cînavkên kesandinê ji koma bihêz ji bo nîşandana biker jî bireserê jî bi hev ra tên ser pêveberê. Di vir da ya pêşî dibe bireser, ya dawî dibe biker.” (Marif, 2014: 165). Mînak:

### Lêker: Birdin

<b>Kurmancî</b>	سۆرانی
We em birin.	بردمانتان. (ئیه ئیمهتان برد) <sup>265</sup>

### Lêker: Bîstin

---

<sup>264</sup> Bi alfabeya latînî: Xwardîyin. (Ew ewanî xward)

<sup>265</sup> Bi alfabeya latînî: Birdmantan. (Êwe êmetan bird)

<b>Kurmancî</b>	سۆرانى
Me tu bihîstî.	بىستمان. (ئىمه تۆمان بىست) <sup>266</sup>

### Lêker: Nardin

<b>Kurmancî</b>	سۆرانى
Wan hûn şandin.	ناردتانىان. (ئەوان ئىوھيان نارد) <sup>267</sup>

Li vir du tişt bala mirovan dikişîne. Yekem, li qayîdeya jorê ya dema borî da pêşî cînavka kesandinê ji koma bihêz li gor bikerê dihat, paşê cînavka kesandinê ya koma bêhêz ji bo bireserê dihat dawîya pêveberê. Lê li vir pêşî cînavkên kesandinê ji bo bireseran tên, cînavkên kesandinê yên bikeran jî diçin dawîya pêveberê. Ya duyem jî li qayîdeya jorê ya dema borî da ji bo bikerê ji koma bihêz, ji bo bireserê ji koma bêhêz cînavkên kesandinê dihatin, lê li vir ji bo herduyan jî ji koma cînavkên kesandinê yên bihêz cînavkên kesandinê hatine.

Eger em vê rêbaza dema borî ya duyem formûle bikin wiha dibe:

### Lêker: Hênan

Hêna                      *man*                      *yan*    (Ewan êmeyan hêna)<sup>268</sup>  
 ↑                              ↑                              ↑  
 Rayeka dema borî + C. Bihêz (bo bireser) + C. Bihêz (bo biker)

Û her wiha dibe ku dîsa cînavka kesandinê ji bo bireserê berî cînavka kesandinê ya bikerê were lê weke rêbaza yekem cînavka kesandinê ji bo bireserê ji koma bêhêz

<sup>266</sup> Bi alfabeya latînî: Bîst*man*. (Ême toman bîst)

<sup>267</sup> Bi alfabeya latînî: Nard*tanyan*. (Ewan êweyan nard)

<sup>268</sup> Kurmancîya vê hevokê: Wan em anîn.

dibe, ji bo bikerê jî cînavka kesandinê ji koma bihêz tèn bikaranîn, tenê cîhê rêzbûna wan diguhêre (Marif, 2014: 232). Mînak:

### Lêker: Girtin

Kurmancî	سۆرانی
Me tu girtî.	گرتیمان. (ئیمه تۆمان گرت) <sup>269</sup>
We ew girtin.	گرتنتان. (ئیهو ئهوانتان گرت) <sup>270</sup>
Wan em girtin.	گرتنیان. (ئهوان ئیمهیان گرت) <sup>271</sup>
Min tu girtî.	گرتیم. (من تۆم گرت) <sup>272</sup>

Weke di mînakan da jî tê dîtin di vê rewşê da cînavkên kesandinê yên koma bêhêz ji bo bireserê berî cînavka kesandinê ya bikerê hatîye. Lê dema em bala xwe didin vê rewşê jî û rewşên din jî tiştê ku naguhêre hatina cînavkên bihêz e ji bo bikeran. Ev cînavkên kesandinê yên bikeran çî li pêşî çî li paş qertafa bireseran be, her dem bikerê dinimîne û ji koma bihêz dibe.

### 3.2.3.5.2. Dema ku Lêkerekê Hevedudanî an jî Pêkhatî Bê Bikaranîn

#### Bi Lêkerekê Pêkhatî

Di demên borî yên soranî da dema ku lêkerekê têper ku bi pêşgireke çûbûyî bê bikaranîn, eger bireser veşartî be û mirov nexweze nîşan bide pêveber bi bikerê ra rêkdikeve û cînavkên koma bihêz ji bo bikerê dikevin navbera pêşgir û rayeka dema borî. Mînak:

### Lêker: Helbijartin

<sup>269</sup> Bi alfabeya latînî: Girtîman. (Ême toman girt)

<sup>270</sup> Bi alfabeya latînî: Girtintan. (Êwe ewantan girt)

<sup>271</sup> Bi alfabeya latînî: Girtinyan. (Ewan êmeyan girt)

<sup>272</sup> Bi alfabeya latînî: Girtîim. (Min tom girt)

Kurmancî	سۆرانی
Min hilbijart.	ههلمبژارت. 273
Te hilbijart.	ههلتبژارت. 274
Wî/wê hilbijart.	ههلببژارت. 275
Me hilbijart.	ههلمانبژارت. 276
We hilbijart.	ههلتانبژارت. 277
Wan hilbijart.	ههلبیانبژارت. 278

Lê dema ku mirov bixwaze bireserê jî bikerê jî nîşan bide, wê demê dîsa cînavkên bihêz ji bo bikerê dikevin navbera pêşgir û rayeka lêkerê û cînavkên bêhêz jî ji bo bireserê diçin dawîya lêkerê (Marif, 2014: 238).

Kurmancî	سۆرانی
Min tu hilbijartî.	ههلمبژارتیت. 279
Te em hilbijartin.	ههلتبژارتین. 280

<sup>273</sup> Bi alfabeya latînî: Hel**im**bijart. (Min hel**im**bijart)

<sup>274</sup> Bi alfabeya latînî: Hel**it**bijart. (To hel**it**bijart)

<sup>275</sup> Bi alfabeya latînî: Hel**îb**bijart. (Ew hel**îb**bijart)

<sup>276</sup> Bi alfabeya latînî: Hel**man**bijart. (Ême hel**man**bijart)

<sup>277</sup> Bi alfabeya latînî: Hel**tan**bijart. (Êwe hel**tan**bijart)

<sup>278</sup> Bi alfabeya latînî: Hel**yan**bijart. (Ewan hel**yan**bijart)

<sup>279</sup> Bi alfabeya latînî: Hel**im**bijart**î**. (Min tom**im** helbijart)

<sup>280</sup> Bi alfabeya latînî: Hel**it**bijart**în**. (To êmet hel**it**bijart)

Wî/wê ez hîlbijartim.	هه‌لیبێژارتیم. 281
Me hûn hîlbijartin.	هه‌لمانیبێژارتین. 282
We ew hîlbijart.	هه‌لتانیبێژارت. 283
Wan em hîlbijartin.	هه‌لیانیبێژارتین. 284

Mînakên jorê vêya ji mi re nîşan dide ku pêveber bi hem bi biker û hem jî bi bireseran ra rêkkeftine. Û ev lêkerên têper yên ku bi pêşgireke çêbûyî bi aliyê xwe yê rêkkeftina lêkera pêveber û bireserê ra taybetmendîya ergatîvîyê nîşan didin.

### **Bi Lêkerekê Hevedudanî**

Di demên borî yên soranî da gava ku lêkerekê hevedudanî bê bikaranîn û bireser veşartî be, wê demê cînavkên kesandinê yên bihêz ji bo bikerê diçin dawîya yekem peyva lêkera hevedudanî û eger mirov bixwaze bireserê nîşan bide, cînavkên bêhêz jî ji bo bireserê diçin dawîya hêmana dawî ya lêkera hevedudanî (Kurdo, 2021: 120).

#### **Mînak: Lêker: Xoşxal Kirdin**

<b>Kurmancî</b>	سۆرانی
Min tu kêfxweş kirî.	خۆشخالم کردیت. 285
Te ez kêfxweş kirim.	خۆشخالت کردیم. 286

<sup>281</sup> Bi alfabeya latînî: Hel**î**bijart**im**. (Ew min**î** helbijart)

<sup>282</sup> Bi alfabeya latînî: Hel**man**bijart**in**. (Ême êw**eman** helbijart)

<sup>283</sup> Bi alfabeya latînî: Hel**tan**bijart.**ø** (Êwe ew**tan** helbijart)

<sup>284</sup> Bi alfabeya latînî: Hely**an**bijart**in**. (Ewan êmey**an** helbijart)

<sup>285</sup> Bi alfabeya latînî: Xoşxal**im** kird**ît**. (Min tom xoşxal kird)

<sup>286</sup> Bi alfabeya latînî: Xoşxal**it** kird**im**. (To min**it** xoşxal kird)

Wî/wê ez kêfxweş kirim.	خوشخالی کردم. 287
Me tu kêfxweş kirî.	خوشخالمان کردیت. 288
We em kêfxweş kirin.	خوشخالتان کردین. 289
Wan ez kêfxweş kirim.	خوشخالیان کردم. 290

**Mînak: Lêker: Mandû Kirdin.**

Kurmancî	سۆرانی
Mî tu westandî.	ماندووم کردیت. 291
Te ez westandim.	ماندووت کردم. 292
Wî/wê tu westandî.	ماندووی کردیت. 293
Me ew westandin.	ماندوویمان کردین. 294
We ez westandim.	ماندووتان کردم. 295

<sup>287</sup> Bi alfabeya latînî: Xoşxalî kirdim. (Ew minî xoşxal kird)

<sup>288</sup> Bi alfabeya latînî: Xoşxalman kirdît. (Ême toman xoşxal kird)

<sup>289</sup> Bi alfabeya latînî: Xoşxaltan kirdîn. (Êwe êmetan xoşxal kird)

<sup>290</sup> Bi alfabeya latînî: Xoşxalyan kirdim. (Ewan minyan xoşxal kird)

<sup>291</sup> Bi alfabeya latînî: Mandûm kirdît. (Min tom mandû kird)

<sup>292</sup> Bi alfabeya latînî: Mandût kirdim. (To minit mandû kird)

<sup>293</sup> Bi alfabeya latînî: Mandûy kirdît. (Ew toy mandû kird)

<sup>294</sup> Bi alfabeya latînî: Mandûman kirdin. (Ême ewanman mandû kird)

<sup>295</sup> Bi alfabeya latînî: Mandûtan kirdim. (Êwe mintan mandû kird)

Dema em li mînakên mêze dikin; em dibînin ku yekem hêmanên lêkera hevedudanî bi bikeran ra, duyem hêmanên lêkera hevedudanî bi bireseran ra rêkkeftine. Li vir jî em dikarin bêjin soranî weke ergatîvîya kurmançî tev digere. Weke me berê jî got, di ergatîvîyê da divê pêveber bi bireserê ra rêkbikeve, gava em li mînakên vê rewşa soranî mêze dikin, em dibînin, di vê rewşê da jî dawî hêmana pêveberan bi bireseran ra rêkkeftine û wan ji hêla kes û jimare ve ew nimandine.

### 3.2.3.5.3. Dema ku Lêkereke Têper bi Cînavkeke Lihevxiştî Were Bikaranîn

Di demên borî yên soranî da wexta ku lêkereke têper tevî cînavkeke lihevxiştî bê bikaranîn, cînavkên kesandinê yên bihêz ji bo nîşandana bikerê diçin dawîya cînavka lihevxiştî û cînavkên kesandinê yên bêhêz jî ji bo nîşandana bireseran diçin dawîya pêveberê (Mehwî, 2001: 57, 178). Lê divê mirov ji bîr neke ku ev rewş dema ku daçek û cînavk bi awayekî lihevxiştî bê bikaranîn çêdibe, eger na, dîsa tenê bireser bi bikerê ra rêkdikeve. Mînak:

#### Lêker: Pêgutin

Kurmançî	سۆرانی
Min ji te ra got.	پێم گویت. (من به تۆم گوت) <sup>297</sup>
Te ji min ra got.	پیت گوتم. (تۆ به منیت گوت) <sup>298</sup>
Wî/wê ji min ra got.	پێی گوتم. (ئهو به منی گوت) <sup>299</sup>

<sup>296</sup> Bi alfabeya latînî: Mandûyan kirdin. (Ewan êweyan mandû kird)

<sup>297</sup> Bi alfabeya latînî: Pêm gutît. (Min be tom gut)

<sup>298</sup> Bi alfabeya latînî: Pêt gutim. (To be minit gut)

<sup>299</sup> Bi alfabeya latînî: Pêy gutim. (Ew be minî gut)

Me ji we ra got.	پێمان گوتن. (ئێمه به ئێوهمان گوت) <sup>300</sup>
We ji wî/wê ra got.	پێتان گوت. $\emptyset$ (ئێوه به ئهوتان گوت) <sup>301</sup>
Wan ji me ra got.	پێیان گوتن. (ئهوێان به ئێمهیان گوت) <sup>302</sup>

### Lêker: Lêdan

Kurmancî	سۆرانی
Mi li te da.	لێم دایت. (من له تۆم دا) <sup>303</sup>
Te li min da.	لێت دام. (تو له منت دا) <sup>304</sup>
Wî/wê li me da.	لێی داين. (ئهو له ئێمه ی دا) <sup>305</sup>
Me li wan da.	لێمان دان. (ئێمه له ئهوانمان دا) <sup>306</sup>
We li wî/wê da.	لێتان دا. $\emptyset$ (ئێوه له ئهوتان دا) <sup>307</sup>
Wan li min da.	لێیان دام. (ئهوێان له منیان دا) <sup>308</sup>

<sup>300</sup> Bi alfabeya latîni: Pêman gutin. (Ême be êweman gut)

<sup>301</sup> Bi alfabeya latîni: Pêtan gut.  $\emptyset$  (Êwe be ewtan gut)

<sup>302</sup> Bi alfabeya latîni: Pêyan gutin. (Ewan be êmayan gut)

<sup>303</sup> Bi alfabeya latîni: Lêm dayt. (Min le tom da)

<sup>304</sup> Bi alfabeya latîni: Lêt dam. (To le minit da)

<sup>305</sup> Bi alfabeya latîni: Lêy dayn. (Ew le êmey da)

<sup>306</sup> Bi alfabeya latîni: Lêman dan. (Ême le ewanman da)

<sup>307</sup> Bi alfabeya latîni: Lêtan da.  $\emptyset$  (Êwe le ewtan da)

<sup>308</sup> Bi alfabeya latîni: Lêyan dam. (Ewan le minyan da)

Ji mînakên jorê jî em dibînin cînavkên kesandinê yên koma bihêz ji bo bikeran çûne dawîya cînavkên lihevxiştî, cînavkên kesandinê yên koma bêhêz jî ji bo bireseran çûne dawîya lêkera pêveber. Soranî di demên borî da bi van lêkerên xwe yên cînavkên lihevxiştî jî bi alîyê xwe yê rêkkeftina pêveber û bireserê ra taybetmendîya ergatîvîyê pêşan dide.

#### 3.2.3.5.4. Bikaranîna Lêkera Hebûnê di Wateya Xwedîtîyê da

Di demên borî yên soranî da eger lêkera hebûnê di wateya xwedîtîyê da bê bikaranîn û bireser bê xuyakirin, biker bi bireserê ra rêkdikeve û bireser cînavkên kesandinê yên koma bihêz li gor bikerê werdigire (Kurdo, 2021: 222). Mînak:

Kurmancî	سۆرانی
Nanê min hebû.	من نانم هه‌بوو. <sup>309</sup>
Nanê te hebû.	تۆ نانت هه‌بوو. <sup>310</sup>
Nanê wî/wê hebû.	ئهو نانی هه‌بوو. <sup>311</sup>
Nanê me hebû.	ئێمه نانمان هه‌بوو. <sup>312</sup>
Nanê we hebû.	ئێوه نانتان هه‌بوو. <sup>313</sup>
Nanê wan hebû.	ئهووان نانیان هه‌بوو. <sup>314</sup>

Eger lêkera hebûnê dîsa di wateya xwedîtîyê da bê bikaraanîn û di hevokan da bireser neyê xuyakirin; biker bi pêveberê ra rêkdikeve, pêvever li gor bikerê cînavkên

<sup>309</sup> Bi alfabeya latînî: Min nan**im** hebû.

<sup>310</sup> Bi alfabeya latînî: To nan**it** hebû.

<sup>311</sup> Bi alfabeya latînî: Ew nan**î** hebû.

<sup>312</sup> Bi alfabeya latînî: Ême nan**man** hebû.

<sup>313</sup> Bi alfabeya latînî: Êwe nan**tan** hebû.

<sup>314</sup> Bi alfabeya latînî: Ewan nan**yan** hebû.

kesandinê yên koma bihêz werdigire. Cînavkên kesandinê yên bihêz dikevin navbera rayekên “he” û “bû”yê (Kurdo, 2021: 222). Mînak:

Kurmancî	سۆرانی
Yê min hebû.	من هه‌مبوو. <sup>315</sup>
Yê te hebû.	تۆ هه‌تبوو. <sup>316</sup>
Yê wî/wê hebû.	ئهو هه‌یبوو. <sup>317</sup>
Yê me hebû.	ئێمه هه‌مانبوو. <sup>318</sup>
Yê we hebû.	ئێوه هه‌تانبوو. <sup>319</sup>
Yê wan hebû.	ئهووان هه‌یانبوو. <sup>320</sup>

Lê eger lêkera hebûnê di wateya xwedîtîyê da ne, di wateya hebûna tiştêkî, kesekî li cîhekî bê bikaranîn, hingê lêkera hebûnê weke têneper tê qûbûlîkirin û rêkkekîftin di navbera biker û pêveberê da çêdibe, lê vê carê pêveber cînavkên kesandinê yên koma bêhêz li gor bikerê werdigire (Marif, 2014: 275). Mînak:

Kurmancî	سۆرانی
----------	--------

<sup>315</sup> Bi alfabeya latînî: Min hembû.

<sup>316</sup> Bi alfabeya latînî: To hetbû.

<sup>317</sup> Bi alfabeya latînî: Ew heybû.

<sup>318</sup> Bi alfabeya latînî: Ême hemanbû.

<sup>319</sup> Bi alfabeya latînî: Êwe hetanbû.

<sup>320</sup> Bi alfabeya latînî: Ewan heyانبû.

Ez hebûm.	من هه‌بووم. <sup>321</sup>
Tu hebûyî.	تۆ هه‌بوویت. <sup>322</sup>
Ew hebû.	ئهو هه‌بوو. <sup>323</sup>
Em hebûn.	ئێمه هه‌بووین. <sup>324</sup>
Hûn hebûn.	ئێوه هه‌بوون. <sup>325</sup>
Ew hebûn.	ئێوان هه‌بوون. <sup>326</sup>

Wekî em ji mînakan dibînin lêkera hebûnê vê carê di wateya wucûd-bûnê da hatîye bikaranîn, lewma jî weke teneper hatîye qebûlîkirin. Ji ber vê jî li gor qayîdeya rêkkestina demên borî yên soranî rêkkestin di navbera biker û pêveberê da çêbûye, pêveberan ji koma bêhêz ya cînavkên kesandinê li gor bikerê wergirtine.

#### 3.2.4. Rêkkestina Soranî di Tebatîyê da

Tebatîya soranî li ser rayeka dema niha ya lêkerên têper û bi saya morfema tebatî çêker (-r) yê çêdibe. Ji bilî van, mirov qertafên deman (-ê ji bo dema niha, -a ji bo demên borî) li lêkerê zêde dike (Xoşnaw, 2016:107, 108, 109).

---

<sup>321</sup> Bi alfabeya latînî: Min hebûm.

<sup>322</sup> Bi alfabeya latînî: To hebûyt.

<sup>323</sup> Bi alfabeya latînî: Ew hebû.ø

<sup>324</sup> Bi alfabeya latînî: Ême hebûyn.

<sup>325</sup> Bi alfabeya latînî: Êwe hebûn.

<sup>326</sup> Bi alfabeya latînî: Ewan hebûn.

Ji hêla rêkkeftinê ve wexta ku rewşa tebatîyê çêbe, di hemû demên soranî da pêveber bi biresera ku şûna bikerê digire ra rêkdikeve û cînavkên kesandinê yên koma bêhêz li gor wê bireserê werdigire ku şûna bikerê girtîye.

Eger em pergela tebatî ya soranî nîşan bidin wisa dibe:

Rayeka dema niha ya lêkera têper + Qertafa tebatîyê (r) + Qertafa demê (-ê, -a)+ C.  
Bêhêz

### Dema niha

#### Lêker: Bînin, rayeka dema niha “bîn”

Kurmancî	سۆرانى
Ez tēm dîtin.	من دەبینرێم. <sup>327</sup>
Tu tēyî dîtin.	تۆ دەبینرێیت. <sup>328</sup>
Ew tē dîtin.	ئەو دەبینرێت. <sup>329</sup>
Em tēn dîtin.	ئێمه دەبینرێین. <sup>330</sup>
Hûn tēn dîtin.	ئێوه دەبینرێن. <sup>331</sup>
Ew tēn dîtin.	ئەوان دەبینرێن. <sup>332</sup>

<sup>327</sup> Bi alfabeya latînî: Min debînîrê**m**.

<sup>328</sup> Bi alfabeya latînî: To debînîrê**yt**.

<sup>329</sup> Bi alfabeya latînî: Ew debînîrê**t**.

<sup>330</sup> Bi alfabeya latînî: Ême debînîrê**yn**.

<sup>331</sup> Bi alfabeya latînî: Êwe debînîrê**n**.

<sup>332</sup> Bi alfabeya latînî: Ewan debînîrê**n**.

## Dema borî

Kurmancî	سۆرانى
Ez hatim dîtin.	من بىنرام. <sup>333</sup>
Tu hatî dîtin.	تۆ بىنرايت. <sup>334</sup>
Ew hat dîtin.	ئەو بىنرا. <sup>335</sup>
Em hatin dîtin.	ئىمه بىنراين. <sup>336</sup>
Hûn hatin dîtin.	ئىوه بىنران. <sup>337</sup>
Ew hatin dîtin.	ئەوان بىنران. <sup>338</sup>

Weke di mînakan da jî bi zelalî tê dîtin, di zaravayê soranî da gava ku rewşa tebatîyê hebe, pêveber bi biresera ku şûna bikerê girtî ra rêkdikeve û cînavka wê ya kesandinê li gor kesandin û mêjera wê werdire.

---

<sup>333</sup> Bi alfabeya latînî: Min bînram.

<sup>334</sup> Bi alfabeya latînî: To bînrayt.

<sup>335</sup> Bi alfabeya latînî: Ew bînra.

<sup>336</sup> Bi alfabeya latînî: Ême bînrayn.

<sup>337</sup> Bi alfabeya latînî: Êwe bînran.

<sup>338</sup> Bi alfabeya latînî: Ewan bînran.

## ENCAM

Me di vê xebata xwe da zaravayên kurmancî û soranî ji hêla rêkkeftinên hêmanên hevokê (bireser, biker, pêveber) ve berawird kirin. Me xebata xwe li gor pêkarên weke dem, têperî û têneperîya lêkeran kir. Encamên ku me dest xistine ev in:

Di dema niha da rêkkeftinên soranî û kurmancî ji bilî çend îstîsnayan weke hev in. Bikerên wan bi pêveberên wan ra rêkdikevin. Bes di soranî da ji bo lêkera têper “wîstin”ê û lêkera “hebûn”ê û di lêkerên hevedudanî yên têper da bireser veşartî be; di kurmancî da jî ji bo lêkerên “vîyan”, “hebûn” û “pêveberên tecrûbekar” û dema ku hinek cînavkên kesane weke “temamkerê bikerê” di hevokên “kopulayî” da bêne bikaranîn rewşên cuda û derasayî derdikevin.

Di dema niha ya soranî da dema ku lêkera wîstinê weke pêveber tê bikaranîn û bireser jî xuya be, bireser bi bikerê ra rêkdikeve; dema ku bireser xuya nebe, pêveber bi bikerê ra rêkdikeve. Di van her du rewşên ku lêkera “wîstin”ê di dema niha ya soranî tê bikaranîn, pêveber an jî bireser ji bo nimandina bikerê cînavkên kesandinê ji koma bêhêz ne, ji koma bihêz werdigire.

Lêkera hebûnê jî lêkereke din e ku di dema niha ya soranî da derqayîdeya rêkkeftina dema niha ya soranî tev digere. Eger lêkera hebûnê di wateya xwedîtîyê da bê bikaranîn, weke têper tê qebûlkirin û di vê rewşê da bireser jî di hevokê da bê bikaranîn, rêkkeftin berovajî qayîdeyên dema niha ya soranî di navbera biker û pêveberê da na, di navbera bireser û bikerê da çêdibe, bireser cînavkên kesandinê ji koma bihêz li gor bikerê werdigire. Lê eger bireser xuya nebe, îcar rêkkeftin di navbera biker û pêveberê da çêdibe lê dîsa berovajî qayîdeyên rêkkeftina dema niha ya soranî pêveber cînavkên kesandinê ji bo bikerê ji koma bêhêz na, ji koma bihêz werdigire.

Di dema niha ya soranî da eger lêkereke hevedudanî ya têper bê bikaranîn û bireser veşartî be; yekem hemana lêkera hevedudanî bi biresera veşartî ra rêkdikeve û cînavkên kesandinê yên koma bihêz werdigire, dawî hêmana lêkera hevedudanî jî bi bikerê ra rêkdikeve û cînavkên kesandinê yên koma bêhêz werdigire.

Xaleke din ya soranî ku me di rêkkeftina dema niha ya soranî da dest nîşan kirîye ew e ku lihevcivandina hevokê li ser pêveberê ye di vî zaravayî da. Gava ku

hevok tenê ji lêkerekê têper pêk were û mirov bixwaze bireserê nîşan bide, wê demê lêkera têper ya pêveber hem bi bikerê ra hem jî bi bireserê ra rêkdikeve û ji bo nîşandana bikerê ji koma bêhêz, ji bo bireserê jî ji koma bihêz cînavkên kesandinê werdigere.

Di dema niha ya kurmancî da (di devoka kurmancî ya başûrê rojhilat da) wexta ku lêkera têper “vîyan” weke pêveber tê bikaranîn û bireser jî xuya be, pêveber bi bikerê ra na, bi bireserê rêkdikeve û li gor wê cînavkên kesandinê werdigere. Lê eger bireser xuya nebe, pêveber bêalî dimîne û di rewşa sifir da dibe. Tişteki din yê balkêş jî ji bo kurmancî di dema niha da dema ku ev lêker (vîyan) tê bikaranîn, rewşeke weke ergatîvîya kurmancî derdikeve, akûzatîfa kurmancî ya di dema niha da berovajî dibe, biker xwerû na tewandî dibe, bireser jî tewandî na xwerû dibe.

Di dema niha ya kurmancî da (di devoka kurmancî ya başûrê rojhilat da) dema ku lêkera “hebûn” weke xwedîtîyê bê bikaranîn, di hevokê da ravekerên ravekan weke tewandî diçin destpêka hevokê û bi rolê bikerê radibin. Di vê rewşê da di lêkera hebûnê bi bikerê ra rêknakeve, bi bireserê rêkdikeve li gor bireseran cînavkên kesandinê werdigere û rewşeke derasayî ya dema niha ya kurmancî derdikeve.

Dîsa devoka kurmancî ya başûrê rojhilat da eger lêkerên tecrûbekar bîn bikaranîn, rêkkeftin di navbera biker û pêveberê da nabe, lêker li gor kesê sêyem yê yekjimar teşe digire, biker jî tewandî dibe.

Xaleke din ya derasayî ya rêkkeftina dema niha ya kurmancî jî hevokên kopulayî ye. Di wan hevokên kopulayî da gava ku hinek cînavkên kesane weke tamamkerê bikerê bêne bikaranîn, rêkkeftin di navbera biker û pêveberê da nabe, di nav bera pêveber û tamamkerê bikerê da dibe. Ev rewşa derasayî ya rêkkeftina dema niha ya kurmancî di van hevokan da derdikeve: Gava ku biker kesê duyem yê yekjimar (tu) be û tamamkerê bikerê kesê yekem yê yekjimar (ez) be. Wexta ku kesê sêyem yê yekjimar (ew) biker be; kesê yekem yê yekjimar (ez), kesê duyem yê yekjimar (tu), kesê yekem yê pirjimar (em), kesê duyem yê pirjimar (hûn) û kesê sêyem yê pirjimar (ew) tamamkerê bikerê bin. Dema ku kesê yekem yê pirjimar (em) biker be, kesê yekem yê yekjimar (ez), tamamkerê bikerê be. Gava ku kesê duyem yê pirjimar (hûn) biker be, kesê yekem yê yekjimar (ez) û kesê duyem yê yekjimar (tu) tamamkerê bikerê

bin. Wexta ku kesê sêyem yê pirjimar (ew) biker be, kesê yekem yê yekjimar (ez) û kesê duyem yê yekjimar (tu), tamamkerê bikerê bin.

Rêkkeftinên dema bêya kurmancî û soranî weke rêkkeftinên wan yên dema niha ne û cudahiyeke berbiçav me tespît nekiriye.

Di demên borî da her çiças hinek rêkkeftinên soranî û kurmancî bişibin hevdu jî ji gelek alîyan ve jî cuda dibin.

Di demên borî da eger lêkera pêveber têneper bû, pêveberên herdu zaravan jî bi bikeran ra rêkdikevin û pêveber cînavkên kesandinê li gor bikeran werdigirin. Lê dema ku lêkera pêveber têper bû, rewşên ji hev cihê derdikevin.

Di demên borî yên soranî da eger lêkerekê têper pêveber bû û bireser xuya bû, bireser bi bikerê ra rêkdikeve û cînavkên kesandinê yên koma bihêz werdigire. Dema ku lêkerekê têper pêveber bû û bireser xuya nebû, pêveber bi bikerê ra rêkdikeve û cînavkên kesandinê yên koma bihêz li gor bikerê werdigire.

Di demên borî yên soranî da gava ku lêkerekê têper pêveber bû û hevok tenê ji pêveberekê pêk hat, pêveber hem bi bikerê ra hem bi bireserê ra rêkdikeve. Di wê rewşê da pêveber ji bo bikerê ji koma bihêz, ji bo bireserê jî ji koma bêhêz cînavkên kesandinê werdigire. Lê rêbaza wisa jî heye ku pêveber dibe ku hem ji bo bikerê hem jî ji bo bireserê ji koma bihêz cînavkên kesandinê werdigire.

Di demên borî yên soranî da dema ku lêkerekê hevedudanî ya têper weke pêveber bê bikaranîn û biker û bireser neyên bilêvkin, beşa yekem ya lêkera hevedudanî bi bikerê ra rêkdikeve, ji bo nîşandana bikerê ji koma bihêz cînavkên kesandinê werdigire, beşa duyem ya lêkera hevedudanî jî bi bireserê ra rêkdikeve û ji bo nîşandana bireserê ji koma bêhêz cînavkên kesandinê werdigire. Em dikarin bibêjin di vê rewşê da soranî taybetmendiyên ergatîvîyê nîşan dide, ji ber ku beşa duyem ya pêveberê bi bireserê ra rêkdikeve.

Di demên borî yên soranî da wexta ku lêkerekê têper tevî cînavkeke lihevxiştî bê bikaranîn û biker û bireser neyên xuyakirin, cînavka lihevxiştî bi bikerê ra rêkdikeve û ji bo nimandina bikerê ji koma bihêz cînavkên kesandinê werdigire. Beşa duyem ya

lêkerê jî bi bireserê ra rêkdikeve û ji bo nimandina bireserê ji koma bêhêz cînavkên kesandinê werdigire. Li vir jî em dikarin bibêjin soranî taybetmendiyên ergatîvîyê nîşan dide, ji ber ku dîsa beşa duyem ya pêveberê bi bireserê ra rêkdikeve.

Kurmancî di demên borî da dema ku lêkereke têper weke pêveber bi kar tîne, rewşa ergatîvî derdikeve û pêveberên wan bi biresera rasterast (xwerû) ra rêkdikeve û pêveber bireserê ji hêla kes û jimare ve dinimînin.

Di demên borî yên kurmancî da dema ku kesê sêyem yê pirjimar (wan) weke biker bê bikaranîn, xuya nebe an jî ji ew biker ji pêveberê dûr bikeve, qayîdeya ergatîvîyê tê bînpêkirin û pêveber bi bireserê ra na, bi kesê sêyem yê yekjimar ra ku veşartî ye rêkdikeve. Lê dema ku ew hevok bibe bersîveke pirsekê ku bikera kesê sêyem yê yekjimar tê da bikera veşartî be, wê demê qayîdeya ergatîvîyê parastî dimîne û pêveber bi bireserê ra rêkdikeve.

Di demên borî yên kurmancî da gava ku cînavka vegerok (xwe) û cînavka berbihevîn (hevdu) weke bireser bînan bikaranîn, bireser weke yekjimar tê qebûl kirin û pêveber li gor wê teşe digire, ji hêla wergirtina cînavkên kesandinê ve bêalî dimîne û di rewşa sifir da dibe.

Di demên borî yên kurmancî da gava ku lêkereke têper ya ku bi cînavkeke lihevxiştî çêbûyî bê bikaranîn, ergatîvîya kurmancî tê bînpêkirin û bireser yekjimar jî be, pirjimar jî be, pêveber her dem bireserê yekjimar qebûl dike û rêkkeftin li gor wê dibe, wate pêveber di wergirtina cînavkên kesandinê da di rewşa sifir da dibe. Lê eger ew lêkera têper ya ku bi cînavkeke lihevxiştî pêkhatî bireseran negire nav xwe, qayîdeya ergatîvî parastî dimîne û pêveber bi bireserê ra rêkdikeve û li gor wê teşe digire.

Gava ku di demên borî yên kurmancî da lêkereke tîneper ya espektîf û lêkereke têper di heman hevokêda bibin pêveberên bikera hevpar, bikaranîneke wisa derdikeve ku dibe ku ji bo pêvebera tîneper bikera xwerû dernekeve, bikera tewandî dibe ku bibe bikera lêkera tîneper ya pêveber jî. Di vê rewşê da pêvebera tîneper di rewşa sifir da dibe, ji hêla rêkkeftinê ve û ji hêla wergirtina cînavkên kesandinê ve bêalî dimîne. Lê

pêvebera têper dîsa li gor ergatîvîya kurmancî li gor bireserê cînavkên kesandinê werdigire.

Wekî dema niha ya kurmancî di demên borî yên kurmancî da jî di devoka kurmancî ya başûrê rojhilat da eger lêkera “hebûn”ê di wateya xwedîtîyê da bê bikaranîn; pêveber bi bikerê ra na, bi bireserê ra rêkdikeve û biker tewandî, bireser xwerû dibe.

Di demên borî yên kurmancî da di devoka kurmancî ya başûrê rojhilat da weke dema niha ya kurmancî eger lêkerên tecrûbekar bîn bikaranîn, dîsa rêkkeftin di navbera biker û pêveberê da nabe, lêker li gor kesê sêyem yê yekjimar teşe digire (wate di rewşa sifir da dibe), biker jî tewandî dibe.

Dîsa weke dema niha ya kurmancî di demên borî da jî ku di hevokên kopulayî da hin cînavk weke tamamkerê bikerê bêne bikaranîn, pêveber bi bikerê ra na, bi tamamkerê bikerê ra rêkdikeve. Ew rêkkeftina derasayî ya demên borî yên kurmancî di van rewşan da derdikeve. Wexta ku kesê sêyem yê yekjimar (ew) biker be; kesê yekem yê yekjimar (ez), kesê duyem yê yekjimar (tu), kesê yekem yê pirjimar (em), kesê duyem yê pirjimar (hûn) û kesê sêyem yê pirjimar (ew) tamamkerê bikerê bin. Wexta ku kesê sêyem yê pirjimar (ew) biker be, kesê yekem yê yekjimar (ez) û kesê duyem yê yekjimar (tu) tamamkerê bikerê bin. Gava ku biker kesê duyem yê yekjimar (tu) be û tamamkerê bikerê kesê yekem yê yekjimar (ez) be. Dema ku kesê yekem yê pirjimar biker (em) be, kesê yekem yê yekjimar (ez) tamamkerê bikerê be. Gava ku kesê duyem yê pirjimar (hûn) biker be, kesê yekem yê yekjimar (ez) û kesê duyem yê yekjimar (tu) tamamkerê bikerê bin.

Tevî ku çêbûna tebatîya herdu zaravayên kurmancî û soranî ji hev cuda jî bin, awayê rêkkeftina wan weke hev e. Rêkkeftina herdu zaravayan jî di navbera pêveber û biresera ku şûna bikerê girtîyê ra ye. Di zaravayê kurmancî da bi lêkera alîkar “hatin”ê tebatî tê çêkirin û cînavkên kesandinê li gor biresera ku şûna bikerê girtî diçin dawîya vê lêkerê. Di zaravayê soranî da tebatî ji bilî çend lêkerên îstîsna li ser rayeka dema niha ya lêkeran çêdibe. Morfema tebatî çêker (-r-) û morfemên deman (-ê), (-a) li rayeka dema niha ya lêkeran tê zêdekirin û cînavkên kesandinê yên koma bêhêz jî li gor biresera ku şûna bikerê girtî diçin dawîya lêkera pêveber.

## ÇAVKANÎ

Abdullah, S. H. (2021). *Cînav ji Hêla Wateyê ve (Di Navbera Kurmancîya Navîn û Kurmancîya Jorîn da)*. Van: Van Yüzüncü Yıl Üniversitesi Yaşayan Diller Enstitüsü Kürt Dili ve Kültürü Anabilim Dalı.

Abi, A. (2018). *Di Kurmanciya Jorîn û Kurmanciya Nawerast de Qertafên Lêkeran*. 2018: Zaningeha Wan Yüzüncü Yılê Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî.

Ağca, E. (2020). *Türk Dilinin Tarihsel Diyalektolojisi -Harezmi-Altın Ordu Sahasına Ait Türkçe Metinler-*. Eskişehir: Eskişehir Osmangazi Üniversitesi Sosyal Bilimler Enstitüsü.

Aksan, D. (2020). *Her Yönüyle Dil Ana Çizgileriyle Dilbilim*. Ankara: Türk Dil Kurumu Yayınları.

Arîstoteles. (2018). *Yorum Üzerine*. (S. Babür, Çev.) Ankara: İmge Kitabevi.

Arîstoteles. (2022). *Poetika*. (Ö. A. Ari Çokana, Çev.) İstanbul: Türkiye İş Bankası Yayınları.

Arslan, İ. (2016). Zaza Dilinde Ergatif Sistemin Tarihsel Gelişimi. *Munzur Üniversitesi Sosyal Bilimler Dergisi*, 4(2), s. 64.

Aydın, M. (2021). *Dilbilim El Kitabı*. İstanbul: Akademik Kitaplar.

Aykoç, F. M. (2021). *Pêlên Zerya Rêziman*. İstanbul: AR.

Babayiğit, M. V. (2016). *İngilizce, Kürtçe ve Türkçede Zamanların Sentaks (Sözdizimsel) Karşılaştırılması*. Diyarbakır: Dicle Üniversitesi Sosyal Bilimler Enstitüsü Kürt Dili ve Kültürü Anabilim Dalı.

Badî, İ. (2018). *Ziman û Dîyalektên Zimanê Kurdî*. Duhok: Pirtûkxaneya Gazî.

Baran. (1991). *Dersên Zmanê Kurdî*. Weşanên Deng.

- Baran, B. (2018). *Rêzimana Kurmancî*. Diyarbakır: Wardoz.
- Barnard, A. (2016). *Tarih Öncesinde Dil*. İstanbul: Boğaziçi Üniversitesi Yayınları.
- Bedîrxan, C. A., & Roger, L. (2004). *Kürtçe Gramer*. İstanbul: Avesta.
- Bedîrxan, C. E. (1998). *Elfabêya Kurdî Bingeheên Gremera Kurdmancî*. İstanbul: Nefel.
- Bedîrxan, K. A. (1991). *Türkçe İzahlı Kürtçe Gramer*. İstanbul: Deng.
- Bedîrxan, M. C. (2006). *Rêzimana Kurdî*. Sandvîken: Pencinar.
- Berwarî, S. H. (2011). *Projê Hevgirtina Zimanê Kurdî*. Duhok: Senterê Vekolînên Kurdî û Parastina Belgenaman/ Zankoya Duhokê.
- Besîr, K. H., Bihaeddin Amêdî, S., Kurdistani, M., & Emîn Hewramî, H. (1994). *Zare Kurdîyekan*. Hewlêr: Zankoy Selaheddîn Kolêcî Adap Beşî Kurdî.
- Birzu, O. B. (2017). Dirustey Morfofonosîntaks le Zimanê Kurdî da. *Govarî Zanko bo Zanîste Mirovayetîyekan*, 21(1), s. 83.
- Bozkurt, A. (2008). *Kesandina Lêkerên Kurmancî*. İstanbul: Doz Yayıncılık.
- Breton, R. (2007). *Dünya Dilleri Atlası*. İstanbul: NTV Yayınları.
- Bülbül, M. (2019, 06). Risteyên Aloz di Kurmancî da. *Govara Zanîstên Mirovayetî ya Zankoya Zaxo*(7), s. 268.
- Can, Ö., Akşehirli, S., Koşaner, Ö., & Özgen, M. (2020). *Dilbilgisi Bileşenleri*. İstanbul: İthaki.
- Çetin, R. M. (2023). *Türkçede Uyum Olgusu ve Özellik Kalıtı*. İzmir: Dokuz Eylül Üniversitesi Sosyal Bilimler Enstitüsü Genel Dilbilim Anabilim Dalı .
- Çiçekdağı, C. (2016). Kopula Üzerine. *Kaygı*(26), s. 131-141.
- Demir, N. (2022). *Türkçe Dil Bilgisi*. Ankara: Altınordu Yayınları.

- Demir, N., & Yılmaz, E. (2003). *Türk Dili El Kitabı*. Ankara: Grafiker Ofset.
- Demirci, K. (2015). *Türkoloji İçin Dilbilim Konular Kavramlar Teoriler*. Ankara: Anı Yayıncılık.
- Derry, G. N. (2021). *Bilim Nedir, Nasıl Yapılır*. (Ü. H. Yolsal, Çev.) İstanbul : Say Yayınları.
- Dizeyî, E. M. (2014). *Rêzimanî Kurdî*. Hewlêr: Nawendî Awêr.
- Dizeyî, E. M. (2014). *Watesazîyê Wişê û Riste*. Hewlêr: Nawendî Awêr.
- Dizeyî, E. M. (2015). *Wişesazî Zimanî Kurdî*. Hewlêr: Beşî Kurdî Kolêjî Ziman Zankoy Sellaheddîn.
- Ebden, N., Kaya, R., & Dal, T. (2022). *Timeless*. İstanbul: Time Publications.
- Ebdulla, Î., Nawxoş, S., & Xoşnaw, N. (2010). *Kurdolocî*. Hewlêr: Rojhelat.
- Emîn, N. E. (2014). *Rêzimanî Kurdî*. Hewlêr: Çapxaney Rojhelat.
- Emîn, W. O. (2009). *Asoyekî Tirî Zimanewanî*. Hewlêr: Aras.
- Farqînî, Z. (2019). *Lêker û Rastnivîsîna Wan*. İstanbul: Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê.
- Fischer, S. R. (2010). *Dilin Tarihi*. İstanbul: Türkiye İş Bankası Yayınları.
- Güneri, A. (2018). *Nomînal Morfolojîya Kurmancîya Herêma Torê*. Mardin Artuklu Üniversitesi, Türkiye'de Yaşayan Diller Enstitüsü Kürt Dili ve Kültürü Anabilim Dalı.
- Hengirmen, M. (1999). *Dilbilgisi ve Dilbilim Terimleri Sözlüğü*. Engin.
- Herodotos. (2007). *Tarih*. İstanbul: Türkiye İş Bankası Yayınları.
- İmer, K., Kocaman, A., & Sümürü Özsoy, A. (2011). *Dilbilim Sözlüğü*. İstanbul: BOĞAZIÇI ÜNİVERSİTESİ YAYIN EVİ.
- Karaağaç, P. D. (2019). *Türkçenin Dil Bilgisi*. Ankara: Akçağ Basım Yayın.

- Khalid, H. S. (2019). *Hînkêr Kurdîyê Nawendî*. İstanbul: Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê & Zanîngeha Koya.
- Kocaman, A., Uzun, N. E., Hatipođlu, Ç., Aydın, Ö., Şimşek, Ç., Ruhi, Ş., . . . Kızıltan, N. (2006). *Dilbilim Temel Kavramlar Sorunlar ve Tartışmalar*. Ankara: Dil Derneđi Yayınları.
- Korî Zanyariyê Kurd. (2018). *Rêzimanî Axaftinî Kurdî*. Sine: Kurdistan.
- Kurdo, Q. (2021). *Rêzimana Kurdî Kurmancî-Soranî*. İstanbul: Nûbihar.
- Kurmancîyê, K. (2019). *Rêbera Rastnivîsînê*. İstanbul: Weqfa Mezopotamyayê.
- Kurt, M. (2020). *English Grammar Today*. İstanbul: MK Puplications.
- Lezgîn, R. (2015, Kasım). Kûrtçe'de Akuzatif- Ergatif Özelliđ. *Bingöl Üniversitesi Yaşıyan Diller Enstitüsü Dergisi*, s. 84,85.
- Malmîsanij, M. (2015). *Kurmancca île Karşılaştırmalı Kurmancca Dil Bilgisi*. İstanbul: Vate.
- Marif, E. H. (2014). *Rêzimanî Kurdî Bergî Yekem (Wişesazî) Beşî Duyem (Cênaw)*. Hewlêr: Dezgay Çap û Bilawkirdinewey Rojhelat.
- Marif, E. H. (2014). *Rêzimanî Kurdî Bergî Yekem (Wişesazî) Beşî Pêncem (Kirdar)*. Hewlêr: Çapxaney Rojhelat.
- Mehwî, M. (2001). *Ristesazîyê Kurdî*. Silêmanî: Zankoy Silêmanî.
- Mistefa, Î. (1971). *Zimanê Edebîyê Yekgirtîyê Kurdî*. Bexda: Mislîman El- Erzemî.
- Mukrîyanî, K. (1984). *Rêzimanî Kurdî be Kerestey Dîyalektî Kirmancî û Soranî*. Bexda: Kitîbxaney Niştîmanî Bexda.
- Nişanyan, S. (2022). *Nişanyan Sözlüğü*. İstanbul: Liberus.
- Onen, S. (2018). *Hevoksazîya Kurmancî*. Diyarbakir: J&J.

- Pijwe, F. D. (2020). *Êrgetîf le Zimanê Kurdî da Kirmancî(Badînî), Soranî, Hewramî. Hewlêr: Nawendî Awêr.*
- Platon. (2020). *Kratylos*. (E. Gören, Çev.) İstanbul: Dergah Yayınları.
- Resûl, E. H. (2006). *Puxteyekî Wirdî Ristesazîy Kurdî*. Hewlêr: Soran.
- Rizgar, B. (2005). *Uygulamalı Kürtçe Dersleri Dersên Kurdî*. İstanbul: Doz.
- Sabir, D., & Shadan Sabir. (2020, Sermawez). Beryekkeftinî Şêwazarekanî Zarî Kirmancîy Nawerast le Şarî Koye da. *Kovara Zanistên Mirovayetî ya Zankoya Zaxo*, s. 531.
- Sağnıç, F. H. (1991). *Rêzimanê Kurdî*. İstanbul: Melsa Yayınları.
- Sayım, İ. (2017). *Kurmancî ve Hintçede Ergatif Yapı Üzerine Bir İnceleme*. Muş: Muş Alparslan Üniversitesi Sosyal Bilimler Enstitüsü Kürt Dili ve Kültürü Anabilim Dalı.
- Sheyholislami, J. (2020). *Zimanê Kurdî. Nûbihar Akademî(14)*, s. 99.
- Subaşı, E. (2023). *Avanîya Tebatî di Zaravayên Kurdî da*. Mardin: Zanîngeha Mardin Artukluyê Enstîtuya Zimanên Zindî yên Li Tirkîyeyê Makezanista Ziman û Çanda Kurdî.
- Şalî, Î., Alî Amîn, N., Mustafa, E., Alî Emîn, F., Alî, E., & Seccadî, A. (2019). *Ziman û Edebî Kurdî Polî Diwazdehî Amedeyî*. Hewlêr: Hikumetî Herêmî Kurdistan Wezaretî Perwerde Berêweberayatîy Giştî Program û Çapemenîyan.
- Tan, S. (2015). *Rêzimana Kurmancî*. İstanbul: Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê.
- Teyran, F. (2020). *Jîyan, Berhem û Helbestên Wî*. İstanbul: Nûbihar.
- Üçok, N. (2004). *Dilde Değişiklik ve Gelişme*. İstanbul: MULTILINGUAL.
- Wikipedi. (2024). Wikipedia: [https://tr.wikipedia.org/wiki/Yapay\\_dil](https://tr.wikipedia.org/wiki/Yapay_dil) adresinden alındı
- Xanî, E. (2022). *Mem û Zîn*. İstanbul: Nûbihar.

- Xoşnaw, N. E. (2015). *Rêzimanî Kurdî*. Hewlêr: Çapxaney Hêvî.
- Xoşnaw, N. E. (2015). *Rêzimanî Kurdî (Kirmancî Serû)*. Hewlêr: Nawendî Awêr.
- Xoşnaw, N. E. (2016). *Bikernadîyar, Lêkolîneweyekî Beranberîye le Nêwan Zimanî Kurdî û Zimanî Erebî da*. Hewlêr: Nawendî Awêr.
- Xoşnaw, N. E. (2016). *Zar û Ziman*. Hewlêr: Nawendî Awêr.
- Xoşnaw, N. E. (2021). *Rêzimanî Kurdî*. Stenbol: Dara.
- Yavaş, M. (2019). *Kurmanci Kürtçesinde Ergatif (Özgeçişlilik) Nûra Qelban Tefsiri Örneği*. Diyarbakır: Diyarbakır Üniversitesi Sosyal Bilimler Enstitüsü.
- Yavaş, M., & Kizil, H. (2020, Nîsan). ERGATÎVÎ DI KURDIYA KURMANCÎ DE Û REWŞÊN AWARTE YÊN ERGATÎVIYA KURMANCÎ. *Kurdîname*, 80, 81.
- Yaylagil, Ö. (2015). *Göstergebilim ve Dilbilim*. Ankara: Hece Yayınları.
- Yelken, K. (2024, 02 22). *Türk Kulak Burun Boğaz ve Baş Boyun Cerahhisi Vakfı*. Türk Kulak Burun Boğaz ve Baş Boyun Cerahhisi Vakfı: [https://www.tkbbv.org.tr/menu/111/ses-nasil-olusur-doc-dr-kursat-yelken#:~:text=Bir%20sesin%20olu%C5%9Fabilmesi%20i%C3%A7in%20titre%C5%9Fim,tellerine%20titre%C5%9Ftirerek%20ham%20sesi%20olu%C5%9Fturur.adresinden alındı](https://www.tkbbv.org.tr/menu/111/ses-nasil-olusur-doc-dr-kursat-yelken#:~:text=Bir%20sesin%20olu%C5%9Fabilmesi%20i%C3%A7in%20titre%C5%9Fim,tellerine%20titre%C5%9Ftirerek%20ham%20sesi%20olu%C5%9Fturur.adresinden%20alindi)
- Yonat, M. (2019). *Kurmancî Kürtçesi Ağzları Hakkında Sosyolinguistik Bir İnceleme (Muş, Adıyaman, Şırnak Örneği)*. Diyarbakır: Dicle Üniversitesi Sosyal Bilimler Enstitüsü Kürt Dili ve Kültürü Anabilim Dalı.
- Yonat, M. (2022). Bikaranîna Kirdeyên Ne- Kanonîk Di Helbestên Feqîyê Teyran de. Komisyon, A. Timurtaş, A. Tek, H. Özdaş, H. Omar Ahmad, & A. Mustafa (Dü) içinde, *Feqînasî- Mîrasa Feqîyê Teyran* (s. 250-267). Van: Peywend.
- Yonat, M., & Aslanoğlu, O. (2023, Nîsan 29). Analîzek li ser Avaniya Ergatîfî-Devokên Kurmancî yên Başûrê Rojhilat, Bakûr û Başûrê Rojava. s. 17.

Yozgat, U., Koşaner, Ö., Ercan, G., Özgen, M., & Kayabaşı, D. (2018). *Dilbilim Kuramları İki Düzlem Beş Kuram*. İstanbul: İthaki.

Yücel, F. (2016). *Çevirinin Tarihi*. İstanbul: Çeviribilim Yayınları.

Zendî, K. E. (2019). *Zimanî Kurdî be pêy Serdemekan*. Hewlêr: Şehab.

